



Arman

Danerê rojnameya pêşî ya Kurdî
Miqdad Mihed Bedirxan

HEJMAR/NO: 11-12, HEZİRAN-TİRMEH/JUNI-JULI 1996, BUHA/PRICE: 40 000 TL, 20 SKR, 4 DM

HADEP di bin ebloqaya dirindane de Derdûrora "Rojê" ji HADEP'ê der ketin

Kongreya HADEP'ê ya ku di 23'ê Hezîranê de çêbû, ji ber daxistina ala Tirk û bilindkirina ala PKK'ê ji aliyê hin temşavanan ve li Tirkîyê deng da, di rojeva siyasî de ciyê pêşî girt. Piştî vê bûyerê dewletê serokê HADEP'ê Murat Bozlak ji tede 49 berpîrsiyarên wê girtin. Di mahkemeya di 4'ê Tîrmehê de ji 49 girtîyan 39 kesên wan hatin tewqîfkirin. Partiyên dewletê bi beyanan êrîşî HADEP'ê kirin, şebekên dewletê yên dizî dest bi kuştin û terorê kirin, 3 nûnerên kongreyê hatin kuştin, bi dehan kes birindar bûn.

Ji bo Meclîsa Partiyê 50 kes hatin hilbijartin, ji van 15 kes periyoda berê ji di Meclîsa Partiyê de cî girtibûn. Di nav kesên ku hatine hilbijartin de serokê kevin ê HEP'ê Ferîdun Yazar, parlamenterên DEP'ê yên kevn Sedat Yurtdaş, Sirri Sakik, Ahmet Turk, pîreka Mehmet Sincarî (parlamenterê Mêrdînê) ku li Batmanê şehîd ketibû; Cihan Sincar, melayê ku Quran vegehandiye bo Kurdî; Abdullah Mehmet Varli, serokê kevin ê belediya Hezo (Kozluk) Abdullah Kaya ji heye. Selîm Okçuoglu, Osman Özçelik, Kemal Parlak ji di nav wan kesan de hene ku ji bo Meclîsa Partiyê hatine hilbijartin.

Rûpel: 5

Li hember huqûqa netewî û navnetewî realîteya Kurdî

Ber bi salên 2000'an ve êdî pîrsa mafên mirovî li tu cihan wek pîrseke hundîrîn ya welatekî nayê qebûl kirin.

Dewleta Komara Tirkîyê li gor peymanên ku îmze xwe avêtîye binî, kontrola dezgehên huqûqî yên navnetewî pejrîrandiye. Di vê çarçovê de peymanên Neteweyên Yekgirtî (NY), yên dezgehên wek Konseya Ewrûpayê (KA), Komîsyon û Diwana Mafên Mirovî ya Ewrûpayê, Konferansa Ewlekarî û Hevkariya Ewrûpayê (KEHE) û peymanên ku ez dezgeh pê girêdayî ne, di çareserkirinê de kilit in. Lewra divê li bendên van peymanan bê nêrîn, yên ku girêdana wan bi pîrsa kurdî ve hene.

Hejmara kesên ku ji aliyê hêzên ewlekariyê ve hatine girtin û berdan, yan kesên girtî yên ku ji aliyê dadgîrên meheli û serdadgîriya mehkemeyên ewlekariyê yên dewletê ve li ser wan biyara lidûneçûnê hatiye dan, ne di nav vê hejmarê de ye. Ger hejmara wan ji bîst bi dest xistin, wê bê dîtin ku ji sala 1984'ê heta sala 1994'ê nêzîkî 60.000 kesên di nav sînoren selehiyata mehkemeyên ewlekariyê yên dewletê de hatine girtin. Ev hejmar ji xuya dike ku hejmara mirovên bi pîrsê ve eleqedar in, roj bi rojê zêde dibê. Zêdebûna vê hejmarê nişana çewtî û biserketina politikayên dewletê ye. Ji ber ku politikaya dewletê her roj hejmara kesên girtî û yên tene mehkeme kirin, zêdetir dike.

Rûpel: 10-11



Serokwezîr Necmettin Erbakan . Di warê pîrsa Kurdî de, dê ferqa wi ji yên din çibe? (karikator: Mûsa Kart)

ANAYOL Çû, REFAHYOL Hat Ji Kurdan re Tiştêk Nû Nehat

Di hukûmeta koalîsyonê ya Partiya Refah a Necmettin Erbakanî û ya DYP'a Tansû Çillerê de tiştêkî nû ji Kurdan re tune. Xala yekem a protokola wan ew e ku ew ê hîn xurttir li hember 'cudaxwazan' şer bikin û çavkaniyên wan yên derve zûha bikin.

Di 28'ê Hezîranê de Partiya Refahê ya Prof. Necmettin Erbakanî û Partiya Doğru Yol a Prof. Tansû Çillerê li ser hukûmeta koalîsyonê li hev kirin. Û di 8'ê Tîrmehê de hukûmeta koalîsyonê ji 544 beşdarên parlamente-

rên Meclîsa Mezin a Tirkîyeyê dengên 278'an stendin. 265 deng ji li hember hukûmetê hat bikaranîn. ANAP, DSP, CHP û 14 DYP'yan dengên "na" dan hukûmetê. Partiya Refah, DYP û BBP'ê dengên "erê" dan hukû-

meta Refahyolê. Li gor protokola hukûmeta koalîsyonê, dê du salên pêşîn Necmettin Erbakan û du salên din ji Tansû Çiller bibe serokwezîr.

Rûpel: 9

HEZEYANÊN LI DOR DAXISTINA ALAYA TIRK

Mûrad Ciwan di quncikê xwe yê ve hejmarê de, di kongreya HADEP'ê de li ser daxistina alaya Tirk di-sekine û dinivîsîne ku: "Buyereka piçûk a ferdî ku li gorî qanûnan dikaribû bihata çareserkirin, 'bû dozeka mîlî', bi zorê, hîle û xapandinan civak hat rakirin ser piyan, hin hatin pîj kirin û hin jî hatin qetilkirin û terorîzekirin."

Rûpel: 3

GAVEKE GIRÎNG, HÊVIYEKE NÛ

Osman Aytar di 'Ramana' ve hejmarê de li ser yekîtiyan radiweste û dinivîsîne ku: "Biserketina PYSK'ê, ne tenê biserketina ve partiyê ye; herweha biserketina baweriya yekîtiyê ye jî. Û ev yeka wê xizmeta yekîtiya neteweyî jî bike û wê bikaribe rê li ber hin çewtiyên ku her dem zîrê didin doza Kurd û Kurdistanê, bigre".

Rûpel: 4

SEROKÊ MED-KOM'Ê METÎN OZBAY

Serokê MED-KOM'a Stenbolê Metîn Ozbay di hevpeyvîna ve hejmarê de li ser çalakiyên MED-KOM'ê disekine û dibêje ku: "Rewşenbîr divê probleman dest nişan bikin û siyasatvan ji li çareyên wan bigerin. Ger ku rewşenbîr girêdayî siyasatvanekî yan gerîllayekî be, bi min nikare fikran biafirîne."

Rûpel: 12-13

Armanc hate cildkirin
Cild 1, hejmar 62-92
Cild 2, hejmar 93-128
Cild 3, hejmar 129-158

Bihayê hersê cildan 750 SEK e

Kesên ku bi posteyê bixwazin
 divêt heqê posteyê jî bidin

Navnîşan

Armanc
 Box 15216
 161 15 Bromma - SWEDEN
 Tel: +46-(0)8-80 31 35
 Faks:+46-(0)8-80 18 25

Gelas om vâren
och andra berättelser från Kurdistan

Gelas bor i en liten by i Kurdistan. Gelas älskar den här lilla byn. Hon älskar våren med alla blommor och fåglar. Hon älskar månen och stjärnorna men mest av allt älskar hon sina föräldrar. Varje vår går Gelas till en blomsteräng nära byn. Då brukar hon ha en ny klänning på sig. Men den här våren har inte pappa råd att ge henne en ny klänning. Hur ska Gelas kunna få en ny klänning? Det får du veta i *Gelas om våren*. Där får du lära känna en flicka i Kurdistan - hur hon lever, vad hon fantiserar och funderar om. *Gelas om våren* är en barnbok, skriven av Fahmi Kakaee, med många vackra färgillustrationer av Kamil Ali Ridha. Den är på 40 sidor, inbunden, i stort format.



Jag beställer

..... ex av *Gelas om våren*, ISBN 91-604-0247-4, pris 99:- (ord bokhandelspris 131:-).

Namn:.....

Adress:..... Postadress:.....

Skicka beställningen till Naturia Förlag, Box 42053, 126 13 Stockholm.
 Eller faxes på nr 08- 709 05 30. Telefon 08- 709 04 13.

Naturia

Gelê me



Armanc
 Box 15216
 161 15 Bromma
 SWEDEN

M. SAIT ALPASLAN/DIYARBEKIR

Roj bi nûçeyên ne xweş mezîn dibe... Helbestvanê Tirk Nazim Hikmet, di helbesteke xwe de ev rewş çiqas xweş aniye ziman "Roj dirêj / roj bi giraniya gulleyan / bi nûçeyên mirinê re tê"... Rast e mamoste Nazim rast e, roj bi nûçeyên gelkuj, bi lêdanan, bi dilşewatiyan tê... Merivên kesên ku di bin çavan de hatine windakirin ev sal û nîveke li ber xwe didin, dengê xwe bilind dikan, welat bi welat li merivên xwe yên windabûyî digerin... Ev demek e mirov di feqa neyarên gel de ji bo pariyek xîretê li ber xwe didin... Roj bi lêdana "dayikên şemiyê", bi gemirandina xwîn û xîretê tê...

Roj bi çewtiyan, bi neyariyan mezîn dibe... Li aliyekî alan dadixin, ji bo dardakirina aleke din, li aliyê din mirovên mafxwaz didin ber gulle û lêdanan... Gelo bi daketina alekê çend welat azad bûne? An jî kîjan daxwazî bi dilê rehet, bê şer hatiye cî? Li aliyê din, li kolanên paytexta mêtîngehkarên (kolonyalîstan), mirovên şoreşger, mirovên welatparêz di bin dar û berê xwînxwaran de dihumîn... Dema daxistina alê, mirovên mîna çiyayekî xurt, li ber lêdanê çiqas qels mabûn... hey gidî gerdûna xayin...

Pêwîst e ku mirov vê pîrsê ji

xwe bike; ez li ku dera gerdûnê me? Êdî ev pîrs di jiyana mirovan de cihêkî girîng digire... Çimkî ûsa tiştên balkêş û xerîb tene serê mirovî ku bêyî pîrsê nabe... Rojekê mirovek, rêxistikek an jî kitêbek dê rabe û ji gel bipirse, "Erê Kurdino, hûn li kudera gerdûnê cih digrin?" Tîrsa min, ev pîrsa hanê bê bersiv bimîne... Çimkî di nava deh-yazdeh salan de her tişt ew qas zû guherî ku hinek mirov bi vê guherandinê şaş û metal mane... Mirovên berî deh salan ji tîrsê bi kurdayetîya xwe ewle nedibûn, îro nasnameya KT (Komara Tirkîyê) qebûl nakin... Mirovên berî deh salan navê zarokên xwe dikirin "Tûran" û "Erol" îro ji zarokên xwe re dibêjin "Egît" û "Şivan"... Ev mirov in ku bi rapelikandina şerê netewî, nuha ji mirovên ne PKK'yî re (ji endamên hêz û rêxistinên din re) bi hêsanî dikarin bibêjin, "lawo ma em li çiya û bajarên şer dikin, gelo hûn bi vê tîrşikçiyê çî ava dikin?" Divê mirov li ser van pîrsan bi rojan, bi mehan bifikire... Ev çî dîtine ku mirovê tîrşonek, bi xêra xwîna şehîdan bi zimanekî tahl, ji endamên (şoreşgerên) rêxistineke din re gotinên weha dibêje? Dibe ku ev jî xusûsiyeteke gelê me be.

Di gerdûnê de gelek şer çêbûne, gelek gel bûne bindest. Wan gelan bi berxwedaneke dirêj, bi

şerekî giran, welatê xwe ji bin destê mêtîngehkarên rizgar kirine... Gelek gel û welatan li ser axa xwe şoreş vejandine... Mirov dema li tipolojîya wan gel û welatan dinêre, belê xusûsiyeten hemû

gelan hene, lêbelê çiqas balkêş jî dibe bila bibê, ew tu carî nagehêjin taybetiyên gelê me... Çimkî hewqas gel hene, tu gel nav û îxaneta kewî nade xwe...

Gelê me bi taybetiyên xwe, bi rewşa xwe û bi vê çûna xwe wêneyek ecêb pêktîne... Li aliyekî ji welatê xwe hez dikin, li aliyê din ji bo welat rizgar nebe çî ji dest bê teksîr nakin. Li aliyekî bi rapelikandina şer xwe nas dike, li aliyê din ji mirovên şervan û şoreşger re çima ku nakevin bin paradîgmayekê, bi rehetî dikare bibêje "reformîst û ûrşikçî"...

Belê me li jor jî nivisand; di nav deh-dozdeh salan de gelek tişt guherîn û piraniya gel negihaşt vê guherandina gerdûn û welêt... Mirovên ku tîrsên xwe mezîn dikirin, îro ew mirov in ku alan dadixînin, alan darde dikin... Ew

mîrov in ku îro rojname û kitêban naxwînin, lêbelê dema tu rojname û kitêban ji wan re dibî, bi hêsanî dikarin bibêjin "ev malê reformîstan e, hewqas nûçevan û nivîskarên filan rojnameyê hatin kuştin, çend kes ji vê rojnameyê ne"?


Heta nuha me ev xwenezanî û quretî bi guherandina gerdûn û welêt ve, bi rapelikandina şerê netewî ve girêda... Lêbelê sebaba esasî ya vê quretî û çewtiyê ne ji van yeke jî... Sebaba herî girîng axaftin û nivîsên serok û endamên hêza ku navê wê derbas dibê ye... Bi rastî mirov mîna pez e... Bêdeng û di bin zagon û qedexekirinên mêtîngehkarên de ecîqî...

Gelê Kurd; her çiqas bi qewmê kêwan tîjî be jî, dîsa jî mirovên ku nebûne kew, mirovên mîrxas, mirovên bi kuştina du leşkeran an polîsan qêrînen serkeftinê navêjin jî hene... Ew mirov in ku îro li ber zîndanên, li meşan, li lêdanan li ber xwe didin... Dibe ku şer û rizgarbûn jî li ser milê wan mirovan sekinî be...

Di çaremîn salvegera
şehîdbûna Seydo de

Ger rojekê çiyayên me jî rûyê biharê bibînin, emê ji kulîkên welatê xwe tacegulekê çêkin û deynin ber serê te.

Li ser navê malbata wî,
 Mustafa Aydoğan



Seydo Aydoğan (1963-1992)

Armanc

Rojnameya Kurdî
 ya mehane
 &
 Monthly Kurdish Magazine

Hejmar 11-12 (169-170)

Redaktorê berpirsiyar
 Mûrad Ciwan

Redaksiyon

Mumtaz Aydın
 Fâris Can
 Nihat Elî

Ehmed Huseynî
 Yakûp Karademîr
 Remzî Kerîm
 Mahmûd Lewendî
 Hesên Mizgîn
 Emîn Narozî

Berpirsiyarê beşê dimilî
 Malmîsanîj

Nûçegihan

M. Ali Karaaslan - Almanyaya
 Tel. Faks: 49-6403-74529
 Teyîb Alan Kolçî-Fransa
 Tel. Faks: 33-1-44630735
 Azad Ibrahim - Ingilîstan

Şertên abonetiye
 Abonetiya salekê

Skandinaviya: 250 SEK
 Ewropa: 60 DM
 Derveyî Ewropayê: 50 \$

Prenumeration
 maqam/ myndighet
 450 SKR

Anons / İlan

Niv-rûpel
 5 000 000 TL
 2 500 SEK, 500 DM

Adresa Ewropayê

Box: 15216
 161 15 Bromma
 Sweden
 Tel: +46-8-803135
 Faks: +46-8-801825

Hesabê Ewropayê

Postgiro: 4972255-6
 Sweden

Ji bo aboneyên
 Almanyayê

M. Ali Karaaslan
 Dresdner Bank - Giessen
 Konto: 8 838 847 00
 BLZ: 513 800 40

utges av
 Kurdiska demokratiska
 arbetarunionen

ISSN: 0348-7385

FİŞA ABONETİYÊ

Armanc

SWÊD: Armanc, Box 15216, 161 15 Bromma - SWEDEN
 Postgiro: 4972255-6, SWEDEN • 250 SEK/sal

ALMANYA: M. Ali Karaaslan, Dresdner Bank - Giessen
 Konto: 8 838 847 00 • BLZ: 513 800 40 • 60 DM/sal

TIRKIYE: Yakup Karademir, Akbank T.A.Ş., 142 Aksaray - İSTANBUL
 Hesab no: 0017880-6/BU6/01 • 400 000 TL/sal

Aboneyên Ewropayê abonetiya xwe li ser hesabên Ewropayê bişînin û yên li welatî jî li ser hesabê welatî bişînin.

NAV.....

PAŞNAV.....

ADRES:.....

PEREYÊ DAYÎ.....

Cima ku di kongreya HADEP'ê de yek rabû alaya Tirk ji diwar daxist û li şûna wê resm û alayên PKK'ê û yên serokê wê hilevîst, bi parlamento û partiyên xwe, bi hukümet, medya, ordî û sendikayên xwe, bi karmend û karkirên xwe, bi faşîst û demokratên xwe Tirkan hezeyanek mezin li dar xistin. Li kolanan meş û mitîngên insanên jixweçûyî û harbûyî, der û dor tehdîd kirin. Dewletê ferman kir ku li seranserê welêt li her muessese, mal û dikanan alayên Tirk bîn lidarxistin. Yên ku li darnexistin hatin tehdîdkirin. Ji nivîskarên goşeyên rojnaman bigre heta wezîr û generalan hemûyan sondên tolê xwarin, qîr û hawar kirin ku destên ku bigihîje alaya wan dê bê şikandin. Huqûq û edalet, mafê insanan, qanûn û dewleta huqûqî, hela hela demokrasî di bîra insanê herî demokrat ê Tirk de jî nema, hemiyar bi devekî behsa destşikandinan, serîfirandinan kirin. Hê di wê, şeva buyerê de berpîrsiyar û endamên HADEP'ê hatin girtin, sê delegeyên wê bi êrîşeka kontrgerîlayê hatin kuştin, li hin cihan bombe hat avêtin binayên HADEP'ê.

Careke din hat dîtin ku îdeoloji û hebûna tirkîtiyê bi dewlet û siyaseta xwe, bi medeniyet û kultura xwe çend ji tehamul, aqlê selîm û xweşbîniya hemdemîya insanî dîr e, çend di întiqamperestî, êrîşperestî û zordestiya hov a barbar de gevizandî maye. Xwedê kir ku ev kesê ku ala daxist ne ji eqalîyetek nemuslim; Rûm, Ermenî an Yahûdî bû. Heke Xwedê neke yek ji wan bûya, niha li Tirkîyê mal û dikanek wan nemabû, hatibû herifandin an şewitandin. Niha gellek ji wan hatibûn kuştin.

Eşkere ye ku hezeyan, tehdîd û terora ku bi rojan dewam kir, ne welê reaksiyoneka spontan bi destê dewletê, bi alîkariya faşîst û sentezîstên Tirk-İslamiyan hat pîlankirin. Ji ber ku dewlet û rejîm di krîzeka mezin de ye û sedemê vê krîzê jî siyaseta Tirkîyeyê ya hundurîn û derva ye, bi karmend, karkir, siyasî, burokrat û generalên xwe hemiyar xwe li vê hezeyanê rapîçikandin. Berî buyera aladaxistinê Tirkîye bêhukûmet bû, siyaseta perçe perçe jihevketî bû, ji ber talan, dizî û xespa mal û vergiya millet, her siyasatmendî yê din bi dizîyê û perexuruyê îtham dikir. Mesela danîna hukûmetê li gor bazarên li ser dosyayên van talankerîyan dihatin meşandin.

Turkiye ne ku tenê di kirîza siyasî de ye civak jî ji gellek aliyên xwe ve dirize. Rûmetên insanî, her ku diçin di civakê de wenda dibin, bazirganên şerê qirêjî, çete, mafîya û bertilxuran civak zêft kirine, êsîr kirine, hişk xistine bin lepên xwe. Warwêrankirin û qetlîama li Kurdistanê, sirgûn û koçbarî, bêkarî û birçîbûna li seranserê welêt û gellek xirabî û diwariyên ku heroj tîm zimên, welat xistine rewşeka welê ku, bêhêvîti, acizî û bihtengiyê, wekî ewrekî reş seranserê welêt dapoşîye. Hefteyekê berî vê buyerê bi munasebeta futbola şampiyonîya Awrûpayê, yekî wekî Sakip Sa-

MURAD CIWAN
m.cilgin@pocab.se

Hezeyanên li dor daxistina alaya Tirk

bancî jî, lavayî dikir û digot "îdî bîhn li me çikiyaye, em tengîji ne, li ber teqiyaneke ne, em muhtacî serkeftinekê ne, em hêvî dikin ku tîpa Tirkîyê serkeftinekê ji me re bîne, da bîhna me fireh bike." Lê nebû, futbolê ew serkeftin ji wan re neanî ku diz û talankerên vî welatî yên ku serekaniyên dewletê di destên xwe de dihêlin îmkanê bi dest xî nî bi gaziyên "weten, millet û bayraq"ê bîdin bin çengên xapiyayîyan, meşuşti-

Divê em qebûl bikin ku sistemêk wiha, civakê jî dinamîzma xwe ya tebîî bêpar dihêle, rê li ber geşbûn û gulvedana fikr û gavavêtina ber bi nuhbûn û piralîbûnê digre; gellek muessesên wekî HADEP'ê bêdesthilat û însiyatîf dihêle, dixê binê tuhmetê ku rêz, hezkirin û bawerîya xwe di nava civakê de wenda bikin, bibin nimûnên xerab ên destnîşankirina dijminî.

Yên bi şovên nîzmê û nîjadperestiyê.

Ji delva wê ve, mesela aladaxistinê derket meydanê. Buyerê piçûk a ferdî ku li gorî qanûnan dikaribû bihata çareserkerin, "bû dozeka milî", bi zorê, hîle û xapandinan civak hat rakirin ser piyan, hin hatin pîj kirin û hin jî hatin qetilkirin û terorîzekirin. Yên herî diz û talanker bûn ew kesên ku yên herî pirtir bi gaziya şeref û heysiyeta milî rabin, behsa destşikandinê û serîfirandinê bikin.

Ev, aliyekî meselê ye; ew dîmen e ku ji cebheya hember tê xwiyakirin. Gelo mesele ji cebheya Kurdan çawa dixuyê? Buyerê hin nuxteyên munaqesekirinê li ser rewşa Kurdan; HADEP'ê û PKK'ê jî raxist ber çavan.

Hefteyek piştî buyerê, serokê PKK'ê beyanek da televîzyonê û eşkere kir ku haya PKK'ê ji aladaxistinê nîne, ew bi xwe jî û PKK'yî jî buyereke wiha taswîb nakin. Heta serokê PKK'ê bi vê jî nema, îdîa kir ku yê ku ev karê qirêj di wê salonê de kir, provakatorek bû ku ji alî dewletê ve hatibû wazîfedarkirin. Heta ew bi vê jî nema, meriv dikare bibêje ku bi şoveka mezin ji ber vê buyerê xemgîniyên xwe da diyarkirin û

doza lêborînê li milletê Tirk kir.

Heke em beşê wê şova fuzûlî û lêborîna ne di cî de hesab nekin beyana serokê PKK'ê beyaneka qenc û pozîtîf bû û wê xizmetê bike ku ev provakasyon zelal bibe, bi kêmasî nehêle ku diz û keleşên serdestên vî welatî, bi navê "weten, millet û bayraq"ê xelkê zêde bixapînin.

Lê divê em dest nîşan bikin ku hin pîrsên nezela jî di vê tewra serokê PKK'ê de, bêserûberî û tengasiyek di tevgera HADEP'ê û der û dora wê de heye ku bi tevayî dikare tevgera Kurdî tûşî zeafan bike û HADEP û der û dora wê jî di bin tuhmetan de bihêle.

Yek ji wan xalan ev e ku serokê PKK'ê bi qerardarî û gellek bi zelalî got ku ew ne li piştî wê buyerê ne, ew vê teswîb nakin û heta ev provakasyonêka dewletê ye. Baş e heke welê ye, serokê PKK'ê jî bo çî hê roja pêşî beyanek wiha di riya televîzyonê re neda, rê li ber gellek hezeyan, tehdîd û terorên hefteyekê negirt, bê deng ma, piştî hefteyekê axivî. Gelo di destpêkê de tiştekî din difikirî, xwe hişt li hêviya geşbûna buyeran û piştî hefteyekê ev li hesabê wî hat got? Rewşek wiha zeafek ciddî ye. Çimkî hefteyekê tevgera PKK'ê û der û dora wê, yên bin tesîr û tîrsa wê, bi çî awayî bifikirin jî, nikaribûne bêjin ku PKK'ê ev nekiriye, ev karekî neqenc ê li dervayî wê ye.

Ji pêşdeçûna buyeran diyar dibe, ku biryareka HADEP'ê ku di kongrê de alaya Tirkan daxê nebû, lê gava yekî çû ev kar kir, berpîrsiyarên wê nizanibûn ku ev kesê han nikare PKK'yî be, ev biryar ne bi talimata wê ye, heta PKK'yî be jî madem karêkî nerast kiriye, cesaret nekirin ku rê li ber wî bigrin, bi wê zelalî û biryardariya serokê PKK'ê li hemberî wî rabin. Ev jî nîşan dide ku PKK'ê bi siyaseta xwe û bi praktîka xwe ya rojana, sistemêk welê li dar xistiye ku, partiyeka wekî HADEP'ê û serok û berpîrsiyarên wê jî, cesaret nakin ku rê li ber xortekî bêmesûliyet, an "provakatorekî dewletê" bigrin, çimkî di texmîna xwe de dibêjin "lê ev xort PKK'yî be, lê ev talimat bi emrê wê hatibe dayîn?" Welê buye ku di civakê de hê ji niha ve masûniyeta (bi Tirkî dibêjin, ayrıcalık û dokunulmazlık) wan heye, tîrs û xofa wan heye, ew bi van xususiyetên xwe, eger rast bin yan şaş bin xwe beriya herkesî, di ser destê herkesî re digrin. Hetta yekî "provakator" gava îmaja PKK'ê dide xwe dikare di kongrekê de dest û milên xwe bihejîne, here provakasyonêkê bike, û di wê salonê de her kes dest û dev girêdayî bimînin, kes nikaribe mudaxele bike.

Divê em qebûl bikin ku sistemêk wiha, civakê jî dinamîzma xwe ya tebîî bêpar dihêle, rê li ber geşbûn û gulvedana fikr û gavavêtina ber bi nuhbûn û piralîbûnê digre; gellek muessesên wekî HADEP'ê bêdesthilat û însiyatîf dihêle, dixê binê tuhmetê ku rêz, hezkirin û bawerîya xwe di nava civakê de wenda bikin, bibin nimûnên xerab ên destnîşankirina dijminî.



Zeyneb Kinaci (Zilan)

Li Dêrsimê çalakiya xwekuştinê

Dema leşkerên Tirk li Dêrsimê di merasima alayê de bûn, Zeyneb Kinacî ku 30 kilo TNT ya ku bi laşê xwe ve pêçabû di nava merasimê de teqand him xwe feda kir û him jî 4 zabit û 4 leşkerên Tirk kuştin û zêdeyî 30 leşkaran jî birîndar kirin.

Di 30'ê Hezîranê de li Dêrsimê rûdanek qewimî ku di tawilê de li hemû ajansên cihanê belav bû. Ev çalakiyeka nû bû û ji aliyê jinêka Kurd ku navê wê Zeyneb Kinacî (Zilan) bû hatibû lidarxistin. Dema leşkerên Tirk li Dêrsimê di merasima alaya Tirk de bûn, Zeyneba Kurd 30 kilo TNT ya ku bi laşê xwe ve pêçabû di nava merasimê de teqand him xwe feda kir û him jî 4 zabit û 4 leşkerên Tirk kuştin û zêdeyî 30 leşkaran jî birîndar kirin.

Çalakiyêka weha întixara bi bombe di tevgera rizgariya Kurdistanê de tiştekî nû ye û cara pêşîn ji aliyê jinêka Kurd ve têt çêkirin. Berê ku Zeyneb vê çalakiya întixarê bike mesajek belav kiribû û di mesajê de gotibû ku; "Ez ji bo azadiya gelê Kurd û mafê mirovî xwe feda dikim".

Zeyneb Kinacî di sala 1972'an de li Meletiyayê ji diya xwe bûye û Dibistana Bilind xelas kiribû. Mêrê wê M. Alî Atlî jî ji ber sebebê siyasî di girtîgeha Konyayê de ye.

Van çend salên dawiyê jinên Kurd bi çalakiyên xweşewitanê dinê bala raya giştî kişandibûn ser pîrsa Kurd û Kurdistanê. Zekiye Alkan di Newroza 92'an de li ser burcên Diyarbekirê benzîn rijandibû ser cañê xwe û xwe şewitandibû. Di Newroza 94'an de jî li Almanyayê li bajarê Mannheimê Bedriye Taş (Ronahî) û Nilgun Yildirim (Bêrîvan) xwe şewitandibûn.

**Kurdino
Bi zimanê xwe bixwîne!
Bibe aboneyê Armancê**

Gaveke girîng, hêviyeke nû

Di nav Kurdan de li ser yekîtiyê gelek tiştên gotin:

— Tunebûna yekîtiyeke neteweyî di serneketa Kurdan de roleke mezin le-yistiye.

— Bê yekîtiyeke fireh û aktif Kurd bi ser nakevin.

— Nan û av ji bo mirovekî çiqas pê-wist e, yekîti ji bo me Kurdan hewqas pêwist e û hwd...û hwd.

Pirsa yekîtiyê di nav Kurdan de her dem di rojevê de bûye. Wexta mirov li dîrokê dinêrê sebebên vê yekê bi hin aliyên xwe ve pir eşkere ne. Ev birîna kûr pirî caran bûye sebebê bingehîn ku Kurd nikaribin mafên xwe yê neteweyî û mirovî bistînin.

Ji ber sebebên weha, hindik an zêde, her yekîtiyekê bi xwe re hêviyeke nû anîye û bûye yek ji merkezên bala raya giştî. Lê pir mixabin biserneketa, yan ji encamedayineka baş a hin yekîtiyan jî, bûye sebeb ku pirsên "gelo wê bi ser keve" dest pê dikin. Xweş be, ne xweş be, ev rastiya me ye û divê mirov fêhm bike.

Lê yekîti îro jî pêwist in.

Yekîtiyên çawa?

Bê şik, yekîtiyên nû ku ji yê çûyî ders wergirtine, pêwist in. Destpêk her dem bi xwe re hin zehmetiyan jî tîne. Lê divê ev nebin sebebên paldayînê. Çunkî yekîtiya neteweyî ya ku ji bo rizgariya civata Kurdistanê jî pêwist e, ji yekîtiyên cuda cuda yê siyasî û civakî yê sinif û tebaqeyên civatê pêk tî.

Ji ber vê yekê jî, li gel dezgehên civakî, hebûna tevgerên siyasî yê bi huwîyetên cuda, wek mîsal bi huwîyetên sosyalist, liberal, muhafazakar, dîndar û neteweperest ji bo civata Kurdistanê jî pêwist in. Ger li ser navê her huwîyeteke çend rêxistin hebin, bi berpirsiyariya parastina berjewendiyên neteweyî û civakî avakirina yekîtiyên siyasî yê ku dikarin werin ba hev jî, di eslê xwe de dikarin xizmeta yekîtiya neteweyî jî bikin. Li aliyê din, pir normal e ku, ger hin rêxistin nikarin yek bin, li ser navê huwîyeteke dikare çend rêxistin hebin. Ew jî dikarin bi awayên din hevkarî bikin, yan jî qet nebe dijminatîya hevdu nekin.

*

Di meha gulanê de pênc parti û rêxistinên Kurdistanê Bakur ragihandin ku ji bo bicihanîna pêwisti-yên pêvajoya rizgariya neteweyî û civakî yekîtiyeke nû çêkirine û bi navê PYSK (Partiya Yekîtiya Sosyalist a Kurdistanê) partiyeyeke nû ava kirine.

Dîtinên di derbarê vê pirsê de çiqas guhertî bin bila bibin, tişteki balkêş heye ku divê mirov bibêje: Ev cara yekem e ku li Kurdistanê Bakur hewqas parti û rêxistin yekîtiyeke siyasî ya rêxistinî çê dikin.

PYSK çima gaveke girîng e?

Wexta mirov li belavoka kongreya yekîtiyê, program û biryarên ku li Ewropayê di gelek civînan agahdariyê de behsa wan hate kirin şirove dike, pir eşkere li ber çavan e ku, PYSK destpêkeke nû û girîng e. Di gel hemû kil û kêmasiyan, ji bo binavkirina vê girîngiyê sebeb gelek in:

— Her pênc aliyên ku PYSK avakirine bi berpirsiyariyeke dîrokî rabûne, ge-

lek munaqesê û cudafikirandinên ku hene li ber yekîtiyê wek asteng nedîtine.

— Ji aliyê sosyalîstên Kurdistanê Bakur, digel ku hinek rêxistinên ku xwe wek sosyalist qebûl dikin derveyî vê yekîtiya nû mabin jî, ji bo rewşa îroyîn pê-řebûneke ne pêwist ji holê rabûye.

— Şansê civandina potansiyeleke fireh hatiye bidestxistin.

— Li ser pirsên bingehîn politikayên maqûl hatine qebûl kirin.

— Di gel hedefa serxwebûnê, pakêta daxwazên aktûel hatiye tespît kirin.

— Di riya çareserîya pirsê Kurd û Kurdistanê de îradeya azad a gelê Kurd wek bingeh hatiye girtin.

— Di pîvanên dost û dijmintiyê de nê-rîneke ku bersiva pêvajoyê dide hatiye qebûl kirin. Ev, ji hemû babetên "ez"îtiya ku heta nûha zirareke mezin daye gelê Kurd, dîr e.

— Li gor PYSK'ê rêxistin ne armanc e, navgîn (wasite) e.

— Yekîtiyeke bi dil e, ji nêrinên bi zept û reptê pir dîr e.

Hêviya ku heye divê bi xebat bê bihêzkirin. Çunkî li ser bingeha politikayên xwe yê eslî ku armanc bidestxistina azadî û bextewariya mirov û civata Kurdistanê her dem mora xwe li wan dixe, biserketina PYSK'ê, ne tenê biserketina vê partiyê ye; herweha biserketina baweriya yekîtiyê ye jî.

Gebên yekîtiya siyasî çi bûn?

Berpirsiyarên PYSK'ê di gelek civînan agahdariyê de hewl dan ku bersivên pirsên weha bidin. Li gor baweriya min, sebebên ku tesîr li ser vê yekîtiyê kirine gelek in. Guhertinên ku li dinyayê û li Kurdistanê bûn, ji gelek aliyên nîşan dan ku ji bo yekîtiyeke siyasî ya sosyalîstên Kurdistanê ku bikaribe pêwisti-yên pêvajoyê bi cih bîne, astengên mezin tunene û divê rûpeleke nû bê vekirin.

Ya din, li Kurdistanê Bakur parti û rêxistinên siyasî bi kirinên xwe nîşan dane ku, ew dikarin çê bikin, qeweta wan çê ye, plan û programên wan çê ne. Di hin pirsên girîng ên tevgera rizgarîxwaz de (wek mîsal; hedefa siyasî, metodên têkoşînê, nêrinên li ser têkiliyên neteweyî û navneteweyî) dîtinên cuda cuda hene û li ser bingeha van cudabûnan alternatî-



fên rêxistinî derketine holê.

Ji tecrubeyên tevgera neteweyî û yê van pênc rêxistinên ku PYSK avakirine mirov bi hêsanî dikare vê encamê derxîne ku, ji bo tijekirina valahiya warê siyasî, ihtiyacî bi rêxistin an rêxistinên nû heye.

Dikare bê pirsîn ku alternatîfên weha wê çawa bîr afirandin? Ji bo vê jî reçete tunene û ev girêdayê xebatê ye.

Ev xusûsiyetên weha bi serê xwe ne garantiyên biserketinê bin jî, di rewşa îroyîn de ji bo bi huwîyeta sosyalîstî mudaxalekirina pêvajoya rizgariya neteweyî, di bîr û bawerî û potansiyela PYSK'ê de mîraseke pêşîfîreh û li gor rewşa Kurdistanê helwesteke realist heye. Li gor baweriya min, xusûsiyetên weha îşaretên hêviyê ne.

*

Di bicihanîna politikayên xwe de PYSK wê çiqas bi ser keve, ev munaqeseyeke din e. Eşkere ye ku hemû aliyên baş û realist ên PYSK'ê bi serê xwe ji bo alternatîfbûyîne ne bes in. Ev pêwist in, lê bi serê xwe ne bes in. Ger kadroyên ku hene li gor warên xwe bi zanebûn xebata xwe bimeşînin û di nav pirsên talî de xwe nefetîşînin; endam, sempatîzan û dostên vê partiyê di navendên kulturî de, di warê karûbarê parti û dezgehên legal de li gor biryar û perspektîfên xwe gavan bavêjin û di vê pêvajoyê de bi aktîfî hebin; di warên din ên girîng de xwediyên hin mekanîzmayan bin, wê him baweriya yekîtiyê û hêviya biserketinê di nav civatê de xurttir bibê; him jî wê hin encamên balkêş der-kevin holê.

Ev tiştên ku hatin binavkirin, ne tiştên ku derveyî kapasîteya hêza PYSK'ê ne. Bê şik garantiya vî tiştî tune ye, lê ji bo guherandinên binavkirî û hinekên ne binavkirî, bingeh û şertên musatî hene.

Ji bo ku hin tiştên ku ji ber gelek sebebên cuda bi salan nehatine kirin, yan jî bi hin perspektîfên çewt hatine parastin, di carekê de telafî nabin, bi sebir û mutewazîbûyîni ji bo xebata îroyîn û ya dîrûdirêj gelek girîng e. Ew tişt jî bo hin zehmetî û pêwisti-yên di her warî de cebirandina yekîtiyê jî weha ye.

Wek her dem îro jî digel rexneyên dostane, wê yê ku bi tu tişteki qayil nabin jî hebin. Lê ji bo partiya nû pîvan divê ne gotin be, kar be, encama kar be; emsal divê ne rêxistinên din bin, pêwisti-yên pêvajoyê û kapasîte û xebata heyî bin. Wexta mirov rewşa dewleta kolonyalîst û pêwisti-yên pêvajoyê bîne ber çavan, negirîngbûna tiştên ku hin caran dibin mijarên munaqeseyên dîrûdirêj hîn zelaltir dibe. Divê mirov hêza xwe baş bizanibe, lê hesab û hêvî divê mezin bin.

Hêviya ku heye divê bi xebat bê bihêzkirin. Çunkî li ser bingeha politikayên xwe yê eslî ku armanc bidestxistina azadî û bextewariya mirov û civata Kurdistanê her dem mora xwe li wan dixe, biserketina PYSK'ê, ne tenê biserketina vê partiyê ye; herweha biserketina baweriya yekîtiyê ye jî. Ev yeka wê xizmeta yekîtiya neteweyî jî bike û wê bikaribe rê li ber hin çewti-yên ku her dem zirarê didin doza Kurd û Kurdistanê, bigre.

KURTENÛÇE

Civînan nasandina PYSK'ê

PYSK li gelek bajarên Ewropayê civînan nasandina program, biryar û perspektîfên xwe amade dike.

Wek tê zanîn PYSK bi yekîtiya siyasî û rêxistinî ya KUK, TSK, KAWA, TS û YEKBÛN'ê di 21-27'ê Nîsanê de bi kongreyeke muşterek ava bûbû.

Civînan nasandina PYSK'ê Hezîranê li Munîhê (Almanya), 9'ê Hezîranê li Stutgartê (Almanya), 15'ê Hezîranê li Frankfurtê (Almanya), 16'ê Hezîranê li Kolnê (Almanya), li Deen Haag'ê (Hollanda), 22'ê Hezîranê li Parisê, Metzê (Fransa), Hanovverê (Almanya) û 23 Hezîranê li Toulouseyê (Fransa), Lenan (Fransa), Berlinê (Almanya), Stockholmê (Swêd) çêbûn. Di dawiya Gulanê û destpêka Hezîranê de li Bern, Zurîhê (Îswîçreyê) û li Arnheim (Holladayê) jî civînan nasandina PYSK'ê çêbûn.

Weşana MED TV'yê sekîni

Di 2'ê Tîrmehê de weşana MED TV'yê sekîni. Li gor agahdariyan şirketa satelîta Îngelteryê peyman ku bi MED TV re çêkiribû bi yek alî daye rawestandî. Li gor agahdariya şirkete; "MED TV'yê weşana xwe li gor peyman ku di navbera wan û MED TV'yê de hatiye îmzekirin, nemeşandî ye". Ev sê mehên dawiyê MED TV'yê ji Portekîzê satelîtek kirê kiribû û weşana xwe bi wî hawî lidomand. Di 2'ê Tîrmehê de jî bi satelîta ku ji Polonyayê kirê kiribû de weşana xwe dom bikira, lê li gor agahdariyên berpirsên MED TV'yê Polonya bê ku wan agahdar bike yek alî ev peyman îptal kiriye.

Li gor karbidestên MED TV'yê di girtina MED TV'yê de tiliya Tirkiyeyê heye.

MED TV'yê di Gulana 95'an de dest bi weşana xwe kiribû û rojê 6 seetan weşan dikir. Studyoya merkezi ya MED TV'yê li Brukselê bû û di saleke weşana xwe de wê ji bo kultur û zimanê Kurdî jî xizmeteke qenc kir.

Kamûran Hidayetî wefat kir

Welatparêzê hêja û endamê PDK-Îranê Kamûran Hidayetî di 6'ê Tîrmeha 1996'an de li Stokholmê çû ser heqîya xwe.

Hidayetî tekoşerekî hêja yê PDK-Î bû û di sala 1980'an de bo Komîteya Navendî ya PDK-Î hatibû hîlbijartin. Di hîlbijartina parlamentoya Îranê de ku di Nîsana 1980'an de çêbû, Hidayetî ji bajarê Bokanê bi % 87 dangan wek parlamentar hatibû hîlbijartin, lê rejîma Îranê rê nedan welatparêzên Kurd ku biçin meclîsê.

Di destpêka 1994'an de ji aliyê karbidestên rejîma Îranê ve pakêtekî bi bombe ji re poste kiribûn, ku ew pakêta bombe di destê wî de teqiyabû; herdu çavên xwe wenda kiribû û ji gelek cihên laşê xwe jî birîndar bûbû.

Me'yîte wî di 13'ê Tîrmehê de, bi merasimekê li Stokholmê hat veşartin.

Em redaksiyona Armancê ji malbata wî re û ji hevalên wî yê tekoşer re sersaxiyê dixwazin.

Kongreya HADEP'ê û daxistina alê

MUMTAZ AYDIN

Kongreya HADEP'ê di 23'yê Hezîranê de civiya. Kongre, bi daxistina ala Tirkîyê û di şûnê de bilindkirina ala PKK'ê û resmê serokê wê Ebdula Öcalanî ket rojeva siyasî ya Tirkîyeyê. Jixwe di her kongreyên HEP, DEP û HADEP'ê de dewlet wek firsendên din, di van firsendan de jî êrişên xwe dibin ser kongreyên wan. Çapemenî jî bi sûret û guhbelkirinên xwe ji bo van rengeşan malzeme bi dest dixistin. Ev tiştêkî nû nîne, herweha nûner û temaşevanên kongreyên HADEP'ê jî her carê sedem û argumentên vekirî û xweş diafirînin ku firsendên baş bidin dewletê ku êriş bibe ser HADEP'ê. Lê ya vê carê gelek orjînal e.

Tiştêkî gelek balkêş e, li Tirkîyeyê di kongreyên partiyên siyasî de program, perspektîfên siyasî, pirsên dinya û welat nayên munaqesekirin. Dîwan tê hilbijartin, çend kesên berê hatine dest nîşan kirin, radibin çend peyvên bi ajîte diqîrin, dûre serokê partiye radibe, li ser çend pirsên siyasî yê rojane û proganda partiya xwe bi axaftineke dirêj dike, dûre serok û pişt re jî meclîsa partiye tê hilbijartin. Bi kurtî kongre ji bo şowê û hilbijartina organa tê kirin Jixwe ji ber wê ye kongreyên partiyên siyasî bêyî jimartina dengan di rojekê de, di nav 5-6 seetan de diqedin.

Lê hîn balkêştir e ku kongreyên HADEP'ê û partiyên beriya wê jî bi vî rengî dibin. Ferq ew e ku şûna şowa partiye dibe şowa PKK'ê. Di şûna "bijî HADEP" an "bijî Murat Bozlak", sloganên "bijî serok Apo", "bijî PKK" ten qêrîn, şûna flamayên bi HADEP'ê eleqedar, ala PKK'ê û teşkilatên wê, resmên Ebdula Öcalanî ten bilindkirin.

Diviyabû di vê kongreya HADEP'ê de perspektîfên partiye, guherînên li Tirkîyeyê û li dunyayê li gor wê programa partiye bihata munaqesekirin. Helwesta HADEP'ê di hilbijartinek giştî de ku di wexteke nêzik de li Tirkîyeyê bê rojevê dê çi be, ji bo yekîtiya muxalefeta Kurd û yekdengiya wê çi pêwîst e, nehat rojevê.

Lê kongreya HADEP'ê bi daxistina ala Tirkîyê û di şûnê de rakirina ala PKK'ê û resmê Ebdula Öcalanî deng da.

Dema mirov li Tirkîyeyê di warê legal de xebatê bike hin qaîdeyên wê jî hene. Divê mirov li gor wan awa û qaîdeyan şêlê bide xwe. Li Iraqê jî bo mirov kovareke Kurdî ya legal biweşîne divê mirov sûretên Seddamî û ala Iraqê yan a Baas'ê li rûpela yekem an du-

wem çap bike, li Iranê divê mirov çend ayetan çap bike. Lêbelê li Tirkîyeyê ne weha ye. Di kongreya Partiyekê de tu ne mecbûrî ala Tirkîyeyê bi dar de kê, lê piştî te darde kir nabe tu bi şowekê wê dabixîni û di şûna wê de al û sûretêkî din ku bi wê kongreyê ve neeleqedar e bilind bikî.

Jixwe Tirkîye li HADEP'ê bi hêcet e, ev bûyer bû hicetek mezin ku Tirkîye êrişên mezin bibe ser HADEP'ê. Serokatiya HADEP'ê tavilê girtin, partiyên

dewletê yek bi yek rabûn beyanên hişk û nijadperest dan, li her derê ala Tirkîyeyê bilind kirin, şebekeyên terore yê dewletê avahiyên HADEP'ê bombe kirin, çend nûnerên wê qetil kirin. Kiryarên dewletê ne xerîb in û lome jê nayên kirin. Lê em xwe bi xwe vê bûyerê şirove bikin. Çima ala Tirkî hat daxistin û di şûna wê de ala partiyeke din û resmê serokê wê hat bilindkirin? Herçiqas ew kesên ku bûyer kirin di salonê de wek qehremanan ji wan re çepik hatin lîxistin jî, serokatiya HADEP'ê nerazîbûna xwe da diyarkirin. Hinek ji wan vekirî gotin ev bûyer provakasyon e.

Beraqil an neberaqil ka em li ser hemû ihtimalên li pişt vê bûyerê hûr bibin.

Yek; HADEP'ê ev bûyer organîze kiriye. Ne mantiqî ye. Serokatiya HADEP'ê ne mumkune aligira bûyereke bi vî rengî be.

Du; çend kesan bi serê xwe ev bûyer tertîp kirine. Ev jî ne mumkun e.

Sê; ev bûyer provakasyona dewletê ye û çend ajanên wê ev tişt tertîp kirine. Karên weha ji dewletê re nexerîb e, lê di vê bûyerê de mantiqî nayê.

Du-sê kesên nenas li ber çavê 8 hezar însanî rabin ala Tirkîyeyê daxistin û ala PKK'ê û resmê serokê wê bilind bikin. Bêimkan ne be jî ihtimaleke zêf e.

Çar; ev bûyer jî aliyê komîteyek PKK'ê ve hatiye tertîpkirin. Her çiqas bûyer nemantiqî ye, lê ihtimala herî xurt wê ev be. Herçiqas di MED-TV'yê de serokê PKK'ê Ebdula Öcalanî got ku ev bûyer provakasyone jî, ihtimala herî mezin wê ev be.

Lê çima? PKK xwe xwediyê wê kitleyê dibîne, gelek caran dixwaze bîne bîra rêvebirên HADEP'ê ku xwedî ew in, ev çepik, ev ala qe ji wan re ye, ne ji HADEP'ê re... Jixwe loma di kongreyên HADEP'ê de ji slogan, pankart û alên HADEP'ê bêtir yê partiyeke din ten dîtin. Ev tengasiyeke HADEP'ê ye. Heta HADEP jî vê tengasiyê xelas nebe, serokatiya wê xwe emanetçî bibinewê bûyerên weha dubare û dehbare bibin, serokatiya wê jî wê nebe xwedî biryar û şexsiyet.

HADEP di bin ebloqaya dirindane de

Kongreya HADEP'ê ya ku di 23'yê Hezîranê de çêbû, ji ber daxistina ala Tirkî û bilindkirina ala PKK'ê ji aliyê hin temaşevanan ve li Tirkîyeyê deng da, di rojeva siyasî de ciyê pêşî girt. Piştî vê bûyerê dewletê serokê HADEP'ê Murat Bozlak jî tede 49 berpirsiyarên wê girtin. Di mahkemeya di 4'yê Tirmehê de ji 49 girtîyan 39 kesên wan hatin tewqîfkirin. Partiyên dewletê bi beyanan êrişî HADEP'ê kirin, şebekên dewletê yê dizî dest bi kuştin û terore kirin, 3 nûnerên kongreyê hatin kuştin, bi dehan kes birindar bûn.


Murat Bozlak ji nuh ve hat hilbijartin

Kongreya HADEP'ê di 23'yê Hezîranê de li Enqereyê civiya. Kongre heta roja din seet 04'an dom kir. Murat Bozlak ji nuh ve bo serokatiyê hat hilbijartin. Ji bo Meclîsa Partiyê 50 kes hatin hilbijartin, ji van 15 kes periyoda berê jî di Meclîsa Partiyê de cî girtibûn. Di nav kesên ku hatine hilbijartin de serokê kevin ê HEP'ê Ferîdun Yazar, parlamenterên DEP'ê yê kevin Sedat Yurtdaş, Sirri Sakik, Ahmet Turk, pîreka Mehmet Sincari (parlamenterê Mêrdînê) ku li Batmanê şehîd ketibû; Cihan Sincar, melayê ku Quran vegehandiye bo Kurdî; Abdullah Mehmet Varli, serokê kevin ê belediya Hezo (Kozluk) Abdullah Kaya jî heye. Selim Okçuoglu, Osman Ozçelik, Kemal Parlak jî di nav wan kesan de hene ku ji bo Meclîsa Partiyê hatine hilbijartin.

Ala Tirkî hat daxistin

Di kongreyê de hin beşdarên sloganên PKK'ê qîriyan, dûre hin kesên serçav maskekirî, sûretên serokê PKK'ê Abdullah Öcalan li ser paçek mezin nexşirî vekirin, ala Tirkî daxistin, ala PKK'ê bilind kirin. Vê bûyerê kongreya HADEP'ê xist rojeva siyasî ya Tirkîyeyê ya dorê herî pêş. Partiyên dewletê yek bi yek bi zimankê herî giran êriş kirin, Wezareta Hundurîn tavilê civiya, Wezîr Ulku Guney piştî civinê got "tiştên pêwîst wê bînin kirin", dadgirê (sawciyê) Mahkema Ewlekarî ya Dewletê ya Enqereyê jî tavilê beyanek da û got "me dest bi vekirina tahkîkatê kiriye". Li ser van beyan û helwestan polis êynî şevê piştî seet 23.00'an salona kongreyê girt bin ablukayê û 49 berpirsiyar û endamên partiyê girtin. Nûner û temaşevanên kongreyê dest bi protestokirina girtinan kirin, li ser vê yekê polis êrişî nûner û temaşevanên kongreyê kir, bi dehan kes birindar bûn. Her di heman şevê de polis avêt ser merkeza HADEP'ê û 7 şûbeyên wê yê Ankarayê.

Êrişên li ser HADEP'ê bi girtin û tehdîdan neman, şebekên dewletê yê terore dest bi kar kirin, tirimpêla nûnerên kongreya HADEP'ê yê Elbistanê di vegeê de li ser rîya Kayserî-Pinarbaşı gulebarankirin. Mustafa Öztürk, Mehmet Kaya û Hulusî Kul mirin, Mehmet Kısa jî birin-



Serok . Murat Bozlak ji nu ve bû serokê HADEP'ê

dar bû. Her roja piştî kongreyê jî li İzmirê bombe avêtin avahiya HADEP'ê.

Mesut Yılmaz destek da êrişan

Serokwezîrê berê yê Tirkîyeyê Mesut Yılmaz bi beyanekê piştigiriya da êriş û terora li ser HADEP'ê kir: "Di kongreya HADEP'ê de li hember ala Tirkî tecawuzek rû da. Ala me sembola serxwebûn û yekbûyina netewê me ye. Li hember vê bûyerê rabûna xelkê fêmedikim".

Hin şefên polîsan jî di beyanên xwe de ji bo ku êrişkariya polîs bi heq derxin gotin: "Daxistina alê tesîrek mezin li polîsan kiriye. Ji ber vê yekê me gelek zehmetî kişand ku em wan kontrol bikin".

HADEP: bûyer provakasyon e

Serokê şûbeyê HADEP'ê yê İzmirê Guven Ozata, yê Ankarayê Kemal Okutan, yê Edenê Eyup Karageçî û yê Aydinê Kemal Altioik civîna çapemeniyê kirin û gotin, daxistina Ala Tirkî li hember HADEP'ê wek provakasyon e. Dewlet jî ji bo HADEP'ê bigre vvê yekê bi kar tîne.



Derûdora "Roj"ê ji HADEP'ê vekişyan

Berî kongra HADEP'ê, derdora rojnameya "Roj"ê di nav xwe de civînek taybetî çêkir û li gor ku em jê agahdar bûn, biryara wan ew bû ku HADEP şertên wan qebûl bike ew ê di nav de cih bigrin an na ew ê ji kongrê vekişin û haziriya partiyeke nû bikin. Şertên derûdora Rojê ev bûn; yek, HADEP huwiyeta xwe ya Kurdî veneşere û vekirî bibêje em partiya Kurda ne, û partî di nav xwe de bêtir demokratîk be.

Dîsa li gor agahdariyên ku beşdarên kongrê didin, Murat Bozlak bi xwe radibe li ser kursiyê şertên derûdora Rojê red dike. Li ser vê yekê, endamên meclîsa partiye yê derdora rojnameya Rojê û delegayên hevalên wan di nav xwe de munaqesê dikin û bi giranî dibêjin emê kongreyê protesto bikin.

amadekar: HESEN MIZGÎN

ZANISTE & TEKNÎK

Nexweşî

Lêkolîner her û her genên nû yên nexweşyan dibînin

Qumarbazî, şevkorî û kansêra pêsîran çend nexweşî ne ku girêdayî genetîkê ne.

Mirov dikare şopa bi kêmasî 4000 nexweşyan di xeletiya genan de bibîne. Hin nexweşî ji ber xeletiya di genek taybetî de, yên din jî ji ber bicîtanîna eynî vatîniyê ji alî gelek gena ne. Lêbelê piraniya nexweşiyên îrsî pir nadir in û tenê 20-30 nexweşiyên îrsî belavbûyî ne.

Nuha lêkolîner bi keşfên xwe yên nû pêşkêş dikin ku genên deh nexweşiyên adetî yên îrsî hatine dîtîn. Lê dîtina wan her gav hêsan nebûye. Wek mînak; dîtina gena nexweşiya mejî ya ku dibe sebeba mirinê, Huntingtos Çorea (chorea) deh salan kişand.

Nexweşî piştî 40 salan derdikeve holê

Nexweşiya Huntingtos Çorea nexweşiyekê domînant (hakim) û îrsî ye ku tete wê maneyê ku tenê geneka nexweş ji bav an jî ji diya zarok derbasî zarok bibe, nexweşî di zarok de peyda dibe. Îhtimala ku ev nexweşî derbasî zarok bibe %50 ye.

Nexweşî wek adetî di 40 saliyê de xwe nîşan dide û di vê demê de kesê/a nexweş şexsiyeta xwe duguhêre û mil û lingê kesê/a nexweş hereketên bê îradî dikin. Heya nuha ji bo vê nexweşiyê tu derman nehatiye dîtîn û kesê/a nexweş piştî 10-15 salan dimire. Huntingtons Çorêa nexweşiyek e ku mirov dikare bi testa genan derxe holê.

Lêkoler gena alkolîzmê derdixin holê

Ji keşfên dawî ku lêkoleran kişî kirine, gena şikleke kansera rodiyan, gena şikleke kansera taybetî ya pêsîran û gena korîya şevê ye. Lêkoleran di mişkan de genek dîtine ku dibe sebeba bezgirtinê.

Lêkolerên Hollandî di wan malbatan de ku gelekî agresîv in gena ku dibe sebeba agresîvbûnê dîtine. Lêkolerên din îddia dikin ku gena ku dibe sebeba alkolîzmê dîtine. Belê, lêkolerên Amerîkî îddia dikin ku gena ku dibe sebeba qumarbaziyê dîtine.


Çavkanî: Illustrerad Vetenskap, hejmar 11/95

Mîras

Reçeteya însên di spiralek (helezon, lif, pêçoke) de ye.

Zarok jî dê û bavê xwe derenceke spirali distîne ku mitroyek dirêj û ji zêdeyî sê milyar gavîan pêk tê.

Însan jî bi milyaran hucreyan pêk tê. Hejmarên van hucreyan çiqas in, kes nizanê. Di her merkeza hucreyekê de kabîlyet û taybetiyin hene ku em ji dê û bavên xwe mîras distînin û ev kabîlyet û taybetiyên di hucre de tespîta jin û mêrî,



kurtî û dirêjî, esmer û rêşî, çavên şîn û qehweyî, forma guh û poz (bêvil) dikin. Mîras di gelek rewşan de tete maneya nexweşî û başiya me.

Kutleya mîrasê di kromozoman de ye. Di her hucreyê de 23 cotên kromozom hene ku yek ji dê û ya din ji bav tê. Tenê hucreyên avikê (toyav, toximav, pişt, sperma) û hêk awarte (îstisna) ne. Di van de 23 kromozomên taybetî hene ku em rasterast bi hevkarîya aliyê din derbasî zarokên xwe dikin. Kromozom ji madeya kompleks a DNA (Asîda deoksûribonukleîn) pêk tîne. Molekula DNA'yê cotespiralek e. Ew ji du bendikên (têl) pîrr zirav (tenik) û dirêj pêk tîne ku wek darikên nêrdewanê (derence) bi hevûdu girêdayî ne û wek derenceyek spirali li dor xwe pêçayî ye.

Ev herdu bendik carna ji şekir, carna jî ji fosforê pêk tîne. Nêrdewan bi çar basên azotî, A, T, C û G bi hevûdu girêdayî ye. Her gawek ji du basan pêk tê ku bi hîdrojenê vezeliqandî ne. Basên A û T hertim bi hev re cotek peyda dikin û eynî tişt jî bo basên C û G jî derbas dibe. Molekula DNA'yê tenê nêzî du nanometro, ango 1 mm/2 milyon firek e. Lêbelê ew pîrr dirêj e. DNA'ya ku em ji dê û bavên xwe distînin, bi kişandinê digihîje mitrokê û di nêrdewana xwe de nêzî sê milyar çov (şivik, darik, şiv) hene.

Hucre metoda fermûwarê bi kar tînin

Bendikên cot wek fermûwarê xwe dikare ji jor ber bi jêr ve du beş bike. her cara ku hucre xwe du beş dibe vê metodê bi kar tîne. Her beşa nihuceyê piştî beşbûnê dibe hucreyek tam û kopîya hucreya jê veqetayî. Bê vê riyê hemû kutleya mîrasî derbasî hucreyên nû dibin ku laşê

însên ava dibe.

Kutleya mîrasê ji navbera 50.000 û 100.000 hucreyên kabîlyetê, genên ku li ser fonksiyonên girîng ên laşê însên biryar didin, pêk tîne.

Mezinahiya genan ne wekhev e- hin ji wan jî çend hezar û hin jî ji zêdeyî du milyon basên cotî pêk tîne.

Her gen kodek e û li gor ihtiyaciya laşê însên proteîn hildibîrin in. Ev yek bi riya madeyek din, MRNA, ku kopîya bendikeke ji bendikên DNA'yê, pêk tîne.

Gena ku dest bi karê xwe kiriye, MRNA'ya xwe ji merkeza hucre jî bo yek ji fabrikayên proteînê ya hucreyê bi rê dibe. Ji van fabrikayên proteînê re ribosom tê gotin û di ava hucre de gelek in. Di ribosomê de proteîn li gor koda reçete yan jî MRNA bi xwe re tîne, tê avakirinê.

Xeletî di dema kopîkirinê de peyda dibin

Madeya girîngtirîn di laşê însên de proteîn in. Tevna (herem) masûlke (lemplate) ji proteînan pêk tîne. Proteîn hem xwîn, hem hormon û hem jî enzûma çêdikin. Dema DNA xwe bi xwe kopî dibe, dibe ku guhertin û xeletî çêbe. Guhertin û xeletî jî tesîrên derûdorê wek kîmyayî û elektrîkê jî çêdibin. Di gelek rewşan de

guhertin tu rola xwe tune ye lê carna dibin sebeba nexweşî û seqetiyê.

Mirov dikare kutleya mîrasê ya însên bi ansîklopediya ji 23 cildan pêkhatî muqayese bike, her cildek jî bo kromozomekê.

Xerîteya kutleya mîrasê çêdike

Her cildek navbera 2000 û 4000 rûpelên xwe hene ku her rûpel genekê pêk tîne. Sê milyar cotebasên ku bi hev re DNA'yê pêk tînin, tîpên cilda ansîklopediyê ne. Lêkolerên her derê dinyayê îro vî ansîklopediyê lédikolin. Ji vî xebatê re (Humana Genom Projektet, HUGO) tete gotin û armanca xebatê çêkirina xerîteya hemû kutleya mîrasa însên e.

Hedef ew e ku yek bi yek gen bi çî awayî di kromozoman de bicîh bûne, bête tespîtkirinê. heta nuha nêzî 4000 gen bi tevî fonksiyonên xwe tîne zanîn. Ji van çend sed gen ên nexweşiyê ne.

Ev xebat dê 100 salan bigre


Lêkoler hêvî dikin ku çêkirina xerîteya genan heta sala 2005'an biqede. Digel vî xebatê bi tempoyek girantir dê lêkoler genan karekterîze (binav) bikin û fonksiyonên wan tespîtkirin. tespîtkirina çîh ji bo dîagnostîka nexweşiyên îrsî pîrr girîng e.

Armanca teorîk (fîkrî) çêkirina xerîteya hemû kutleya mîrasê, cotebas bi cotebas hemû bendika DNA'yê ye. Li gor texmînan ev kar wê nêzî 100 salan bigre.

Lêbelê ji aliyê din tê munaqesekirinê ku gelo feydeya çêkirina xerîteyêke weha heye?

Gen tenê %10 ê DNA'yê ne. Yên mayî ji alî hin lêkoleran wek çop (gemar, xurde, qirşûqal, gemar) tîne qebûlkirinê û tu fonksiyona wan tune ye.

Meslek-şirketên şexsî %



Bêtişafaqiya Kurdan

Iro problema esasî ya Kurdan û hêzên wan ên siyasî ew e ku di navbera xwe de yekîtiyên siyasî çênakin û di warê muştêrek de bi hev re hereket nakin. Di civateke wek Kurdistanê de hebûna hêz û partiyên cuda tabî ne lê ne-lihevkerîna wan û di navbera wan de çênebûna tifaqan nayê îzahkirin. Sebeba çênebûna tifaqan bi piranî ji nîyetên subjektîv yê serok û kadroyan, û partî û rêxistinanan tê.

Di bin nîrê kolonyalîzmê de, di dil û mêjiyê Kurdan de egoyeka weha peyda bûye ku, wê di her warî de tesîra xwe nîşan daye û ew li pêşîya hemû tifaqên civatê û neteweyî bûye asteng. Paşdemayîna civata Kurd, nezaniya endamên civatê, kêmbûna şîûra neteweyî û xwezaniya dîrokê jî di warî de rola xwe list. Ji ber wê jî; aşîretêk menfaetên aşîreta xwe li ser a neteweyî, partiyek menfaeta partiya xwe li ser a Kurdistanê digre, rêxistinêk jî xwe re meclîsa neteweyî avadîke û serokê partiya xwe bi rehetî dikare bike serokê neteweya Kurd.

Ev Çend fenomen karakterên civata Kurd ên bingehîn in: Bêtişafî, paşdemayî, astengdanîna li hemberhev û mentîqa "bila hindik be lê yê min be".

Di civateke weha de, tifaqa hin rêxistinên Kurdan hergav jî bo min bûye "fokus".

Ji bo wê jî yekîtiya siyasî û rêxistinîya ku di navbera 5 partî û rêxistinên Kurdistanê Bakur de çêbûye û bi navê Partiya Yekîtiya Sosyalîst a Kurdistanê (PYSK) organizasyoneke polîtîk a nû hatiye damezirandin, ji bo civata Kurdan gaveke hêja û pîroz e.

Herçiqas di sala 90'î de, di navbera hêzên siyasî de prosa yekîtiyê destpêkir, berê sê rêxistinên Kurd YEKBÛN avakirin, piştê jî grûb û kadroyên cuda Hêvgirtin-PDK hat damezirandin. Piştî çend salên xebata muştêrek di destpêka Gulanê de îcar di navbera 5 partî û rêxistinên ku ji xwe re digotin sosyalîst; YEKBÛN, KAWA, KUK, TSK û Têkoşîna Sosyalîst de yekîtiyê siyasî û rêxistinî gihast encama xwe ya dawiyê. Bi vî hawî ev yekîtiyê hejmarê hêzên sosyalîst ên Kurdistanê Bakur kêmtir kir lê îro jî hêzên siyasî yê Kurdistanê ku dixwazin bi perspektîva sosyalîstî mudaxele yê pêvajoyê bikin û stratejiya wan ya dîrdemî de avakirina civateke sosyalîst hene li Kurdistanê Bakur hîn di piraniyê de ne.

Îro çin û tebeqeyên civata Kurdan di warê îdeolojiya xwe de jî hev nehatine veqetandin, partiyên ku hene û yê ku tîr damezirandin di warê îdeolojiya xwe de ne zelal in; ferqa partiyekê jî ya din bi xetên qalind û bi kirinên wê tîr

cûda kirin. Ji ber ku partiyên rastalî li Kurdistanê Tirkîyê, hîn nebûna hêz, zêdetir munaqêşe li ser ên çep dibin. Îro jî di civata Kurdistanê Bakur de heza ku çekdarên wê jî hene tîde, piraniya wan xwe bi huwîyeta sosyalîstî îfade dikin; lê ferqa van partiyên; jî kirinên wan, jî strûktura hundirê wan û jî "demokrasiya" ku di hundirê partiyên wan de rû dane, tîr cudakirin. Problema demokrasiyê, problememeke sereke ya civat û tevgera rizgariya Kurdistanê ye û problemeke li ser probleman e.

Di navbera partiyên ku xwe bi huwîyeta sosyalîst îfade dikin de, di warê îdeolojîk de ferqeke mezin tune. Ferqa PYSK'ê jî partiyên din ên sosyalîst ên Kurdistanê ew e ku, ew di nav xwe de, di warê îdeolojîk de ne homojen e, dîtînen cuda yê çep di nav

iv" jî bifikirin; li gor bîr û bawerîya min di şertên îroyîn de, jî sosyalîstan heta sosyaldemokratîtan û varyantên din ên çep dikarin di nav organîzasyonêkê de cîh bigrin û di hundirê wê organîzasyonê de him dîtînen xwe serbest munaqêşe bikin û him jî bi hev re kar û xebata muştêrek bikin.

Herweha muhafazakar û liberallên Kurdan jî dikarin di nav platformekê de bi hev re bixebitin. Ev tişt rastiya cografîya welatê me û civata me ye. Lê wer xwiya ye rewşa sosyo-psikolojîk a kadroyên Kurdan li ber vî rastîyê dibin asteng. Ji ber ku îro hemû partiyên Kurdan di programa xwe ya siyasî de şoreşa demokratîk a neteweyî dane pêşîya xwe, jî bo wê jî tu sebeb tune ku kadroyên ku xwe çep dihesibînin di nav partiyên çep de, yê ku fikrê rast jî diparêzin di nav partiyên ku îdeolojiya wan rast de cîyê xwe negirin.

Heta belkî ez hinek "naiv" jî bifikirim; li gor bîr û bawerîya min di şertên îroyîn de, jî sosyalîstan heta sosyaldemokratîtan û varyantên din ên çep dikarin di nav organîzasyonêkê de cîh bigrin û di hundirê wê organîzasyonê de him dîtînen xwe serbest munaqêşe bikin û him jî bi hev re kar û xebata muştêrek bikin.

r e f ê n partiyê de mevcud in. Jixwe piştî tîkçûna sistema sosyalîst û guherandinên dawî yê cîhanê ne mumkun e ku endamen partiyekê sosyalîst li hember pîrsa sosyalîzmeke çawa hemfikir bin, lê bi ya min ew dikarin di warê huwîyeta sosyalîst de li hev bikin. Problema sosyalîzmeke çawa hîn di nav rewşên bîr û alimên dinyayê de tî munaqêşe kirin, divê kadro û partiyên sosyalîst ên Kurdan di warî de bi muştêrekên asgarî bîr cem hev. Heta belkî ez hinek "na-

Di van waran de partî û platform hene. Wexta kadroyên çep û rast ên Kurdan di qonaxa îro ya civata Kurdan de gihastin vî bawerîyê, ev tî wê mahneyê ku kadroyên Kurdan kamil bûne, demokrasiyê pejiwandîndine, li hember hev û dîtînen hev tehamul dikin û toleransê nîşanê hev didin.

Lê dema ku şoreşa neteweyî û demokratîk bi ser ket, wê gavê divê partiyên Kurdan jî di warê îdeolojiya xwe de hîn zelaltir bibin û dibê ku di teferûatên piçûk de jî partî bîr damezirandin û divê bîr jî.

Ev hêzên ku yekîtiya nû ava kirine bi dehan salan li Kurdistanê Bakur tîkoşîn dane, di şîyarbûna millet de rola xwe listine, carna bûne hêzên kitlewî carna jî zeif û lawaz mane. Ev yekîtiya siyasî jî di demê weha de çêbû ku hêzên ku ev yekîtiyê damezirandin, piraniya wan jî hêzbûnê ketibûn, di pratîkê de tu faliyet û xebatên wan ên berbiçav tunebûn. Ji xwe bêtalihiya hêzên Kurdan ew e ku wexta ew zeif û bêmedal dimînin wê gavê hewl didin ku yekîtiyan ava bikin. Li gel hemû kêmasî û bêmedeliya xwe tifaqên ku di civatê de çêdibin, yekîtiyên ku di navbera organîzasyonan de ava dibin, kemilandinîna milletbûnê xurttir dikin.



NÛÇE



Platforma Jinên Kurdistanê li Almanyayê civiya

Platforma Jinên Kurdistanê di 25-27'ê Gulanê de li Almanyayê li bajarê Hattingenê bi beşdarbûna 54 nûnerên jinan ku jî hemû parçeyên Kurdistanê û jî rêxistinên jinan yê welatên cuda yê Ewropayê hatibûn, civîna xwe ya duyemîn li dar xist. Ji Yekîtiya Jinên Kurdistanê li Swêdê du nûner beşdarî civînê bûn. Herweha çend jinên Tirk, Ereb û Laz di civînê de amade bûn.

Armanca civînê ew bû ku platforma ku jî aliyê jinan ve hatiye avakirin hîn pêşve bibe him jî jinên Kurdistanê û li Ewropayê dijîn nêzî hev bike û rewşa jinên Kurd tîxe rojava Kurdan û dinyayê.

Platformê li ser van xalan munaqêşe kir. 1- Pêwîstiya platformê, 2- Di civata Kurdan de rewşa jinan, 3- Ferq û cudayîyên cînsî, 4- Rewşa rêxistinên jinên Kurd, 5- Rewşa jinên Kurd yê ku li Ewropayê dijîn, 6- Astengên civakî, psikolojîk û polîtîk.

Di civîna platformê de her xal yek bi yek hat munaqêşekirin û encam jî hatin derxistin. Di xala pêşîyar û biryaran de platform, pêşîyarên Yekîtiya Jinên Kurdistanê li Swêdê ku wek pakêtiyê bi înzaya seroka wê pêşkeşî civînê bibûn berçav girtin û kirin biryar.

Biryar ev in;

1- Li Kurdistanê Başûr îro jî maf û azadiyên jinan li gor qanûnên Saddam Huseynî tîr meşandin, divê platform xal bi xal li ser van qanûnan raweste û bi nivîskî pêşkeşî Dewleta Federa ya Kurdan bike û taqîb bike.

2- Li ser rewşa Kurdistanê û jinên Kurdistanê nameyekê jî YN û rêxistinên din yê navneteweyî re bişîne.

3- Xebatê kirin ku jinên li Ewropayê bîkşînin nav xebata rêxistinî ya Paltfaroma Jinên Kurdistanê.

4- Platform 6 mehan careke civîna xwe amade bike.

5- Kovara Roza ku li welêt derdikeve jî re piştigirî bête kirin.

6- Piştigiriya jinên Kurd ku di girtîgehên de ne -wek Leyla Zana- bête kirin.

SEYRAN DURAN

Di derheqê Bedirxaniyan de konferansek

Roja 4.5.1996'an li Almanyayê, li bajarê Bremenê li ser malbata Bedirxaniyan konferansek hate çêkirin. Konferans jî aliyê aligirên PYSK'ê yê li Bremenê hatibû amadekirin.

Konferans jî sê beşan pêk hatibû.

1- Di tevgera welatperwerîya Kurdî de rola malbata Bedirxaniyan; jî aliyê lêkolînan Malmîsanîj ve hate pêşkeşkirin.

2- Di dema Mîrîtiya Bedirxaniyan de huqûq û edalet çawa bû, jî aliyê parêzer Osman Aydın ve hate pêşkeşkirin.

3- Xizmetên kulturî û siyasî yê Celadet Bedirxan; jî aliyê nivîskar Felat Dilgeş ve hate pêşkeşkirin.

Kongreya Ewropayê ya PDK-Bakur

Di 18'ê Gulanê de Kongreya 4'an a rêxistina derveyî welêt a Partiya Demokrat a Kurdistan-Bakur hat çêkirin. Li gor daxuyaniya ku hatiye belavkirin Rêxistina Derveyî Welêt a PDK-Bakur li ser kar û barê xwe yê Ewropayê rawestîye û tî gotin komîteyên wê vatîniyên xwe neanine cî.

Dê demêkê nêz de PDK-Bakur dê kongreya xwe ya giştî bicivîne.

Girtî di rojiya mirinê de ne

Li 33 girtîxaneyên Tîrkiye û Kurdistanê, li dor 1500 girtî bi dorê di grewa birçîbûnê de ne. Li zîndana Diyarbekirê 82 girtî di rojiya mirinê de ne, çî bigre rewşa hemûyan jî aliyê tendurustî de pir krîtîk e.

Wezîrê Adaletê yê nû Şewket Kazan got ku; "ew ê talîmatnameyên berê ku di derheqê girtîyan de hatine derxistin îptal bike".

Çawa dest pê kir?

Roja 25'ê Nîsanê li zîndana Diyarbekirê 18 girtîyên daweya PKK'ê bi daxwaza îstîfakirina Wezîrê Edaletê Mehmet Ağar û baştirkirina rewşa girtîxanê dest bi rojiya mirinê kirin. Di wextek gelek kurt de berxwedana girtîya li 33 girtîxaneyên Tîrkiye û Kurdistanê belav bû. Bi beşdariya girtîyên daweyên hêzên siyasî yê Kurd û Tirk jî hejmara kesên ku di grewa birçîbûnê de ne gihîşt 1500'î. Hejmara kesên li girtîxaneya Diyarbekirê di rojiya mirinê de ne gihîşt 82'yan.

Rewş nuha çawa ye?

Nuha girtîyên siyasî yê li du girtîxaneyên Diyarbekirê û li girtîxaneyên Ruha-yê, Mêrdînê, Batmanê, Semsûrê, Elbîstanê, Maraşê, Entabê, Bismilê, Meletiyê, Sêwasê, Erzurumê, Sêrtê, Bursayê, Umraniyeyê, Bayrampaşayê, Ceyhanê, Kon-yayê, Îskenderûnê, Ankarayê, Bucayê, Çankiriyê Sakaryayê, Kayseriyê, Çanak-kaleyê, Gebzeyê, Bartînê, Yozgatê, Nevşahîrê, Amasyayê, Zîleyê û Aydinê di grewa birçîbûnê de berdeyam in. Berx-



wedan, girtîyên daweya PKK'ê, Partiya Yekîtiya Sosyalîs a Kurdistanê (PYSK), Partiya Rizgariya Kurdistanê (PRK/Rizgarî) jî tê de ji aliyê girtîyên 20 hêzên siyasî yê Kurd û Tirk ve tete meşandin. Piraniya girtîyan bi dorê di grewa birçîbûnê de ne. Lê bi taybetî rewşa 82 girtîyên zîndana Diyarbekirê û hin girtîyên din ku di rojiya mirinê de ber bi xerabûnê ve diçe. Dewlet jî bo ber tehlikeya mirinê roja 29'ê Gulanê bi zorê 19 girtî rakirin nexweşxaneyê.

Girtî çî dixwazin?

Daxwazên girtîyên zîndana Diyarbekirê talebên siyasî; wek îstîfakirina Wezîrê

Edaletê Mehmet Ağar, bûn. Lê dûre piştî grewên birçîbûnê li girtîxaneyên din belav bûn û girtîyên daweyên din jî beşdarî berxwedanê bûn, rengê daxwazan guherî, bi giranî bû yê baştirkirina rewşa girtîxaneyan.

Daxwazên sereke ev in:

- Divê îdarekarên girtîxaneyan dest ji polîtîka îtîrafçîtiyê berdin.
- Di girtîxaneyan de îmkânên tedawî-diyînê bête zêdekirin.
- Pirtûk, rojname û weşanên ku li derve tînin firotin, bi serbestî bînin girtîxaneyan jî.
- Asteng û bendên li pêşîya girtîyên ku dixwazin parastina siyasî bikin, bêne ra-

kirin.

• Girtîxaneya Eskîşehîrê bête girtin. Û hin daxwazên din...

Piştgiriya ji derve ve

Mirovên girtîyan li derve bi grewên birçîbûnê piştgiriya girtîyan dikin û bi vî awayî dixwazin raya giştî peyda bikin. Mirovên girtîyan li Batmanê, Diyarbekirê, Edeneyê, Îskenderûnê û Stenbolê li avahiyên HADEP'ê bi dorê di grewa birçîbûnê de ne. Li ber deriyê girtîxaneya Bayrampaşayê, Komîteya Piştgiriya Girtîyên Şoreşger li ser rewşa dawî ya girtîyan civîneke çapemeniyê çêkir.

Yek ji girtîyên PYSK'ê ku rojnameya Ozgur Polîtîkayê pê re hevpeyvîn kiriye jî rayagiştî van daxwazan dike: "Em ji rayagiştî ya şoreşger-demokratîk daxwaz dikin ku di vî pirsê de hesas bin û me bi tenê nehêlin. Di vî manê de komele û rêxistinên kitleyî bi tîkoşîneke bi rêxistî, riyên ku dengê me bighînin rayagiştî ya hin firehtir bibînin. Jixwe em dizanin di vî warî de hewildanên bi îsrar hene. Lê berfirehtirkirina vî karî wê hêza me bi hêztir bike".

Herweha Komîteya Ewrûpayê ya PYSK li ser grewên birçîbûnê beyanek derxist. Di beyanê de tê nivîsandin ku; "Hukûmetên ku li Tirkîyeyê tînin avakirin jî bo quwet û qudrêtên xwe nişan bidin êrîş dibin ser girtîyên siyasî. Dewleta Tirk di mehên dawiyê de jî bo ku îrade û bîr û baweriyên girtîyan teslîm bigre wan jî îdeal û rûmetên ku diparêzin bêpar bike li hemberê wan êrîşên psîkolojîk û siyasî dimeşîne. Ji bo ku girtîyên siyasî jî hev û jî civatê îzole û tecrît bikin di girtîxaneyan de hucreyên wek 'tabûtan' çêdikin".

Di pêvajoya aşîti de rola rêxistinên sîvîl

SEYIDXAN KURIJ & HAMDULLAH YUMLU

Di 8 û 9 ê meha Hezîranê de li bajarê Almaniyayê Overath ê bi navê "Di pevajoya aşîti da rola rêxistinên sîvîl" civînek pêk hat. Civîn ji aliyê rêxistinên "Kulturforum Tuekei/Deutschland", "Civata Kurd li Almanya", "Dialog Kreis", VPI (Komal ji bo perwerdekirina polîtîk û agahdarî) û Weqfa Heinrich Bêll hat amadekirin.

Civînê bi axaftina Koordinatîrê "Dialog-Kreis" Prof. Dr. Andreas Buro dest pê kir. Prof. Dr. Andreas Buro axaftina xwe da li ser derketina şeran, di civatê de tesîra wan û pirsên ku ji şer tînin holê sekinî. Prof. Buro got ku "şer ji nişka ve dest pê nake, berevacî jî berê de li gor berjewandîyan tînin amadekirin" û weha dom kir; "Averûya Terorîzmê jî hêla devletên mezin jî bo tawanbarkirina yê din (yanî hêzên muhalîf) û jî bo pêşîlêgirtina pirsê tînin bikaranîn. Li gor vî mentalîte bi terorîstan re danûstandin çêna-be û nayê axaftin. Em jî îro vîya dijîn. Di eslê xwe da şer bi xwe teror e. Em herdu alî nakin wezîkî, lê bikaranîna metodên leşkerî şaş û xelet dibînin. Ji ber ku şerê çekdarî gellek caran zerar digihîne xwediyên vî metodê û encamên ku ew bi xwe jî naxwazin derdixin holê. Ez ne di wê baweriyê de me ku PKK bi şerê çekdarî jî bo pêşdebirina pîrsa Kurdan rolek mezin listiye, lew ziyana wê jî

qazanca wê pirtir e. Gelo bi riya demokratîk ziyana û qurbanî hîn kêmtir û qezenc hîn pirtir nebuva."

Prof. Dr. Dogu Ergil di axaftina xwe da li ser rewşa civata Tirkîyê, siyaseta Tirkîyê ya rojane, rola quwetên sîvîl û leşkerî, îdeolojiya resmî ya dewleta Tirk û Kemalîzmê sekinî. Prof. Ergil got: "eger di nav civatek da şer hebe, tê wê manê ku du alî hene", û axaftina xwe weha dom kir: "pêwîst e ku em qabul bikin di vî şerî de aliyê Kurd û Tirk hene. Kurd dixwazin bînin naskirin, bikaribin xwe îfade bikin û tevê qerarên siyasî bibin. Eger bi riya demokratîk pêkanîna wan ne mumkun be, hewcedariya qada bandorê ya fizîkî derdikeve holê. Li gor huqûqa navnetewî eger komik an jî ferdêk nikaribe bandoriya xwe bi beşderbûna demokratîk pêk bîne, ev yek dijî zora devletê rê dide zora ku jê tê. Tirk û Kurd di eynî demê de jiyane, lê eynî demê ne jiyane. Tirk nizanin di dema cumhuriyetê da çî hatiye serê Kurdan. Divê gelê Tirk wan bizanibe ku, em bixwazin bi hev re jiyane nû pêk bînin. Pêwîst e ku, Tirkîyê jî nû ve bi hawekî demokratîk bê avakirin. Di nav vî awahî ya nû de divê hemû komên netewî, etnîk, çandî û olî bikaribin xwe bi azadî îfade bikin, dezgehên xwe ava bikin. Pîrseke siyasî dikare bi riya siyasî çareser bibe. Di encamê de an pîrsa Kurdî te çarekirin, an jî Tirkîyê belav dibe. Rojnamevan

Dr. Beate Winkler bi navê "Bi riya aşîti destpêkirina çareserkirina munaqeseyan" axaftinek kir. Dr. Winkler li ser danûstandinên aşîti yê Filistin û Afrîka Başûr agahdarî dan û li ser rola navçîtiyê sekinî. Dr. Winkler tesîra şerê li ser psîkolojiya civatê jî anî zimên.

Abûqat Osman Aydin di axaftina xwe de weha got "dewlet jî bo ku li ber Kurdan rêyên xebatên legal girtine, Kurd mecburê îlegalîte bûne, lê divê tevgera Kurd xwe legalîze bike. Eger siyaseta Kurdî legal nebe, demokratîk nabe".

Huseyin Özdemir DBP(Partiya demokrasî û aşîti) astengên ber xebata legal û li ser zordariyên dewletê sekinî û axaftina xwe weha dom kir: "Cihê ku çek xeber bide, li wir li ser aşîtiyê axaftin cesaret dixwaze, lê dîsa jî Kurd bi salane daxwazên xwe yê aşîti tînin zimên. Li ser daxwazên aşîti ambargoya medyaya heye, em nikarin dengê xwe bigihîjin raya giştî. Pîrsa Kurdî siyasî ye divê çarekirin jî siyasî be.

Berpîrsiyarê Platforma Demokratîk a Kurd Nazîf Kalelî jî di axaftina xwe de piranî li ser pirsên hundirîn yê tevgera Kurdistanê sekinî. Kalelî li ser merhaleyên tevgera Kurdistanê, rewşa Tirkîyê û ya herêm û stratejiya nû ya tevgera Kurdistanê dîtinên xwe anî ziman. N. Kalelî axaftina xwe weha dom kir: "Pevajoya aşîti bi îktîdarek civakî, tevû-

nî û siyasetek sîvîl mumkun e. Eger Armanca me bi riya aşîti çareyek sîvîl be, divê em bala xwe bidin metodên xwe yê rêxistinî. Eger rêxistinên Kurdan bi metodên dewletê bersivên kontra bidin aşîti pêk nahê. Divê zagona Tirkîyê bê gûherandin, zagonên li dijî Kurda bînin rakirin, hemû komên netewî bikaribin xwe îfade bikin û rêxistinên xwe yê siyasî jî avabînin, divê Tirkîyê desentralîze be û sistemek federalî pêk bê."

Mebusê Partiya Keskan/Yekîtiya 90 Angelika Beer, Dr. Jochen Hippler bi navê "bi riya aşîti çareserkirina pîrsa Kurdî da rola dezgehên Ewrûpî" axaftinek kir. Hippler li ser rola dezgehên Ewrûpayê jî weha got: "Divê Ewrûpa jî Tirkîyê re mamostatî neke, lê em dikarin jî Tirkîyê daxwaz bikin ku, hurmeta peymanên navnetewî bike. Ew peymanên ku Tirkîyê îmtiza kiriye divê hurmeta wan bigre. Divê PKK jî hurmeta peymanê Cenevre bike".

Di rûniştina dawiyê da jî partiyên TBMM 3 mebusan li ser "di pevajoya aşîti da rola partiyên Tirkîyê" dîtinên xwe anî ziman.

Civîn bi axaftina Serokê Civata Kurd Mehmet Tanriverdî xelas bû. Mehmet Tanriverdî got; "divê jî bo halkirina pîrsa Kurdistanê Kurd bi xwe biryar bidin".

Li hember senaryoyên dewletê senaryoya min

SELİM ACAR

Di van rojên dawiyê de di siyaseta Tirkan de senaryoyên cuda cuda tînan nivîsandin. Rejîsorên van senaryoyan gelek kes û alî ne. Ev li ku derê tînan nivîsandin bila bînan nivîsandin, lê tiştêk pir diyar e ku piraniya wan ji aliyê sîxûrên tarî de tînan nivîsandin. Hinek rojnamevan û mamosteyên unîversîteyan ên hevalbend û alîgirên sîxûr û xwedî stêrkan, van senaryoyan dinivîsin. Filmên van senaryoyan li loka meclîsa wan a "mezî" (!) tînan pêşkêşkirin (lê ev meclîs ji qerargahên generalan ne mezîtir e û ne di ser wan re ye), carna jî filmên van senaryoyan li televizyonên dewletê yan jî yê şexsî tînan rêdan. Ka em li ser artîstên wan ranewestî û em rexnan li listîkvan û senaryoyên wan negrin, hûn bi xwe wan temaşe dikin û guhdariya wan dikin.

Hûn jî dibînin ku, senaryoyên me Kurdan tune ne û ciyê me ji bo hîlbijartinên dahatû di senaryoyên wan de jî tûneye. Ez bi xwe hinekî ji xwe re fikirîm û mejî û aqilê min ji min re weha got: Çima tu jî senaryoyeke ku nehatiye nivîsin nanivîsî. Min biryara xwe da ez jî ji bo hîlbijartinên dahatû senaryoyekê binivîsim.

Min ev senaryoya li jêrê nivîsand: Erbakan û hinek partiyên din ên ku di meclîsê de ne bi hev re hukûmetek damezirandin. Diyar e temenê wê hukûmetê de ne pir dirêj be. Yan jî yê stêrkên wan pîr û aqilê wan kêr emir dane û gotine: "Nabe! Em Erbakanî qebûl nakin, hûn Kemalîstên heftreng li hev bikin, hukûmetekê damezirînin." Wan jî li gor vî emrî hukûmetek damezirandin, lê temenê wê hukûmetê jî ne dirêj e, çend meh û pênc roj in. Yan jî serokê komîara wan ew zagonên ku ji dema cûnta leskerî mane xebitandin û roja hîlbijartinên nû diyar kir. Di bin gelek haletan de hîlbijartinek nû tê rojê Tirkîyê. Serkeftiyê hîlbijartinê bê şik dê partiya Erbakanî be. Senaryoya min berîya hîlbijartinên awarte dest pê dikê.

Senaryoya min bi damezrandina partiyek SKurd a legal dest pê dîke Ew Kurdên ku partiyekê Kurdî ya legal diparêzin bi nasnameya Kurdî partiyek legal damezirandin û ev parti bangî partiyên din ên Kurdan dîke û dibêje:

"Fermo werin em li hev bikin, em bi hev re beşdarî hîlbijartinê bibin". Partiyek jî wan ên ku hatine bangkirin dikare bibêje: "Em partiya mezî in û li ser rêya rastiyê ne, serokê me jî serokê netewî ye, em jî partiya netewî ne, werin bidin dî me."

Partiya bi nasnameya Kurd derketiye holê dibêje: Wisa nabe! Gelê Kurd di tu hîlbijartinan de serokî û mezîyayî nedaye tu kesî û tu partiyê. Her serok, serokê partiya xwe ye. Bê şert û şîrûtên pêşîn em li ser berjewendiya gelê Kurd li hev bikin û em bi hev re têkevin hîlbijartinê. Bila di navbera me de ew kesên serbixwe û welatparêz jî hebin, bê wan nabe" û wê dom bike: "Divê em rastiyê bibînin;

1) Pir zahmet e ku di bin van şartan de, em li seranserê Tirkîyê jî sedî dehên deng bistînin.

2) Em welatparêzên Kurd li Kurdistanê bibin terefê yekem û yê bîngê. Ku em nerin wê meclîsa Tirkan jî, ne girîng e, em jî dinyayê re û jî Tirkan re diyar bikin, ku ev

meclîs û partiyên ku di meclîsê de ne ne gelê Kurd in, gelê Kurd temsîl nakin. Kurd baweriyê bi wan naynin. Bi vê şeweyê de temsîliya wê meclîsê tim di bin siyê de be û tu qudreta wê ya huqûqî jî bo gelê Kurd tunebe, ne bi maneya huqûqa formel û ne jî di maneya huqûqê di jîyanê de.

3) Partiya Erbakanî dê di hîlbijartinê de partiya yekem be. Wê demê jî îmkana me wê hîn pirtir be ku em bikaribin ji raya giştî ya dinyayê alîkariyê bistînin. Ji bo ku em bikaribin berjewendiya gelê xwe biparêzin divê em qaydeyên siyaseta dinyayê bizanîbin.

4) Ew Kemalîstên heftreng û xwediyê rîhên dirêj dê bi hev kevin. Bîngê ordiyê û ola Kemalîzma Tirkan dê kil bibe, ev kilbûn wê li kuderê rawest e em nîzînan û em nikarin texmîn jî bikin. Lê qelsbûna ordiya Tirkan û Kemalîzma wan ji bo me baş e.

5) Em zagonên (qanûnên) Tirkîyê xîrek (laçka) bikin, wan bê fonksiyon bîhêlin. Navên wan zagonên xîrek zagonên mirî ne. Em nikarin zagonên Tirkîyê bigûherînin lê em dikarin wan zagonan bikin kevnar û zagonên mirî.

6) Em dizanin yê rîhdîrêj dê bi cubeyên xwe yê reş êrîşî me bikin. Lê dema ew bi xwe, bi hev kevin, dê êrîşên wan jî êrîşên nuha ne zortir û tundtir bin. Ma ne diyar e ku em di bin êrîşên faşîstan, ramboyan, cendirmeyan, polîsan û yê din de ne? Dijmin çiqas qels be, bêtir di berjewendiya me de ye. Lê ku em bikaribin wê qelsiya dijminê xwe bi kar bînin. Ew quwetên ku li dinyayê hukûm dikin çiqas jî dijminê me acîz bin, ev jî di berjewendiya me de ye.

7) Ku em li Kurdistanê bibin terefê yekemîn, em belediyeyên Kurdistanê hemûyan bistînin.

Ji bo vê yekê jî:

a) Divê em dev ji serhişkiya "ez partiya mezî in, divê hemû serokên belediyeyan ji me bin" berdin. Kîjan welatparaz li ku dikare serokatiya belediyeyê bistîne, divê ew li wira bibe kandîdatê/a me.


b) Em kandîdatên wisa diyar bikin ku der û dora wan hebe, ji wan bê hezkirin û bikaribin serokatiya belediyeyan bikin. Ne girîng e ku bi partiyekê re yan na, ya bîngê ew e ku welatparêz bin.

c) Em belediyeyan wisa îdare bikin û em ji gelê xwe û ji dinyayê re diyar bikin ku em dikarin xwe bi xwe îdare bikin, em di wê qudret û taqetê de ne. Îdarekirin zanîn e, tecrube û qabiliyet e. Bi sloganên rijî, bi tîrs û tehdîtan îdarekirin nabe. Wê gavê wê jî bo gel ferqa me û ya dijmin gelek tunebe.

8) Bi îdarekirina webixwe, bi alîkariya gel û bi mejiyê durust û ronî em dikarin wê mecalê bidî gelê xwe, da ku ew bikaribe ji bo çarenûsa xwe, bi xwe biryarê bide".

Pîştî vê axaftina dirêj û zahmetiyên dan û sitendinan divê yekîtiyek hîlbijartinê bête damezirandin. Yê ku di nav vê yekîtiyê de cihê xwe negrin, dê rûyê wan ê rastî jî gelê Kurd re diyar bibe û televizyona heftrengî jî dê nikaribe wan şaşîtiyan biparêze.

Xwendevanê heja! Ev senaryoya min a ji bo dahatûyê ye. Ez nîzînan aktorên me dê bikaribin rolên xwe baş bilîzin an na. Lê jîyan herdem senarîst e. Ger em aktorên jîyanê rola xwe nîzînan kesên din dê jî berdêla me ji bo berjewendiyên xwe rola me bilîzin. Ma ji bo çî em ê rola xwe bi xwe û li gor qaydeyên jîyanê nîzînan?



Çiller-Erbakan . Gelo dê 'zewaca' wan çiqas bajo?

ANAYOL çû, REFAHYOL hat...

Çillerê di bin serokwezîrtiya Erbakan de du kursiyên wezîrtiyê standin; him bû cigira serokwezîr û him jî bû Wezîra Karê Dervayî ya hukûmetê.

Di hukûmeta Tirkîyê ya 54'an de tiştêkî nû ji Kurdan re tune ye. Xala yekem a protokola wan ew e ku ew ê hîn xurttir li hember 'cudaxwazan' şer bikin û çavkaniyên wan yê derve zûha bikin. Li gor protokolê Rewşa Fewkalade li Kurdistanê rakin. Lê di şûna wê de wezîfe û salahiyyetên leşker û polîsan hîn zêdetir bikin.

Partiya Refahê di programa hukûmetê de tawîz dane DYP'ê. Nêzî 15 parlamenterên DYP'ê li dijî wê yekê bûn ku çima partiya wan bi Refahê re ketiye koalîsyonê û ji bo wê jî dengên baweriyê nedan hukûmetê.

Ev cara pêşîn e ku Partiya Refahê ku wek partiyekê îslamî tê zanîn li Tirkîyê tê ser hukûm serokê wê dibê serokwezîr. Partiya Refahê di hîlbijartinê giştî de herî zêdetir deng girtibû. Refahê di hîlbijartinê nisbî ya herêmî de jî dengên xwe zêdetir kirin û bû partiya yekemîn. Ji ber Partiya Refahê partiyekê îslamiyê û li dijî laiyîqiyê tete destnîşankirin û siyaseta wê di gelek waran de ji yê partiyên din cûdatir e, partiyên din yê meclîsê naxwestin pê re koalîsyonê ava bikin.

Herçiqas serokê ANAP'ê Mesûd Yilmazî di dawiyê de bang li DYP'a Tansû Çillerê kir ku ew herdu partiyên xwe bi kongreyeka muştêrek bikin yek lê seroka DYP'ê Tansû Çiller bawerî bi Mesûd Yilmazî nahanî û bi Partiya Refahê re hukûmeta koalîsyonê ava kir. Îcraata hukûmet a yekem wek jêstekê meaşên karmend û teqawûdan %50 zêde kirin.

Hukûmeta Anayolê 3 mehan ajot

Di 3 mehên hukûmeta ANAYOL'ê de Partiya Refahê di meclîsê de muhalefetekê gelek xurt meşand. Di derheqê serokwezîra kevin û seroka DYP'ê Çillerê de pêşniyar da meclîsê ku lêkolîn û lêgerîn vebibe. Li gor Refahê dema ku Çiller serokwezîr bû di şîrketên mezî; TEDAŞ û TOFAŞ'ê de gelek sîstîmalî hatibûn kirin. Meclîs ev pêşniyarên Refahê bi dengên ANAP'ê ku şîrikê DYP yê hukûmetê bû di derheqê Çillerê de qebûl kirin. Çiqas pêşniyar li hember Çillerê hatin meclîsê ANAP piştigiriya wan

kirin. Pêşniyara dawî jî ku di derheqê mal û mulkên Çillerê de bû dîsa bi dengên ANAP'ê hat qebûl kirin. Li hember Çillerê îddiyên din jî derketin. Yek ji wan ew bû, berê ku Çillerê serokwezîrtiya xwe teslîmî Yilmazî bike ji butçeya veşartî 500 milyar Lîrayê Tirkîyê kişandibû û ji bo menfaetên xwe yê şexsî bi kar anibû. Çiller li dijî ANAP'ê bû ku li hember wê bi muhalefetê re hereket dike. Çillerê digot; "Mesûd Yilmaz xencerê piştî me dixwe, dixwaze carek din ez nebim serokwezîr". Di navbera herdu partiyên ku hukûmetê avakiribûn de bîrînen kûr vebibûn. Ji bona ku Çillerê xwe ji bin van îddiyên giran xelas bike diviyabû jî hukûmetê vekîşe.

Krîza siyasî û aborî kûrtir dibe

Tirkîye di van salên dawiyê de di warê aborî, siyasî û dîplomasiyê de ketiye krîzekê mezî. Di 5 salên dawiyê de 6 hukûmet hatin damezirandin lê hetta programa ku dan pêşîya xwe jî bi cî nanîn. Li dinyayê dostên Tirkîyê kêmtir dibin, ew li dijî cîranên xwe siyasetek êrîşkarî dajo.

Bertîl, sîstîmalî, enflasyon, bûhayî, bekarî, birçîbûn û bêçaretî pêl pêl belav dibin. Kesên ku ji bêçaretiyê organên xwe difroşin, zarokên ku di kolan û li ber deriyên camiyan parsê dikin, hejmara kesên ku ji bêperetiyê li ber derên nexweşxaneyan dimrin, gundên ku hatine valakirin û însanên ku li kuçeyan û holikan de radizên zêdetir dibin. Dewlemed hin dewlemend û feqîr jî hîn feqîrtir bûne.

Hemû jî bi bertîlxwerî û sîstîmalîyê tînan îtham kirin. Partiyên Tirkîyê û serokên wan konservatîv û menfeperest in, li dijî guherandina civakî ne, mejiyên wan kufikî û zingarî bûne. Cesareta medenî bi wan re tune ye ku guherandinan bikin, hemû jî wek şûbeyên Erkanî Herb kar dikin.

Heta di sîstemê de reformên ciddî nehên kirin, adelet, huqûq û mafê mirovî li Tirkîyê bi cî nebîn, heq û azadî û demokrasî nehên firehkirin, pîrsa Kurdî bi rêyên aşî neyê çareser kirin, hukûmetên ku bînan avakirin dê jî bo Kurdan kîymetî herbiya wan jî tunebin.

Li hember huqûqa neteweyî û navnetewî realîteya Kurdî û rewşa îro



M. SEZGIN TANRIKULU
Çigirê serokê Baroya Herêmê-Diyarbakir

na mafên peymanê garantî bikin."

Peymana Navnetewî ya Mafên Medenî û Siyasî

Bend 2/1 "Her dewleta ku ev peyman qebûl kiriye, dide ser milên xwe ku li welatê xwe û ji bo her ferdê ku di bin baskê hukmê wê de ye, bêyî ku cudahiye têxe nav regez, reng, cinsiyet, dîn, baweriyeke siyasî yan yeke dîn, binyata netewî yan jî civakî, çêbûn, yan statuyekê dîn, mafên ku bi vê peymanê hatine naskirin, bi cih bîne û hurmetkara van

mafan be."

Bend 25 "Her welatîyek bêyî ku cudahî û sînordanîn hebin, xwedî maf û derfete ku;

1) Dîrek, yan bi riya nûnerên xwe yê bi azadî hatine hilbijartin, beşdarî îdareya giştî bibe.

2) Di hilbijartinên li ser bingehê dengdana giştî û wekhev û bi dengdana dizî, rast û heyamî de dengê xwe bide, yan bê hilbijartin.

3) Dîsa li gor mercên wekhevîyê karê xizmetên giştî bi dest xe."

Bend 27 "Li dewletên ku mînorîtetên etnik û yê zimanî hene, kesên ku ji van mînorîtetan xwedî maf in ku digel endamên dîn yê mînorîteta xwe wek civat ji kultura xwe feyde bibînin, dîne xwe beyan bikin, erkên wî bi cih bînin. Nabe ku ev mafên wan bîn inkar kirin."

PEYMANA MAFEN MIROVÎ YA EWRÛPAYE

Bendên 9, 10, 11.

Di yekê Tirmeha 1975'ê de li Helsinkiyê belgenamêya dawî ya KEHE yê hat qebûl kirin. Di vê belgenamê de deh (10) bendên ku welatên beşdar erêkirine, hene. Dewletên beşdar ji bo lêkolîn û hewsandina bicihanîne, biryara berdwamiya civînan da û di 21'ê Çiriya Paşîn de ji bo Ewropeyê nû Belgeya Parîsê (Şertê Parîsê) îmze kir.

BELGENAMEYA DAWÎ YA HELSINKIYE

"Dewletên ku beşdar in, û li welatên wan mînorîtetên netewî hene, divê hurmetkeriya mafê kesên ji van mînorîtetan yê wekhevîya li hember qanûnê, bikin û derfeteke tam bidin wan ku bikaribin mafên mirovî û azadiyên bingehîn bi kar bînin û bi vê armançê berjewendiyên wan yê qanûnî bîn parastin."

BELGEYA PARÎSE

"Em didin xuya kirin ku huwiyeta binyat, kultur, ziman û dînî ya mînorîtetan wê bê parastin û kesên ji mînorîtetan in bêyî hîç ferqiyetê xwedî maf in ku li hember qanûnan bi wekhevîyê kamil vê huwiyeta xwe derbibirin, biparêzin û pêş bixin."

"Em viyana xwe ya xurt radigihînin ku emê li dij her regekî regezperestî û nefreta etnik, li dij dijinkariya cuhiyan û kî bibe bila bibe li dij ferqiyetxistina nav mirovan û li dij îşkenceya bi sedemên dînî û îdeolojîk derkevin."

Wekî ku me li jor jî da xuya kirin, Tirkiyê tevî ku îmza xwe li jêr van peymanan nivîsandiye jî, lê huqûqa xwe ya hundirîn li gor van peymanan sererast nekiriye û heta îro jî huqûqa wê ya hundirîn bi huqûqa navnetewî re nagunce. Qanûna Bingehîn û hin qanûnên din yê Tirkiyê yê ku li pêş Kurdan asteng in ku hin mafan bi kar bînin, ev in:

Qanûna Bingehîn ya Komara Tirkiyê. Nr. 2709

Qanûna Bingehîn bixwe li pêş çareserkirineke demokratîk ya pîrsa kurdî, astenge.

Ji beşên destpêkê yê Qanûna Bingehîn, hukmên mafên bingehîn, hukmên ji bo partiyên siyasî li dijî peymanên navnetewî ne ku Tirkiyê îmze kirine.

Qanûna Partiyên Siyasî. Nr. 2820

Bend 5 "Mafê avakirina partiyê siyasî nikare li dij prensîbên bingehîn yê beşên destpêkê yê Qanûna Bingehîn bê bikaranîn. Nikare ji bo herifandina yekîtiya dewletê ya bi welat û mîletê xwe ve neparçebaz, ji bo peyda kirina cidahiya ziman, dîn, mezheb û deveran bê bikaranîn, yan nikare bi çî riye be jî ji bo danîna pergela dewletekê li ser bingehê van mefhum û baweriyên, yan danîna pergalê awayek ji awayên dîktatorî bê bikaranîn."

Bend 81 "Partiyên siyasî nikarin bi bîjin ku li welatê Komara Tirkiyê mînorîtetên netewî, dînî, kulturî, mezhebî, yan zimanî hene. Nikarin ji bilî ziman û kultura tirkî, bi riya parastin, pêşxistin yan berfirehkirina ziman, yan kulturine dîn, li welatê Komara Tirkiyê bi armanca herifandina yekîtiya mîlet, mînorîtetan peyda bikin û di vî warî de xebatê bikin."

"Di nivîsandin û weşandina program û destûrên xwe de, di kongre û propagandayên xwe de nikarin pankart, lewhe, kasetên deng û filmî, broşur yan beyannameyên ji bilî zimanê tirkî bi zimanekî din bi kar bînin, yan belav bikin."

Qanûna Komeleyan. Nr.2908

Bend 5 "Li dijî çarçoveya prensîbên bingehîn yê destpêka Qanûna Bingehîn, komele nikarin bîn ava kirin. Bi armanca herifandina yekîtiya dewletê ya bi welat û mîletê xwe ve neparçebaz, li welatê Komara Tirkiyê hebûna mînorîte-

tên cihê yê regez, dîn, mezheb, kultur û zimanî îddîa kirin, yan ji bilî ziman û kultura tirkî bi riya parastin, pêşxistin û berfirehkirina ziman û kulturê dîn peyda kirina mînorîtetekê, yan bi armanca bidestxistina serdestiya deverekê, regezekê, yan çinekê, yan jî bi armanca serdestiya kesên ji dîn yan mezhebê li ser kesên din, yan ji bo bidestxistina îmtiyazan, komele nikarin bîn avakirin."

Bend 6 "Di destûr û nivîsandin û weşandina din yê komeleyan de, di civînan giştî, taybetî, resmî, yê li cihê sergirtî û servekirî de qedexeyê ku bi zimanê qedexekirî pankart, lewhe, plak, kasetên deng û filmî, broşur û îlanên desta, beyanname û tiştên weha bîn bikaranîn."

Qanûna Weqifan

Di Qanûna Waqifan de jî hukmên weha hene. Lewra ev tevî ku du sal in Weqfa Maf û Azadiyên Kurdî hatiye damezrandin, hê jî nehatiye qeyid kirin.

Qanûna Nufûsê Nr. 1587

Bend 16, "Dê û bab navê zarok lê dikin. Lê navê ku bi kultura me ya millî, normên me yê exlaqî, adet û teqalîdên me re neguncin, yan dengên giştî bêşînin, nikarin bîn dayin".

Nizamnameya Paşnavan

Bend 5; "Paşnavên ku nû tên dayin, divê bi Tirkî bin".

Qanûna Îdareya Bajaran Nr. 5442

Bend 1/D-2; "Lê navên gundan yê ku ne bi Tirkî ne û tevliheviyan peyda dikin piştî ku dîtina encumeniya bajar hat pîrsîn, di nêzikîrîn dem de ji aliyê Wezareta Hundirkerî ve tên guhertin".

Qanûna Bingehîn ya Komara Tirkiyê

Bend 42; Di dezgehên fêrkirin û perwerdekariyê de ji bilî zimanê tirkî tu zimanekî din bi hevvelatîyên Tirk nayê fêrkirin, nayê xwendin".

Qanûna Fêrkirin û Perwerdeya Zimanên Bîyanî Nr. 2823

Benda 3/a "Ji bilî zimanê Tirkî tu zimanekî din bi hevvelatîyên Tirk nayê fêrkirin, nayê xwendin".

Bend 2/c; "Li Tirkiyê zimanên bîyanî yê ku bîn fêrkirin û pê perwerdekirin piştî pîrsîna dîtina Komîsyona Ewlekarîya Millî ji aliyê Komîsyona Wezîran ve tên dest nîşan kirin".

Qanûna Têkoşina Li dij Terorê Nr. 3713

Bend 8/1; "Bi çî mebest û baweriyê dibe, bila bibe, bi armanca herifandina yekîtiya dewletê ya bi welat û mîletê xwe ve neparçebaz propagandaya bi niviskî, yan bi devkî, civîn, yan xwepêşandan nikarin bîn kirin".

Qanûna Çapemeniyê Nr. 5680

Bend 31/1; "Berhemên ku li welatên bîyanî hatine çap kirin, bi welat û mîletê xwe ve li dij neperçebariya dewletê bin, li

Piştî ku di nivê salên 1980 yan de Yekîtiya Sovyetan belav bû û Pakta Varşova hat lexûkirin, dunya ber bi yekqutbiyê ve çû û mafên mirovî bû mefhumê bingehîn ya Pergela Nû ya Dinyayê. Konferansa Ewlekarî û Hevkarîyê ya Ewrûpayê (KEHE) hat damezrandin, bi Zirweya Budapeştê jî di sala 1994'ê de di hundirê KEHE yê de teşkilatên nû ava bûn bi biryara berdwamiya KEHE yê, Dezgeha Ewlekarî û Hevkarîyê ya Ewrûpayê (DEHE) hat damezrandin.

Ber bi salên 2000'an ve êdî pîrsa mafên mirovî li tu cihan wek pîrseke hundirîn ya welatekî nayê qebûl kirin.

Dewleta Komara Tirkiyê li gor peymanên ku îmze xwe avêtiye binî, kontrola dezgehên huqûqî yê navnetewî peşandîye. Di vê çarçove de peymanên Netezeweyên Yekgirtî (NY), yê dezgehên wek Konseya Ewrûpayê (KA), Komîsyon û Dîwana Mafên Mirovî ya Ewrûpayê, DEHE û peymanên ku ev dezgeh pê girêdayî ne, di çareserkirinê de kilit in. Lewra divê li bendên van peymanan bê nêrîn, yê ku girêdana wan bi pîrsa kurdî ve hene.

Beyannameya Gerdûnî ya Mafên Mirovî

Bend 2 "Her kesek bêyî ku li regez, reng, cinsiyet, ziman, dîn, baweriyeke siyasî, yan yeke dîn, binyata netewî yan jî civakî, mulkiyet, çêbûn yan jî li cudahiyeke dîn bê nêrîn, dikare hemû maf û azadiyên ku bi vê beyannameyê hatine ragihandin, bi kar bîne."

Peymana Navnetewî ya Mafên Ekonomîk Civakî û Kulturî

Bend 2/2 "Dewletên ku ev peyman peşandîne, bêyî ku ferqiyetê tîxin nav regez, reng, cinsiyet, ziman, dîn, baweriyeke siyasî yan yeke dîn, binyata netewî yan civakî, mulkiyet, çêbûn, yan statuyekê dîn, didin ser milên xwe ku bikaranîn-

dij serdestiya millî ya dewletê bin, li dij prensîbên bingehîn yê komarê, ewlekariya millî, pergala giştî(kamu düzeni) asayîşa giştî, berjewendiyên giştî û li dij sihheta giştî bin, dikarin bi biryara Komisyona Wezîran bîn qedexeyê kirin”.

Qanûna Berhemên Muzîk, Video û Sinemayî Nr. 3257

...”Eger berhemek di warê yekîtiya dewletê ya welat û milletê xwe ve neperçebare, di warê serdestiya millî, komar, ewlekariya millî, pergala giştî, normên exleqî û di warê sihheta giştî de suçdar be, yan ber bi suçdariyê ve bibe dikare bê qedexeyê kirin, derheqê wî de mahkeme bibe vekirin”.

Qanûna Wezîfe û Selehiyetên Polîs Nr. 2559

Bend 8; ”Cihên ku bi nîşandina film, kasetên video, temsîlî û listikan zerarê digihînin yekîtiya dewletê ya bi welat û milletê xwe ve neperçebare, zerarê didin pergala Qanûna Bingehîn, ewlekariya giştî û exlaqê giştî, dikarin bi fermana mezintirîn berpirsê idareya mehelî, ji aliyê polîsî ve bîn girtin”.

Qanûna Radyo û Televîzyonê Nr. 3984

Bend 4/T; ” Weşanên radyo û televîzyonê bi zimanê Tirkî tîn kirin, lê zimanên biyanî yên ku arîkariya afirandina pirsên zanistî û kultura gerdunî dikin, dikarin bîn fêrkin û ji bo ragihandina nûçeyan bi kar anîn”.

Ev hukmên di huqûqa hundirîn ya Tirkiyeyê de yê bi huqûqa navneteweyî re naguncin, li Tirkiyeyê li pêş çareserkirîneke demokratîk ya pîrsa Kurd asteng in. Ji ber vê yekê ye ku li Tirkiyê, li deverên rojhilat û rojhilata başûr ku piranî Kurd lê dijîn ev deh salin şerekî gurdar heye. Berî ku mirovên li deverê gemara idareya orfî ji ser xwe dawêşin, rejîma rewşa nerormal dest pê kir û 16 sal in li vê deverê rewşa normal peyda nebûye.

Pîrsa Muhakemeyê

Ji 1984'ê û vir de li deverên rojhilat û rojhilata başûra Tirkiyeyê ku piranî Kurd lê dijîn, ev deh sal in şerênîx (çatîşma) berdeham in û di van her sê salên dawiyê de çî ji aliyê ebata şerênîxan, çî ji aliyê berfirehiya cihê ku şerênîx lê hene, rengê şerênîxê qulîpiye ser ser.

Hê di destpêka şerênîxan de di sala 1984'ê de bi qanûna nr 2845 li Diyarbekirê Mahkemeya Ewlekariya Dewletê hat avakirin. Bi vê qanûnê warê ku ket ber hukmê Mahkemeya Ewlekariya Dewletê bû bajarên Diyarbekir, Bidlîs, Hekarî, Mêrdîn, Sêrt, Ruha, Wan, Batman, Şîrnex, Mûş, Bingol.

Ji sala 1984'ê ku Mahkemeya Ewlekariya Dewletê hat avakirin heta sala 1989'ê mahkemeyek bi tenê tîra muhakemeya dikir, lê peralêlî zêdebûna pevçûnan yan di sala 1989'ê de Mahkemeya Ewlekariya Dewletê Nr. 2, di sala 1993'ê de Mehmeme Ewlekariya Dewletê Nr. 3; di sala 1994'ê de Mahkemeya Ewlekariya Dewletê Nr. 4 hatin avakirin. Ev mahkemeyên ku hatine danîn jî tîra hukumdanê nekirine, ji ber pîrbûna hejmaraya dosyayan daxwaza avakirina Mahkemeyên Ewlekariyê yê Dewletê Nr. 5 û 6 hatiye kirin.

Hejmaraya dosyayên ku ji sala 1984'ê heta 1.10.1994'ê hatiye ber destê serdadgîriya (Başsavcılık) Mahkemeya Ewlekariya Dewletê ya li Diyarbekirê bi vî awayî ye;

| SAL | HEJMARAYA DOSYAYAN |
|--------|--------------------|
| 1984 | 26 |
| 1985 | 91 |
| 1986 | 127 |
| 1987 | 166 |
| 1988 | 351 |
| 1989 | 586 |
| 1990 | 848 |
| 1991 | 1055 |
| 1992 | 1594 |
| 1993 | 2364 |
| 1994 | 3100 |
| Yekûn: | 10.306 |

Ji sala 1989'ê heta 1.10.1994'ê hejmaraya kesên ku di mahkemeyên ewlekariyê yê dewletê de hatine mahkeme kirin;

| SAL | HEJMARAYA KESAN |
|-------|-----------------|
| 1989 | 2307 |
| 1990 | 3842 |
| 1991 | 4488 |
| 1992 | 5664 |
| 1993 | 8474 |
| 1994 | 9372 |
| Yekûn | 34.147 |

Hejmaraya kesên ku ji aliyê hêzên ewlekariyê ve hatine girtin û berdan, yan kesên girtî yê ku ji aliyê dadgîrên mehelî û serdadgîriya mahkemeyên ewlekariyê yê dewletê ve li ser wan biryara lidûneçûnê hatiye dan, ne di nav vê hejmarê de ye. Ger hejmaraya wan jî bîn bi dest xistin, wê bibe ditin ku ji sala 1984'ê heta sala 1994'ê nêzîkî 60.000 kesên di nav sînorên selehiyaya mahkemeyên ewlekariyê yê dewletê de hatine girtin. Ev hejmar jî xuya dike ku hejmaraya mirovên bi pîrsê ve eleqedar in, roj bi rojê zêde dibe. Zêdebûna vê hejmarê nîşana çewtî û biserneketina politikayên dewletê ye. Ji ber ku politikaya dewletê her roj hejmaraya kesên girtî û yê tene mahkeme kirin, zêdetir dike.

Di mahkemeyên ewlekariyê yê dewletê de, bi tenê li Diyarbekirê hejmaraya kesên ku mahkemeya wan berdeham in, digihe 3000 kesan.

Girtîxaneya Diyarbekirê ya tîp E ya ku di dema 12'ê Îlonê de tîra hejmaraya girtîyan dikir, îro biçûk maye. Girtîyên ku mahkemeyên wan berdeham in, li ser girtîxaneyên li jêr hatine belav kirin:

- 1- Diyarbekir -Tîp E
- 2- Girtîxaneya Diyarbekirê- Merkez
- 3- Girtîxaneya Ruhayê
- 4- Girtîxaneya Semsûrê-Tîp E
- 5- Girtîxaneya Entabê - ya tîp taybetî
- 6- Girtîxaneya Mêrdînê - Tîp E
- 7- Girtîxaneya Elezîzê - Tîp E
- 8- Girtîxaneya Bingolê - Tîp E
- 9- Girtîxaneya Mûşê - Tîp E
- 10- Girtîxaneya Sêrtê - Tîp E
- 11- Girtîxaneya Batmanê - Tîp E

Girtîyên ku li van girtîxaneyan dimînin, roja mahkemeya xwe bi tirimbêlên girtîyan bo Diyarbekirê tîra veguhastin, heman rojê piştî mahkemê bo cihên xwe tîra vegehandin. Her weha plan hene ku li Diyarbekirê girtîxaneyêke nû ya deverê bibe avakirin.

Hejmarên ku me li jor xuya kirin yê dosyayên ku hatine ber destê mahkeme-

yê ewlekariyê yê Diyarbekirê ne. Di du salên dawiyê de şerî cihê xwe veguhastiyê bo devera Qers-Agrî, Erdahan-Erzurûm, Tuncelî-Erzincan- Sîwasê. Ger hejmaraya girtîyên ku dikevin nav sînorên desthilatdariya mahkemeyên ewlekariyê yê Erzincan û Qeyseriyê jî li van hejmaraya bibe zêde kirin, mezinahî û balkêşî û tîra pîrsê jî bo me zelaltir dibe.

Li gor serkaniyên dewletê, bûyerên ku ji sala 1984'ê heta 01.09.1995'ê rû dane:

| | |
|---|--------|
| Hejmaraya bûyeran | 11.110 |
| Hejmaraya kuştîyên sîvil | 3.302 |
| Hejmaraya kuştîyên wezîfedarên ewlekariyê | 2.657 |
| Hejmaraya kuştîyên PKK'yî | 6.702 |
| Hejmaraya birîndarên PKK'yî | 215 |
| PKK'yîyên bi saxî hatine girtin | 1.636 |
| PKK'yîyên ku xwe teslîm kirine | 867 |

Li gor statîstîkên resmî, 2.200 gund û mezra hatine şewitandin û vala kirin.

Ji van gund û mezrayan, ji bajar û bajarokên lê şerênîx çêbûne 2.000.000 kesên bar kirine, wek nufûs du Diyarbekir li nufûsa Diyarbekirê zêde bûne. Mirovên barkirî li cihên ku bo bar kirine birçî û bê mal û xanî dijîn. Tu meqameke resmî guhê xwe nade problemên wan û bi serde jî, li deverên rojava ku bo bar kirine, ji ber huwiyeta xwe tûşî zulma meqamên resmî dibin û rê li ber wan tîra girtin ku bikaribin di karên rojane de kar bikin.

Di du salên dawiyê de nêzîkî 3000 kesên ji aliyê qesasnediyaran ve hatine kuştin, beşa mezin ya qatîlên van kuştinan hîn jî kî ne, ne xuya ye.

Di vê sala dawiyê de 30 ebûqatên ji Baroya Diyarbekirê hatine mahkeme kirin, bi riyên bêqanûnî hatine girtin. Her di vê demê de 6 ebûqatên binyatkurd li bajarên Elezîz, Tatwan, Wêranşar, Enqere û Stenbolê ji aliyê qesasnediyaran ve hatine kuştin. Ne ji bo mirovên li deverê dijîn, ne ji bo ebûqatan ewlekariya jîyanê nemaye.

Tabloya ku me li jor diyar kir, nîşan dike ku politikayên hukûmetan yê bi salan hatine domandin, pîrs çareser nekirine, berevajî girantir û aloztir kirine.

Pîrsa kurdî ne pîrseke asayîşê ye. Wek pîrseke asayîşê li pîrsê nêrîn û li çareyan geriyar, bêçaretî ye.

Gelek aliyên huqûqî û siyasî yê pîrsê hene. Divê di vê çarçovê de li pîrsê bibe nêrîn û çare bîn ditin.

Ji 1'ê Gulana 1984'an heta 1'ê Îlona 1994'an bûyerên ku derbasî qeydên DGMyê bûne ku serkaniyên dewletê behs dikin ev in:

| | |
|-----------------------------|--------|
| Hejmaraya bûyeran | 11.110 |
| Sîvilên mirine | 3.302 |
| Mensûbên emniyetê yê mirine | 2.657 |
| Milîtanên PKK'ê yê mirine | 6.702 |
| Milîtanên PKK'ê yê birîndar | 215 |
| Milîtanên sax hatine girtin | 1.636 |
| Milîtanên teslîm bûne | 867 |
| Gundên hatine kavilkirin | 2.200 |

Ev hejmar di du salên dawî de bûne du qat.

Li gor salan daweyên ku li DGMya Diyarbekirê hatine vekirin:

| SAL | DAWE |
|-------------|--------|
| 1984 | 26 |
| 1985 | 97 |
| 1986 | 42 |
| 1987 | 173 |
| 1988 | 358 |
| 1989 | 714 |
| 1990 | 875 |
| 1991 | 1112 |
| 1992 | 1650 |
| 1993 | 2434 |
| 1994 | 2474 |
| 1995 | 2924 |
| 1996(nîsan) | 699 |
| Yekûn | 13.677 |

Hejmaraya kesên ku li gor salan di DGM yê nr.1,2,3 û 4 yê Diyarbekirê de hatine mahkemekirin.


| SAL | HEJMARAYA KESAN |
|--------------|-----------------|
| 1984 | 119 |
| 1985 | 325 |
| 1986 | 455 |
| 1987 | 602 |
| 1988 | 1.396 |
| 1989 | 2.815 |
| 1990 | 3.531 |
| 1991 | 3.953 |
| 1992 | 7.053 |
| 1993 | 8.101 |
| 1994 | 8.549 |
| 1995 | 6.825 |
| 1996 (Nîsan) | 1.659 |

Li gor serkaniyên ku PKK'ê di derbarê bûyeran de dane ev in (heta dawiya 1995'an

| | |
|--------------------|-------|
| Yekûna bûyeran | 2.202 |
| Eskerên mirine | 5.260 |
| Timên mirine | 36 |
| polîsên mirine | 40 |
| Ji xelkê yê mirine | 124 |
| Milîtanên mirine | 1.022 |
| Yekûn | 8.684 |
| kes mirine. | |

Wergera ji Tirkî REMZÎ KERÎM

Serkanî: Kovara Baroya Herêma Diyarbekirê- Hej. 6



"Yê çewtiyan dibîne û rexne nake ne rewşenbîr e, memûr e"

Hevalê me Azad Şatehî bi serokê Med-Kom'a Stenbolê Metîn Ozbay re hev-peyvînekê çêkir.

Armanç: Wek danêr û birêvebirê MED-KOM'ê, bi raya te MEDKOM ji ber çi pêwistiye, ava bû?

M. Ozbay: Avakirina MEDKOM'ê bi rastî jî, pêwistiyeke mezin bû. Li metropolan têkoşîneke germ ji mêj ve berde-wam e. Lê, aliyê din ve jî pêwistiya çiyekî, mekanekî ku însan karibin bîn ba hev, bi hev re bipeyivîn û hin kar û xebatan bikin, hebû. Ji aliyê din ve jî, diviya lêkolînên zimanzanî, kulturî, siyaseta kurdewarî hebe. Di dema xwe de, ku mirov hin program û projeyan çêneke, gavêkê şunde mirov nikare tiştekî bike. Însan bi serê xwe, çandî zane û ronakbîr be jî nikare tiştekî bike, dema me dema organîzebûnê ye. Karên wiha, bi ekîban, bi xebata kolektîf dibin. MEDKOM jî pêwistiyek wiha hate holê. Berî bi salekê, fikrek me ya wiha hebû, lê vekirina dezgeheke wiha ne hêsan e.

Armanç: Kar û xebata we ya niha di çarî de ye?

M. Ozbay: Em xebata ziman ji her tiştî girîngtir dibînin, ji bo wê jî me bi vê xebatê dest bi kar kir. Ji jî bo pêşilêgirtina asimilasyonê, ji bo em karibin bi zimanê xwe bifikirin, bixwînin, binivîsin me bi vê xebatê dest pê kir. Dûre, me dest bi xebata muzîkê kir û hîn dom dîke. Her wiha, me xwest ku komên muzîkê yê her heyî berhemên xwe pêşkêşî xelkê bikin, ev îmkân me daye wan. Ji aliyêkî din ve, gelek ronakbîr û zanayên Kurd, li ser gelek warên zanistî û çandî, bi semîner, konferans û hwd. lêkolînên xwe pêşkêşî gel kirin, me ev îmkân daye wan. Ji bo ku em gelê xwe yê li vir şiyar bikin, piştî avabûnê heftê carek an du caran çalakiyên wiha dibin. Her dawiyê heftê rojekê semîner an panel û rojekê jî muzîk an şayiya me heye.

Armanç: Tu dikarî bêjî, ku sedî sed hûn gîbiştin armanca xwe?

M. Ozbay Helbet dil dixwaze ku ev xebat ji sedî sed pêk bîn. Lê ji aliyê din ve jî divê mirov bibîne ku gelek problem û zorî li pêşiya me hene. Helbet saziyên wiha, nikarin bi mejiyê ticarî bîn meşandin. Ji ber wê jî, problemên me yê bingehîn madî ne. Tu çandî projeyên baş û rêkûpêk deynî ber xwe jî, ger îmkânên madî tunebin tu nikarî pêk bînî, û pêşve bibî. Ya din jî, însanên me; her

çend têkoşînek germ hebe jî, li xebatên zanistî û çandî zêde germ nanêrin, ji wî alî ve lawaz in. Însanên me zêde hîsî ne, mirinê tercihî xebatên zanistî dikin. Dibe ku ev karekerekî netewî yê Kurda be jî, ew şerê çekdarî tercihî xebatên wiha dikin. Lê, dibê em ji bîr nekin ku hebûna miletekî bi hebûna ziman, tore, adet û çanda wî ve girêdayîye. Ger ziman folklor, çand û hwd tunebin, xelk nikare xwe wek miletekî îfade bike. Ji bo wê jî bi raya min xebata di vî warî de bi kêmanî wek şer girîng e. Problemeke din jî mîratekî me yê wiha tune. Di derheqa xebatên di vî warî yê berî me de, di destê me de tu arşîv û dokuman nînin. Ango, li surgunan an li welêt komel ava bûne û xera bûne, lê tu belge an dokuman negîhaştine destê me. Em dinêrin ku em dîsa vegeyriyane serî, tiştekî ku em destê xwe bavêjinê û li ser wê hin tiştên nû ava bikin tune. Ev jî bo me Kurdan problemeke mezin e, bîra mirov wenda dibe, însan do û pêrê xwe nizane, yanî raburdiya xwe nizane. Dema ku dokuman hebin, belge hebin mirov dikare ji tecrûbeyên wan îstifade bike û tiştên nû li ser zêde bike, lê dema ku tunebin divê tu vegeyri serî, Amerîka jî nû ve keşf bikî. Dema ku tiştekî amade hebe, mirov dikare enerjî û potansiyela xwe ji bo tiştekî din seferber bike. Di vî warî de çiqasî kêmasiyên Kurdan hebin jî, bi rastî dîsa pîrsa çavkaniya problema politîka dewleta zordest e, ev dewleta kolonyalist çiqas tiştên ji bo Kurdan baş hebin gişkî tahrîb dîke, naxwaze tu tişt ser koka xwe şin bibe.

Armanç: Xebata MEDKOM'ê tenê li Stenbolê ye, an li welêt jî xebat û şaxên wê hene?

M. Ozbay: Bi navê MEDKOM'ê, berê li Diyarbekirê navend ava bû. Piştî wê li Stenbolê 19'ê Tebaxa 1995'a vebû. Lêbelê ne wek şaxekî ya Diyarbekirê, ji wê cuda ava bû. Her du sazî jî, ji alî şirketên ticarî jî bo xebata kulturî û zanistî ava bûn. Helbet, tîkiliyên navbera me tîkiliyên dostanî ne, ne yê resmî ne. Ango, ne şûbên hevdu ne. Lê, li pêş em dixwazin bi hevalên Diyarbekir re xeber din û wan bikin şaxê xwe. Helbet dil dixwaze şûbeyên me li bajarên din ên Kurdistanê jî hebin. Lê ev yek heta îro wek fikri, proje li pêşiya me ye. Heta nuha îmkânên me dest nedan. Lê em dixwazin bêtir fireh bibin û xebatên xwe jî li gor wê fireh bikin.

Armanç: Wek te zanî ji bilî we jî navendên rewşenbîrî hene, tîkiliyên we û wan çawa nî?

M. Ozbay: Tîkiliyên me bi wan re jî hene, lê tîkiliyên dostanî ne. Tîkiliya selamdayînê em naxwazin, em dixwazin hîn baştir û pêşdetir bin. Ango em, divê karibin bi hev re projeyan biafirînin û bi hev re bixebitin. Tîkiliyên nav saziyên netewî yê çandî, divê li ser bingehê kar û xebatê be, ne tenê bi silavdayînê bisînor be. Dan û stendin divê hebin, wek min berê jî got, divê em karibin ji îmkânên hevdu îstifade bikin. Dokumentên di destê hevalên me de hebin ew bidin me, yê di destên me de hebin em bidin wan. Divê em van îmkanan tenê ji xwe re venêşêrin, li ser wan rûnenin û ji destê hev negrin. Lê tevî wê jî, ez bawer im ku dan û stendinek li ser vî bingehî ne hêsan e jî, ji ber ku herkes dixwaze îmkânên xwe yê her yê jî bo propoganda bi kar bîne, reqabet heye. Ev reqabet jî, ne ji bo pêşketinê, lê gelek caran ji bo elimînyasyonê bi kar tê. Lê, divê em dev ji van nêrînen teng û tesk berdin, hemû saziyên her yê bîn cem hev û projeyên mezin, yê li berjewendîya giştî biafirînin û bixin jiyane. Wek me berê got, ji bo filim çekirinê, radyo avakirinê, îmkânên me yeko yeko têrê nakin, lê ku em bîn bal hev, emê karibin bi hev re projeyên wiha mezin ji pêk bînin. Dema em karibin radyoyekê ava bikin ku hemû weşana wê ne bi Kurdî jî be, em dikarin mesajên xwe pê bigîhînin xelkê. Dîsan ku em bîn cem hev ji alî kadroyan de jî wê îmkânê mezin bi destê me keve.

...Kurd ji xebatên zanistî û çandî re ne germ in, hissî ne, mirinê tercihî xebatên zanistî dikin. Dibe ku ev karekerekê Kurdan be jî, ew şerê çekdarî tercihî xebatên weha dikin.

Armanç: Wek navendek rewşenbîrî ji bo pêş çî projeyên we hene?

M. Ozbay: Projên me gelek in: li ser sînema Kurdî em dixwazin hinek filimên belgeyî çêbikin, em dixwazin di warê teknîkî û zanistî de hin lêkolînan çêbikin û ekîbek rewşenbîrî ku ji her warî rewşenbîrî de cih bigrin, çêkin. Em dixwazin îmkânê wisa ji rewşenbîran re çêbikin da ku karibin bi awayekî kolektîf kar bikin û berhemên biafirînin. Dîsa, em dix-



wazin xebatên xwe yê her yê bi pêş de bibin. Wek li ser muzîkê, em dixwazin xebat û lêkolînên zanistî bikin, ne ku tenê em stranên bêjin. Her wiha, em dixwazin kar û xebata me bibe belge û bikeve arşîvan, ne ku tenê em bêjin û derbas bibin. Wek me li pêş rexne kir, îja divê em jî nekevin wê rewşa ku me rexne kir. Lê, her çend me rexne kir, bi rastî xebatên me jî heta niha wek me dixwest neketine dokumenta, ev jî kêmasiya me ye. Helbet, ji alî teknîkî ve, ji alî madî ve kêmasî û problemên me hene. Ji bo wê jî, tiştên me dixwest me nikaribû pêk baniya. Ev


jî, rexna min a xwe bi xwe ye.

Armanç: Wek ronakbîrêkî, wek birêvebirê navendekê çandî, bi raya te tîkiliyên siyasî û yê rewşenbîrî divê li ser çî bingehê bin? Her wiha, ji bo projeyên ku te li jor jîmartin pêk bîn heviya we ji derdorên siyasî çî ye?

M. Ozbay: Helbet, jîyan ji siyasê qetiyayî nîne, jîyan bixwe siyasete, bê siyasê nayê jîyan. Madem em li ser kulturê

Metîn Ozbay kî ye?

Metîn Ozbay di sala 1960î de li Ardahanê, li navçeya Xoçwanê hatiye dinê. Li gor wî, ew bi çanda kurdî terbiye bûye. Ozbay dibistana seretayî û navîn li Ardahanê dixwîne. Di 1974'an de tê Stenbolç û li wir lîsê dixwîne. Di dema lîsê de li gor gotina wî "wekî gelek hevalên din, bi hestê neteweyî" dihesa û di nav têkoşîna netewî û şoreşgerî de cih digre. Piştî lîseyê li Enqereyê li Unîversîteya Teknikî ya Rojhilata Navîn, Fakulteya Zanyariyên Îdarî, Beşê Zanyariya Suyasetê Birêveberiya Gelerperî (Ortadoğu teknik Üniversitesi İdari İlimler Fakültesi Siyaset Bilimi Kamu Yönetimi Bölümü) dixwîne. Paşê vedigere Stenbolê û jiyana xwe, kar û xeba xwe ya siyasî û rewşenbîrî heta îro jî li wir didomîne.



ka diafirînin. Li gor wan materyala dikare bêje, dema ez vî karî bikim wê welatê min ev hinde pêşkeve. Rewşenbîr divê probleman dest nîşan bikin û siyasetvan jî li ser çareserîya wan bigerin, ji bo wê kar bikin. Îca divê rewşenbîr li pêşîya siyasetvan be, ne ku siyasetvan pêşî lê bigre. Her welatekî pêşketî, bi vî awayî pêşketî ye. Rewşenbîr ramanan (fikir) diafirînin û li ser van fikir, plan û projeyan politîka ava dibin. Welatên rojeva, bi ronakbîriyê, bi reforman û bi ronahîyê pêşketine. Ev jî bi xebeta rewşenbîra bûye. Ger ku rewşenbîr girêdayî siyasetvanekî an gerîlayekî be, ne rewşenbîr e li gor min nikare tu fikran jî biafirîne. Divê ronakbîr çî tiştê xerab hebe bikaribe rexne bike. Dema ku çewtî dit û rexne nekîr, mana xwe ew memur e, ne rewşenbîr e.

Armanç: Te got ku, hûn gelek kursan didin wek; kursa zimana, ya muzîkê, ya folklorê û hwd. Di van xebatên xwe de, hûn heta çî radeyê jî teknolojîya pêşketî fêde dibînin?

M. Ozbay: Bi rastî jî aliyê teknîkî ve îmaknên me gelekî kêmtir in. Her çend MEDKOM îmkanek be jî, ji bo gel, lê jî aliyê teknîkî ve kêmasiyên me pir in, îmkanên me yê maddî kêmtir in. Proje ne zor e, em her tiştî difikirin, lê ew wê çawa baştir pêşve herin? Em wê yekê baş dizanin, lê ji ber îmkanên me yê maddî kêmtir in em gelek caran nikarin karê xwe wekî ku pêwîst e bikin. Em ferzbikin kursa zimên; ji bo hînkirina zimên teknîkî pir pêşveçûyî hene. Lê em ji ber bêîmkaniyan hîn bi metodeke klasîk, bi textê reş û tebeşîrê dersê didin. Ji alî deng û dîtîne ve teknîka pêşve çûyî ger em karibin jê îstifade bikin, xwendekarên me wê zûtir û hêsantir ziman fêr bibin. Em ferz bikin tiştêkî ku mamoste di niv seetê de li ser texte dikare binivîse, bi alet û teknîka pêşketî, pê li bişkovekê ke di niv saniyê de kare nîşanî xwendekaran bide. Ev jî alî zimana ve teserûfek mezin e, ji alî rihetiyê ve baş e. Lê, ji bo bidestxistina van îmkanan emê han bidin. Ji bo muzîkê jî, enstrûman û îmkanên me kêmtir in. Film nîşandan îmkanek mezin e, cihê me jî bo dused, sêsed kesan musaîd e, lê ji ber ku makîna me tune em nikarin jê îstifade bikin.

Armanç: Mesaja te ya dawîn?

M. Ozbay: Ez dixwazim ji xwendevanên we re bêjim, ku divê em bi hemû hêz û karîna xwe li van dezge û saziyên xwe xwedî derkevin. Ji ber ku îmkan ne bi rihetî hatine avakirin, bi renc û kedek pir bi dest ve hatine. Bi fedekarî, bi xwî û renca însanan hatine çêkirin, ji bo ku xelk jê îstifade bike. Ev xebat ne xebatên ticarî ne, çandî, zanistî ne. Bi fedekariya însanan ku li van deran dixebitin pêk tên. Îca divê însanan me jî, ji bo jê sûdwergirin han bidin. Divê însanan me jî aliyekî ve, beşdarî van çalakiyan bibin û jê îstifade bikin û ji aliyê din ve jî, ji hêla maddî ve piştgiyariya van xebatan bikin. Ev sazî yê me hemûyan in, divê em ji alî maddî û manevî ve li wan xwedî derkevin. Em li hêviya însanan xwe yê welatparêz in ku bêjin îmkana min heye, ji bo ku xebat pêş ve herin pişt didim we. Bila bê zanîna ku, tiştê ku bê vir dîsa wê pêşkêşî xizmeta xelkê bibe.

derdikevin pêş, li gor wê divê xebat bêkîrin, li gor politîkayekê ku armanca wê diyar be divê em bixebitin.

Ez dixwazim vê jî bêjim, dezgehên rewşenbîrî wek MEDKOM ê, bi nêrîna min gelek girîng in. Her wiha pêwîstiyek mezin heye di vî warî de. Di cih û warên wiha de. Mirov dikare gelek xebatên ku gel jê karibe îstifade bike pêk bîne. Helbet, em dizanin ku xelkê me di bin nêrî kolonyalîzmê de ye. Zanîngeh, enstîtu akademî û tiştê girîng, dibistanên me nînin, ku însanan me di wan de perwerde bibin; zanîst, politîka çand û wêjeyê fêrbibin. Di wê manê de jî, lazimiyek mezin heye. Em dikarin bi konferans, sêminer çalakiyên din xwe bighînin gelê xwe, dîsa divê em zanîngeh an enstîtuyên xwe ji bo lêkolîneran amade bikin. Wê gavê jî, divê însanan me yê ku rewşa wan destdide ji alî maddî ve alîkariya me bikin û em jî ji bo xebatên zanistî û çandî îmkanan xwe seferber bikin. Her wiha lêkolîner jî, divê bi kar û xebata xwe van dezgehyan bidin xebitandin û dîsa li vir xebatên xwe pêşkêşî gel bikin.

Ji aliyekî divê projeyên heya bî firekîrin û ji aliyê din ve jî projeyên nû bînin holê, li ser wan bifikirin û wan pêşdebibin.

Armanç: Dema me pîrsa tîkiliyên organîzasyonên siyasî û saziyên çandî kir, mebesta me ew bû ku em bêjin, divê tîkiliyên çandî di ser yê siyasî re bin, netewî bin. Ji ber ku çand ne ji bo çî an tiwêjekê ye, malê gel e. Bi vî bir û baweriyê, gelo îmkana yekîtiya saziyên çandî li ser bîngeha neteweyî mumkun e an ne mumkun e?

M. Ozbay: Li Kurdistana Bakur, dezgehên me yê netewî ava nebûne. Ji bo vî jî, her saziyek rewşenbîrî di bin bandora rêxistînek an partiyek siyasî de ye. Ango, her rêxistînekê li gora îmkanan xwe jî xwe re dezgehek ava kiriye û xebatên xwe pê dimêşîne, ya rastî ev e. Ji bo vî jî, rewşenbîrên serbixwe nikarin zêde di nav van dezgehyan de cih bigrin û kar û xebatê bikin. Ev ne tiştêkî rast e, lê realîta me ev e. Dema ronakbîrekî serbixwe bixwaze di nav saziyekê de cih bigre, li gor nêzîkbûna bîr û boçûnên wî û yê saziyê pir an hindik qebûl dibe. Ji ber vî jî, valahiya saziyên netewî çêdibe, wek; enstîtuyan, dibistanan û hwd. Ji bo ku her kesekî ku bixwaze karekî li berjewendiyên gel bike, karibe bi hêsantî kar bike. Dema ku em li gor bîr û baweriyên wan yê siyasî her yekî bidin alîkî, ev xebat û lêkolîn pêş nakevin. Divê em tenê ne li gora rewşa rojane xebat bikin, ji bo deh sal şûn de jî tovan bavên axê. Ji ber ku jiyana û tîkoşîna wê dewam bike. Ev sed sal in berdewam e. Dema te ji kesên ku wê demê serî hildabûn bipirsiya xeyal nedikir ku piştî heştê salî wê tîkoşînek wek ya îroyîn bê dan. Îro dom dike, lê em dibînin ku wê hîn bi deh salan jî dom bike. Îja divê em projeyên xwe li gor vî rewşê biafirînin. Divê em zanibin ku tovê îro em davên, wê piştî deh an bîst salên din mewê bide. Ev yek karê rewşenbîra ye, divê siyasetmedar nekevin pêşîya wan. Ji ber ku siyasetvan li gor rewşa aktuel plan û programan çêdikin. Îlmê siyasî jî ev e. Îro em dibînin, li zanîngehan, li enstîtuyên lêkolîneran stratejîk plan û projeyên dîr û dirêj tên afirandin û siyasetvan li gor van programan politî-

Armanç: Bi raya te, politîkayên çandî yê tevgera rizgarîxwaz a netewî yê hewî, bersîva rojê dide an na?

M. Ozbay: Kêmasiyên heya min jîmartin. Mana xwe, dema kêmasî hebin ihtiyac jî hene, ji bo wê jî divê em politîkayên nû biafirînin. Divê însanan me, di vî warî de jî hêz û potansiyela xwe bilivînin; projeyên baş bidin ber xwe, fikrên baş biafirînin û li ser wan bixebitin.

Rewşenbîr divê probleman dest nîşan biki û siyasetvan jî li çareyên wan bigerin. Îca divê rewşenbîr li pêşîya siyasetvan be, ne ku ku siyasetvan pêşî lê bigre. Ger ku rewşenbîr girêdayî siyasetvanekî yan gerîlayekî be, bi min nikare fikran biafirîne.

ketin çênabe, raya min ev e. Bi vî manê tîkiliyên saziya me û siyasetê girîng in. Ji aliyê din jî, helbet jiyaneke pir aktif didome; çî li metropolan û çî jî li welatê me. Ji bo vî jiyana germ, wê çî alîkariya me bibe, çî rola me hebe divê em li ser vî yekê jî bifikirin. Wek me berê jî got, divê em muzîkê jî bo tîkoşîna xwe an ji bo guhartina jiyana xwe an jî ji bo kul û derdên xwe çêkin? Divê mêjiyê me di van xalanda zelal be, net be. Helbet; li gora jiyana, li gor demê hin tişt carna



Serdar Roşan

Demokrasî û Konsensusa Neteweyî

Ev vextekî dirêj e ku li başûrê welatê me di navbera du hêzên kurdan de şerekî navxweyî berdewam e. Herweha di parçeyên welatê me, yên din de jî lihevhatinek û temsilkariyek giştî û kamil çî mixabin çênebûye. Kurd jî hevketî û belawela ne. Ne di nav kategoriyên civakî ne jî di navbera hêzên kurdan de konsensuseke neteweyî, li ser bingehê azad û demokratîk ya hevdem pêknehatiye. Aya jibo me kurdan, jibo rizgariya welatê me, jibo civateke pluralîst û azad, konsensuseke neteweyî pêwîst e an na? Eger pêwîst be gelo li ser kîjan bingehên civakî û siyasî mirov dikare vê yekê bi pêşî bîne? Dijwariyên vê yekê çî ne?

Bêşik civata kurdan jî fena hemû civatên heyî ne homojen e. Bîr û rayên ku di nav civatê de hene û yên ku reh digrin bi gorî dem, pirs û pirsgirêkan dihêne guhertin. Ramanên ku civatê bi hev ve dikelînin û di hin waran de nakokiyên hundurî û piçûk paşçav dikin an jî li paş dihêlin, di dereceya yekemîn de ji bo hebûn û domandina jiyana wê civatê zerûrî ne. Ev yeka han eger bi nimûne bihête nîşankirin fikra netewayetî û ol(dîn) di vê çerçevê de du nimûneyên fikrî û balkêş in. Him dîn him jî netewayetî li ser bingehê fireh û di nav civatê de rehên xwe bi şeweyeke pîrralî li nav hemî çînan û kategoriyên civatê de geş dikin. Van herdu ideolojîyan, di wext û warên cuda de, roleke wê girtine ser milê xwe; û her digrin jî. Berê ku fikrên nasyonalîzmê li nav civatan geş bibin olê rola çimento ya ku civatê bi hev dikelîne û meşrûiyeta civatê û birêvebirina wê diyar dike hildigirt. Piştî fikrên neteweyetî û geşbûna wan ev rola han heta radeyekê jî dîn hate wergirtin. Lê divê bihête gotin ku herçiqas bi geşbûna fikrên nasyonalîzmê, damezrandina dewletên neteweyî û awayê birêvebirina civatê hat guhertin, ango çînen bîndest beşdarê birêvebirina civakê bûn û jî ber van hoyan rola dîn kêm bibe jî, ev rol bi carekê nehatiye û nahête qutkirin. Li kêleka fikrên neteweyetî dîn di nav civatê de li ser jîyan û kultura civatê hebûn û girîngiya xwe berdewam dike.

Herçiqas li hin cihan dîn jî bo siyaseta di destê birêvebiran de mîna wasiteyeke siyasî dihête bikaranîn jî lê xeta serkeftî û berbiçav jihevweqetandina dîn û kar û barên birêvebirinê ye. Ango dîn û dewlet jî hev dihên cudakirin. Pîrsa dîn û baweriyê di çerçeweya civata sîvil de dihê mulazimê. Civat bi xwe ve yeka hanê formule dike.

Helbet di nav civatê de fikirên ku hene, ne tenê dîn û nasyonalîzm in. Herweha fikrên cihê yên berjewendiyên cuda dihînin zimanî hene. Ev fikir, ji parastina tebîetê bigire heta nîjadperestiyê, di her warî de xwe diyar dikin. Keftûlefta fikirên cuda li dij hev her hebûye û berdewam e.

Ne civat ne jî netewe ji kutleyeke homojen pêk dihên. Herdu fenomen jî di nava xwe de pîrrparçeyî û rengîn in. Eger mirov bi kurtî li ser rewşa îroyîn raweste dê bibîne ku di dema me de her civatekê xwe bi şeweya netewe, dewleta neteweyî, perwerdekirina neteweyî û kultura neteweyî organîze kiriye û dike. Yên ku nekaribûne xwe di vê çerçeweyê de organîze bikin çî mixabin an mehiyane(asîmîle bûne) an jî li ber mehandinê ne. Baş e çîma hin civat karibûne xwe di çerçeweya ku me behsê kir de organîze

bikin û yên din nekaribûne? Eger bi kurtî mirov li ser bisekine û hoyên ve yekê destnîşan bike, mirov dê bibîne ku çend nuqteyên balkêş û hevbeş hene:

- Zanîn û xwenasîna tarîxî.

- Xurtbûna kultur, fikrên civakî, neteweyî û jibo hebûn û berdewambûna vê yekê bi hêzbûna rewşenbîrên civakê bi herawayî.

- Konsensusa civakî ya di çarçeweya domandina jiyana neteweyî û fikrên neteweyî.

- Perwerdekirina neteweyî ya ku her civat an neteweyekî bi hev ve dikelîne û kamil dike.

- Parastin û lîxwedîderketina kultura neteweyî, folklor, berhemên edebî, hêjayên arkeolojîk û hwd.

Helbet li rex van nuqteyan rewşa siyasî, cografî, eskerî û aborî girîng e. Lê divê nehête bîrvekirin ku ya civat an neteweyê bi hev dikemilîne û jiyana wê di rojên şikestin û dijwar de jî dide berdewamkirin nuqteyên jorîn in. Helbet rewşa siyasî, cografî û iqtîsadî li ser bicihanîna van nuqteyan roleke girîng nîşan didin. Lê netewe di rewşeke ne baş û bîndest de be jî eger bi rewşenbîrên xwe, bi şûra xwe ya millî, bi xwezaniya xwe ya tarîxî û lihevkerina (konsensus) xwe ya millî de, di radeyê kamil de be, rewşa wê ya nexweş, dijwar û bîndest zêde dom nake û dijmin nikare birînen kur di nav neteweyê de peyda bike an jî neteweyê jî hev biêxîne û tune bike.

Em Kurd

Baş e, em bîr û li ser rewşa kurdan rawestî. Aya kurd wek netewe di rewşa îroyîn de û li dinyayê ku ji dewletên neteweyî pêkdihe, helwestên pêwîst yên hevçax nîşan didin an na? Helbet rewşa ku kurd bi giştî tê de dijîn dihê zanîn. Ez bi xwe li vir hewce nabînim wê rewşa dijwar ku gelê kurd tê de dijî dubare bikim. Nuqteya girîng û balkêş jî min re ev e: Ango siyasatmedarên me kurdan, rewşenbîrên kurdan xwedî helwesteke -ku rewşa civata me ronî dike û hêviya rojên azad geş dike- pêwîst in an na?

Eger mirov li gorî nuqteyên ku min li jor nivîsîn li rewşa kurdan mêze ke çî mixabin bersiva pîrsê ne bi dil e, mirov nikare jî dil xoşbîn be. Di her warî de kêmasî û çewtiyên mezî li ber çav in. Şûra millî li cem me kurdan di maneya xwe ya kamil de kême e, konsensusa neteweyî tune, bi hêla fikrî û rewşenbîriyê lawaz e, ango rewşenbîrên kurd wek kategoriyeke bi ser xwe, rexnegir û munaqesêkir zêif in; û hwd.

Ronakbîrên Kurd

Li vir nuqteyê girîng ya li ser rewşa ronakbîr û helwesta wan divê were diyar kirin. Civatên ku jî hêla ronakbîrên xwe de lawaz in; û bi zanîn û hafîza xwe ya tarîxê zêif in, zû bi zû -nikaribûne- û nikarin ji rewşa xwe ya dijwar û nebaş xwe rizgar bikin. Lewra li vir rola rew-

şenbîran bi şeweyekî serbixwe, ango wek kategoriyeke serbixwe girîngî û elzemiya xwe diyar dike. Ronakbîrên kurd çî mixabin wek blokeke serbixwe û xurt li meydane ji xwe re cihê; ango bi raman û dîtinên xwe di nav neteweyê de cîyekî teybetî jî xwe re peyda nekirine. Bi berhem, fikir, zanîn û dîtinên xwe ve bi şeweyekî berfireh li nav civatê reh nedane. Bîr û raya wan tesîreke mezî li ser gel nekiriye, nake. Sebebên vê yekê bê şik hene. Li vir li ser wan sebebên nayête rawestandî. Lê eger bi çend hevokan mirov bi şeweyekî kurd bala xwe bidê, bi qenaeta min çend nuqteyên balkêş xuya dibin.

Ronakbîrên kurd jî wek hemî rewşenbîrên derên din li bajarên dijîn. Çî mixabin zimanê wan yê nivîsînê heya salên dawî bi tirkî bûye. Li cem hinan hîn jî bi tirkî ye.* Li hêla dîn di nav civata kurd de yên ku kultur û zimanê kurdî -bi hebûna xwe û bi giştî- parastine qîsmê ne-asîmîlebûyî ne, yanî gund û gundiyan kurdan war û bingehê ve yekê ne. Bi zimanê tirkî fikrî û nivîsîn bi giştî, di navbera ronakbîr û parêzgerên zimanê kurdî -gundan- de di warê tîkîliyan de qutbûnek peyda kiriye. Baş e çîma ziman û kultura kurdan hewqas girîng e? CT ji damezrandina xwe bigre heya îro esasê politikaya xwe li dijî kurdan wek mehandina kurdan tespît kiriye. Ango qirkirin û tunekirina ziman û kultura kurdan dê bibe sebebê windabûna hest û fikrên neteweyî. Çî mixabin di vî warî de CT heta radeyekî bi ser ketiye. Bi milyonan kurd îro nikarin bi zimanê xwe bipeyivin û binivîsin.

Siyaseta mehandina kurdan

Entegrasyona kurdan, mehandina kurdan di nav civata tirkan de jibo siyaseta dewleta tirkan karekî bingehîn e. Entegrasyon ne tenê di warê aborî de pêk dihe, herweha di warê tarîx, zanîna tarîx, zimanê neteweyî, kultur, folklor û gelek şeweyên din de xwe nîşan dide. Di tunekirina şûra millî ya kurdan de û di warê tesîrîştina bi awayê fikrî û siyasatkirîne tesîra politikaya tirkan xwe di hemî waran de nîşan dide. Wîsa lê hatiye ku mirov bi rehetî nikare bêje ku kurd jibo xwe bûne netewe. Çawa ku çînek bi hebûna xwe tenê nagêheje dereceya zanîna berjewendiyên xwe ango jibona xwe nabe çînek siyasî, neteweyek jî tenê bi hebûna xwe ya demografîk-gel jibo xwe nabe netewe. Jibo xwe mîletbûyîna perspektîfên siyasî yên neteweyî divê; kar û xebata perspektîfa neteweyî li ser esasê netewebûnê divê. Bergeheke felsefî jibo xwe xebatê diyê. Berê ku guherînen civakî pêk bihên gelek guherînen an perspektîfên millî di mejî û mentalîteya takekesên kurdan de divê pêkbihên...

Nimûneyek

Ez dixwazim vê yeka hanê bi nimûneyeke balkêş destnîşan bikim. Ji vir çendeye-

kî berê hin rojnamavanên F. ansayî bi serrokkomarê Turkiyeyê re heypeyînek çêkirin. Ji S. Demîrel hate pîrsîn jibo çî rê nadin ku dibistanên kurdan hebin û perwerdekirina kurdan bi zimanê wan be? Demîrel pîrr eşkere got ku ew difikirin ku eger perwerdekirin bi kurdî be ev yeka dê bibe hoyê parçekirina Turkiyeyê. CT ji kurdên çekdar natirse û nabêje dê Turkiye parçe bibe, lê ji zimanê kurdî, perwerdekirina bi zimanê kurdî û dibistanên kurdî ditirse. Ji tecrubeyên xwe yên tarîxî baş ders wergirtine ji lewra dizanin rêya xurtbûn û rizgariya gelê kurd li ser kîjan bingehê ye. Di vê çerçeweyê de eger mirov li rewşa rewşenbîrên kurdan feke çî mixabin helwesteke ku bi gorî rewşa civatê pêwîst e xuya nabe.**

Mimkun e hin kes bêjin ev hemî jî rewşa welatê me ya dijwar û bindestiya me dihê. Helbet ev nuqteyên girîng in û li ber çav dihên girtin. Lê ev nabin sebeb ku em her kêmasî û xeletiyên xwe tîxin stuyê rewşa xwe ya nebaş an dijminên xwe. Wek dihê gotin politîka ji îmkanan îstifadekirin û bikaranîna îmkanan e. Ji ber vê yekê divê ewil mirov li xeletî, kêmasî û çewtiyên xwe hûr bibe; zêfiyên xwe bibîne û jibo dînamîzekirina tevgera siyasî û civakî bi şeweyek gelemperî û bi taybetî jibo peydakirin an jî geşkirina alternatîfên cuda hewl bide, ferd û fikrên cuda li ser esasê pluralîzmê xurt bike, rê û şeweyên bihêzbûnê jibo alternatîfên demokratîk bibîne, civatê jî tengasiya "rastiyên ebedî" û siyaseta totalîter bîdûrbîxîne...

Rola îdeolojîyên cuda

Ez dixwazim li ser hin aliyên ve yekê, ango li ser rola îdeolojîyên çep yên inqîlabî yên ku ji tradîsyona sosyalîstî tînin û herweha li ser perwerdekirina neteweyî û konsensusa millî rawestim.

Bi giştî çep, çepên inqîlabî ("darbecî"):

Rêxistinên Kurdîstana Turkiyeyê di salên 70-î de geş bûn û hatin damezrandin. Yên di salên 70-î de hatin damezrandin bê îstîsna hemî çep bûn. Her çûre -îzm li cem me peyda dibû. Pîrsa sereke jî wan rêxistinên re tîkoşîna çîneyetî bû. Propaganda hemî li ser ve bingehê hatibûn avakirin. Her rêxistinekê xwe rêberê civatê û neteweyê didit. Yên mayî heya derêkê hevrêyên wan bûn lê li ser rêya çewt bûn. Divê ew jî bi ve an wê şeweyê paşê bihatana helkirin. Li vir tiştê ku ez dixwazim diyar bikim ev e: Ango him bîr û ray û him jî di çerçeweya xebata siyasî ya wan rêxistinên de projeya avakirina dewleteke millî li ser esasê lihevkerina(konsensusa) millî tunebû. Çî mixabin îro jî hin rêxistin hîn jî jî ve lihevkerîne ne hazîr in û dîrî ve yekê ne. Herweha ew rêxistinên salên 70-ê bi demokrasiyê ne bawer bûn û bi ser de jî demokrasiyê biçûk dihate dîtin; heta carina dibû hoyê hev îthamkirinê. Helbet ev yeka han problemeke girîng e, pênebawerîya demokrasiyê û kultura demokrasiyê û herwe-

ha piçûkdîtina civata organîzekirî di maneya civata sivil, ji kultura siyasî ya civata kurd re gelek gelşe û problem derxistinê û derdixê pêş.***

Wergirtina iktîdarê

Di warê şeweya tîkçîn û usûla wergirtina iktîdarê de hemî grûp kêm zêde wek hev difikirin û ev jî bi darê zorê, bi çek bidestxistina iktîdarê bû. Her rîxistinêkê jîbo wergirtina iktîdarê rêya şidetê wacib dîda nişankirin. Raya xelkê pîrskirin an bi rêya demokratîk û hîlbijartinan iktîdarwergirtin û guhestin jî xwe kesê behs jî nedikir. Fikrên welê fikrên bûrjûwazî bûn û divê bihatana mehkum kirin. Lê wek di hê zanin dewletên neteweyî li ser lihevkerina civakî, siyasî û bîngeheke fîreh hatine avakirin. Helbet pîrsa iktîdarê pîrseke girîng e û li temamê welatan politîka li ser vê bîngehê di hê meşandin, ango bidestxistina iktîdarê. Lê nuqteya girîng usûla bidestxistina, wergirtina iktîdarê ye. Herweha mîna ku di hê zanîn, civatên ku bi rêya aştî û konsensûsê li hev nekirine hertim gîrî nava şerê navxweyî bûne. Ev yeka han jî bûye sebebê bêtoleransî, hişkî û peydabûna birêvebirinê totalîter.

Partî û rîxistinên çep yê illegal, yê ku usûla tîkoşînê li ser bîngeheke şidetê ava dikin û ava kirine, endamên xwe bi propagandeyê hişk û teng perwerde kirine û perwerde dikin; rîxistina xwe wek pêşeng an stûna civatê diyar dikin, bi vê şeweyê xebat, propaganda û perwerdekirin bi zanîn an nezani tovên şerê navxweyî di hê avêtin.

Perwerdekirina siyasî

Herweha di hê zanîn, ji lewre ne hewce ye em dirêj li ser bîsekinin, lê nuqteyêkê û ferqiyeteke balkêş e; û bi pîrsa me ve tîkel e, ango li Kurdistana Tîrkiyeyê kurd li dibistanan jî bo asimilasyonê hatine û di hêne perwerdekirin û ji civata xwe ya jê hatî roj bi roj bi dîr dikevin. Ji ber ku perwerdekirina me kurdan ne li ser bîngeheke ku dezgehên dewletî û dezgeha malbatî li hev dikin, di roja ewil de nakokî di hişê wan de di hê çandin. Kurd ne bi şûra millî ya kurdan perwerde dibin bîlekis bi şûra tîrkîtiyê di hê perwerdekirin. Ev yeka han dibe sebebê lawazî û tînegêhiştina şûra millî ya kurdan û kurd jî vê hêlê ve ji peydakirina bîngeheke şûra millî ya li ser lihevkerinê bêpar dimînin. Heskirina welêt, heskirina alaya neteweyî, heskirin û xwedilêderketina zîmanê zîmkakî-neteweyî, heskirin û xwedilêderketina kultura neteweyî, zanîna tarîxê li nik wan nahête çandin û kamil kirin.

Vêca roja ku kurd rastê kurd, kurdayetî, îdeolojî, partî û hwd tî tu bîngeheke qewî nîne ku karibe tîştên nuh li ser ava bike. Li vir bêdewletbûn û ji dem û dezgehên neteweyî bêparbûn bi şeweyê pîr eşkere xwe diyar dike û ferqiyeta nava me û yê xwedî dem û dezgehên neteweyî an dewletbûyînê eşkere dike.

Di rewşêkê welê de gava partî an rîxistinên me mirovên wisa bi ruhê rîxistinî perwerde dikin, jî ber tengbûna perspektîfa partîyan ya ji neteweyê, ew kesana dibin partîzanên partîyên xwe, dibin ferdên partîyan, ango rîxistin cihê netewê digire. Ji lewre perwerdekirina li rîxistinan ne perwerdekirineke berfîreh e, ew perwerdekirineke hîyerarşîk e. Perwerdekirin an propagandayên rîxistinan li ser esasê dîsîplîne û hîyerarşiyê pêkdihên. Ev jî dibe sebeb ku her rîxistin xwe netewe

dibîne û îlan dike, eger ew ser kevin netewe ser dikeve an na jiyana netewê di xeterê de ye û divê asteng bi hê hilandin, ev jî dibe sebebê eslî yê şerê navxweyî. Lê em baş dizanin ku di rewşa îro de li hemî deveran çerçeweya neteweyê jî ya partî an rîxistinan pîr firehtir e û divê tu car partîyek cihê neteweyê negire û rîxistin an partîyek xwe neêxe şûna dewletê an dezgehên dewletê, ango demû dezgehên dewletê, dezgehên neteweyî divê cihê bin. Li dewlet an civatên ku karûbarê dewlet û rîxistinan jî hev cuda ne û tîkel hev nînin bi hîlbijartinan di hê ser iktîdarê û bi eynî rîyê dev ji iktîdarê berdin, him bi îstîkrar in him jî pîrs û pîrsîrêkên xwe bi tolerans û rêyê demokratîk çareser dikin. Li hêla din tîveliya karûbarên partîyan û dewletê, herweha yekpartîti, bi dîktatorî bi dawî di hê. Ev yeka han li gelek welatan bi tecrûbeyên xwînî, dijar û hişk eşkere bûye.

Ji ber van sebebên han mirov dikare bîje ku rîxistinên kurdan yê çepî çî mixabin helwesteke pêwîst negirtine û pêranebûne. Ew jî mînyê hevrêyên xwe yê welatên din totalîter û xwediyê perspektîfêkê teng bûne. Lihevkerina millî jî wan re nebûye prensîpeke esasî. Loma jî gava di berjewendiyê xwe -partîya xwe de nedîtine guh nedane der û dora xwe û rexneyan, her ya xwe gotine û kirine; û helwesteke welê pîrê caran bûye sebebê şerê navxweyî an jî gir û giriftên civakî. Herçiqas di gotin û propagandayên xwe de xwedî li demokrasi, helbijartinê giştî û plûralîzmê derdikevin jî lê di jîyanê de tu buhayê gotinê wan naxuyê. Bi xelkê, bi hîlbijartin, bi prosesa demokratîk bêtir bi çekên xwe û quwetên xwe bawer in û jî ber ku her fikra wan "rast" e û ew menfeeta xelkê jî xelkê baştir dizanin; carina an jî gava pêwîst be bi darên xwe civatê jî talîm dikin. Helbet jî wan bête pîrskirin yê herî demokrat ew in.**** Ji rîxistinên welê demokrasi û tîkiliyên demokratîk, herweha civateke demokratîk û sivil hêvîkirin xewn e, xewneke pûç û vala ye!

Civata kurd û demokrasi

Kurd bi herawayî û jî her aliyê ve mehkûmê tîkiliyên demokratîk û demokrasiyê ne. Ev mecbûriyet ne tenê ji rewşa civata kurd ya çînî û berjewendiyên bîferq û jîbo ewlekariya civatê pêwîst e. Herweha rewşa welatê kurdan ango perçebûna Kurdistanê û di her parçeyê de bi gorî rewşa wê an vê perçeyî tîkiliyên siyasî, civakî û aborî xwe bi şeweyê pîr eşkere berbiçav dikin. Ji hêla din em dizanin ku welat an jî dewletên ku Kurdistan di nav xwe de dabêş kirine ne civat û dewletên demokratîk in, heta mimkun e û mirov dikare bîje ku nuqteya herî zêf ya van dewletên dagirker rejîmek demokratîk e, tîrsa wan ya herî mezin ji demokrasiyê, jî ber pîrsîrêka kurd û Kurdistanê ye. Nuqteyêkê din ya girîng ev e: Ev nêzikê sed sal e ku kurd hewl didin, rîxistin û partîyên cûr be cûr dimezrînin. Wexta Osmaniyan de li Îstînbûlê, piştê ku Împeratoriya Osmanî tîk çû û C. Turkiye hat damezrandin li Turkiyeyê û derveyê Turkiyeyê kurdan komel û partîyên cuda ava kirin. Ev pêncî sal in ku li herçar parçeyên Kurdistanê partî di hê avakirin û kar û barên siyasî dikin. Wek di hê zanîn edî bi dehan partî û rîxistinên kurdan yê kêmhêz an bîhêz li meydana siyasî tîdikîşin. Ev hemî nîşana plûralîzmê, girîngî û hewcedariya wê ne.

Civatek ku di vê rewşê de ye û tabloye-

ke welê pêşkêş dike, eşkere ye ku neqebûlkirina tîkiliyên demokratîk û demokrasiyê, rê li tevlihevî û şerê navxwe vedike. Ji ber van hoyan jî herkesî bêtir divê kurd, siyasîmedarên kurd û berî pêş herkesî divê rewşenbîrên kurd li ser pîrsa demokrasiyê rawestin. Ji bo bicîhbûna tîkiliyên demokratîk û demokrasiyê divê dezgehên ragihandinê û kesên ronakbîr projektorên ronahiyê û rexnegirtinê jî ser siyasîmedaran û meydana siyasî bi dîr nexin. Tunekirina an jî qutkirina, qurmiçandina alternatîfên cûr bi cûr pêşî li rîzgariya gelê kurd venake. Ev diyar e. Ji lewre pêwîstiya gelê kurd bi alternatîfên cuda heye. Berjewendiyê civat û gelê kurd ne di sistemeke totalîter de ye, em hewceyê proseseke demokratîk in. Proseke ku civatê jî tengasî û gerîneka hizirkirin û siyasîkirina hin "aqilmendan" derbixîne. Civat û ferdên civatê bi xwe karibin beşdarê proseseke wisa bibin da ku xwedî li pîrs û pîrsîrêkên xwe bi şeweyê azad derkevin û çareser bikin. Bêtir tolerans, plûralîzm, munaqêşe û ronahî.

Şerê navxweyî

Eger em bînin û li ser şerê navxweyî yê îroyîn rawestin em dê bibînin ku di eslê xwe de sebebê şer her ev mentalîta hanê ye. Ya ku bi xelkê, bi demokrasiyê, bi helbijartinê, bi plûralîzmê ne bawer e. Lewra mirov nikare yê ku bi van prensîban bawer e û hurmet dike û yê ku nakin tîxe tîrêkî û mehkûm bike. Mehkûmkirineke welê rê li pêşiya helkirina pîrs û pîrsîrêkan aloztir dike. Di hin waran de bêprensîpî tevlihevî û anarşîzmê dixuliqîne. Ji lewre bîalîti di eslê xwe de layengirtina kes û hêzên ne demokratîk û şerxwazan e!. Divê bersîva xwestina hîlbijartinê giştî, ne dagirkirin, girtin û bêfonksiyonhiştina parlamentoya ku bi dengên sedhezaran hatiye pê be. Eşkere ye ku yê dijî xurtkirina tîkiliyên demokratîk in her daxwaza wan e ku hemî teref bî sîcdar kirin û mehkûmkirin, da ku siyaseta wan ya dij demokrasi û konsensusa millî eşkere nebe!.

Ji ber vê yekê di eslê xwe de her mirovek teref e, ango terefê aştî, lihevkerina millî, civateke plûralîst, demokrasi, helbijartinê giştî û hwd ye; an jî dijî van prensîban e. Libêjîngxistina herkesî bi hev re zêde tîştêkî îfade nake, helwestekî ne aştîxwaz û demokratîk e. Herweha berjewendiyên giştî yê civata kurd ne di helwestekê wisa de ne.

Demokrasi û ferd

Herçî pîrsa demokrasiyê ye divê em bi xwe jî mîna gelek gelên din yê ku di nav tîkiliyên demokratîk de dijîn û sistema wan ya birêvebirinê li ser bîngehê demokrasiyê ye, dem û dezgehên dewletî û hiqûkî bi gorî prensîpên navneteweyî ne, pîrsa demokrasiyê wisa tîbigêhin û xwe jî îdeolojî û rejîmên ne demokratîk yê totalîter û dîktator biparêzin.

Jîbo civatek demokratîk û rejîma demokrasiyê ferdên azad divê. Ferdê azad kesê ku di zanîna mafên xwe de ye û herweha heq û hiqûkê xwe bi kar di hêne, ango ne kesekî pasîv e. Hebûn, xurtbûn û herweha berdewamiya demokrasi û civateke demokratîk bi van şert û mercan ve girêdayî ye. Civak an kolektîvîte divê nebe sedemê pelixandina ferdan, di xuyayîna civatê de forma civatê divê weke kolektîvîteyêkê parçeyî bîhête qebûlkirin. Ji sistemeke demokratîk û plûralîst re hebûna civateke dînamîk -ango ku ferdên

civakê ne reaya ne, azad û xwedî bîr û ray in- divê.

Em kurd jîbo ewleyî û dahatuya gelê xwe û kamilkirina neteweya xwe mehkûmê demokrasiyê ne, an em dê xwedî li demokrasi û tîkiliyên demokratîk derkevin û jîbo xurtkirina wan kar bikin, an jî wek gelek gelên din gîrî nav nakokî, tevlihevî û şerê navxweyî bibin û rêya rîzgariyê û azadiya gelê xwe tarî û dijar-tir bikin.

Demokrasi, kulturek pîrralî û bireng, organîzekirina civata sivil û konsensusa neteweyî, dikare jîbo çareserkirina pîrs û pîrsîrêkên navxweyî bibe rêveker. Herweha di qada nawneteweyî de rûmeteke mezin bide tevgera kurd.

* Celadet Bedirxan di kovara Hawarê, hejmar 27-an de li ser pîrsa zîman, fêrbûn û nivîsina bi zîmanê kurdî weha dinivîse:

"Belê, ew bi zmanê xwe e mader, xwendin û nivîsandinê ni zanin. Ew zîmanê ku xwendin û nivîsandina wî, ji her zmanî hêsantir e. Min bi xwe ceribandîye, kurdekî nezani, li gora şehrariya xwe, di wextekî gelek kurt de, hîni elfabeya xwe dibe; jî pênc bi heta sih rojî.

Malxirabno! Ma we ewçend wext nîne, hûn ku ji bo hînbûna zmanên biyanîyan bi salan ve xebitîne û îro jî dixebitin, ji bona ku bikarin "fîfonêke" derewin bi lîv bikin.

Kuro eyb e şerm e, fehî e. An hîni zmanê xwe bibin, an mebejin em kurd in. Bê zman kurdîti jî we re ne tu rûmet e, jî me re rûşîke giran e."

** Rewşenbîrê kurd Ehmedê Xanî di vî warî de nîmîneyekî balkêş e; wî di sedsala 17-an de fikrên xwe pêşkêşî gelê xwe kirine û bi fikrên xwe tesîrek mezin li ser kurdan him rasterast, him bi şirovekirina fikir û berhemên xwe, him jî di nav xwende, zana û meleyen de geşbûnek peyda kiriye û bûye sebebê gelek caran tekrarkirina vejandina hestên neteweyî di nav civata kurdan de.

*** Eger demokrasiya siyasî mîna sistemek civakî û birêvebirinî bîhête şirovekirin wê gavê bivê nevê me hewceyê hin prensîpan dike.

- Azadiya fikir, bawerî û çapemeniyê,
- Plûralîzmeke siyasî,
- Helbijartinê giştî,
- Deletoke ku li ser esasê hiqûkê kar û barên xwe dimeşîne,
- Dem û dezgehên dewleteke demokratîk,
- Civateke sivil û rîxistinê welê,
- Bi cîhbûna tîkiliyên hemwelatîyê (medborgare), ferdên azad,
- Dem û dezgehên çapemeniyê ku azad in, rola xwe ya lêgerîn û berjewendiyê ferd û gel diparêzin,

Li gel van nuqteyan divê bête gotin ku civatek demokratîk û bî hêz ne tenê li ser kaxiz bi cîhkirina hin yasa û prensîban ne. Di civateke demokratîk de ferd(takekes) û civat di rewşêkê cihê de xuya dibin, ango ferd di nav civat de ne wînda ye. Civatên ku jî ferdên azad û herweha ferdên ku di zanîna heq û huqûqên xwe de ne pêk di hê her xurtir in. Demokratbûn ne tenê ew e ku mirov xwediyê mafên însanî be, herweha bikaranîna wan mafan jî parçeyekî demokratbûnê ye. Herçiqas ne hewce ye mirov bîje jî, demokrasi nayête wê maneyê ku pîrs û pîrsîrêkên civatê bi hebûna demokrasiyê jî ber xwe ve di hê çareserkirin; lê belê di çareserkirina problemên de sistemen herî kêm bi kêşe û însanî rejîmên demokratîk in. Li gel demokrasiya siyasî, di warê aborî de demokratîzekirina şert û tîkiliyan li ser esasê wekhewî di nav civatê de, xaleke girîng e û li hemî deran di munaqêşekirina vê pîrsê de, cîheke girîng digre.

**** Gotineke pêşiyên kurdan heye, dibêjin "Jûjî serê xwe di pîrça xwe dide, dibê; "ox çî nerm e."

PENCERE

Marguerite Duras*

1914 -1996

21'ê Çiriya Pêşîn, danê êvarê, li kolana Sant Binwa.

Jan Andirya: -Tu yê çî li ser xwe bibêji?

- Marguerite Duras - Duras

- Tu yê çî li ser min bibêji?

- Naskirina te pir çetin e.

Piştî wê, demek kurt, di wê êvarê bi xwe de.

Di piraniya wextan de valahiya xwe hest dikim. Nasnameya min nîn e. Di despekê de ditirsyam, pişt re di xweşiyê re dibuhire. Piştî wê radiweste.

Xweşî hema hema wek mirinê ye. Cihêkî pir dûrî vî cihê ku ez jê dipeyivim.

22'ê Çiriya Pêşîn, danê êvarê, li kolana Sant Bênwê.

- Tu ji mirinê ditirsi?

- Nizanim. Nizanim ez dê çawan bersiva te bidim. Ji wexta ku ez gihiştîme deryayê hema hema ez ti tiştî nizanim.

- Û bi min re?

Berê û anîha jî evîn di navbera me de ye. Mirin û evîn. Tiştî ku tu bixwazî dê bibe.

- Tu çawan dizanî?

- Di vê kêlikê de ez ne ti tiştî im. Ez bi xwe nizanim çî dinivîsinim.

- Tu baştirîn pirtûkên xwe kîjanê dibînî?

- "Çeper". Zaroktî.

- Cihê te bihuşt e.

- Min nekenîn?

- Çima?

- Nizanim. Bawer nakim.

- Piştî mirinê çî heye?

- Hiç. Tenê yên jîndar dê bibişirin û bînin bîra xwe.

- Dê kî te bîne bîra xwe?

- Xwendevanên gênc, û yên ciwan. zarokên piçûk.

- Anîha tu çî dikî?

- Berhemeke tirajedî ku dihingive hemî jiyana min dinivîsinim. Di wê berheme de bêyî berxwedan binavdibim.

Piştî wê, demek kurt, di wê êvarê bi xwe de.

- Dê navê pirtûka te çî be?

- Pirtûka ber bi nemanê de çûyîn.

14'ê Oktober 1994

14'ê Oktober 1914. Ev navnişan tenê li cem nivîskar xwedan wate ye.

Ti tiştî napeyive. tenê ev e. Pêşgotin. Bingeh.

15'ê Oktober...

Nimûneyek li ba min nîn e. Li dijî radestbûnê. Dema ku dinivîsinim heman şêtbûna jiyane min dilivîne.

Wexta ku kevîrên "Çeperê" dinivîsinim, vedigerim û pêrgî kevîran dibim.

Şemî 10'ê Kanûna Pêşîn. kat sisê, kolana Sant Bînwa!

Hemî maf ber bi tenhatiyê ve diçin. Ez na. Pirtûkên min hene.

Bêdengî û pişt re..

Windabûna xwe hest dikim. Wek miriyekê. Tiştêkî tirsnaq e. Naxwazim ti tiştî bikim. Di ti tiştî de naramim. Dawiya her tiştî hat. Dawiya te jî. Ez bi tenha me.

Bêdengî û pişt re.

Tiştî ku tu dijî ne firtone ye, ber bi nemanê de çûyîne. Tiştî ku tu dijî ne firtone ye, ber bi nemanêdeçûyîne.

10'ê Sibatê

Têkçûna derewan. Her tişt vala ye û bi peyketina bagerê ye. Hemî wêjeya cihanê ji van herdû hevokan pêktê. Têkçûna derewan, erê, ev herdû hevok bi serê xwe cihanê vedikin: lêbelê hemî tiştî; bager; pevçûna zarokan; hetava mirî, diqîrin. Cihan ber bi çarenûsa xwe de; kutayiya xwe xwe de, diçe. Têkçûna derewan e, her tişt derew û vala ye, bi peyketina bagerê jî bêhûde ye.

3'yê Adarê

Ez bi xwe bi peyketina bagerê me.

Şemiya pîroz.

Her tiştî ku nêzik dibe dibînim. Ez ditirsim. Wer, wer bi min re, bilezî û zû vevê.

Pişt re, heman êvar.

De hela em tirsnaqiyê; mirinê, bibînin.

13'ê Nisanê.

Min li seranserî jiyana xwe mîna perçeyek ewr dinivîsand. Min tenê ev tişt kir. Ne ti tişt e ku tu ji bilî vêya nekî. Ti carî min xwe paye nedikir. Jiyana min nivîsandin bû, hînbûna nivîsandinê bû.

Lê dê me ji ti tiştî rizgar neke.

* Ev nivîsa wî ya dawî ye. Berê mirina xwe nivîsandiye

DANASÎNA PIRTÛKAN

amadekar: EMÎN NAROZÎ

Kurê Zinarê Serbilind

Sidqî Hirorî

Nûdem

Stockholm

1996

KURÊ ZINARÊ
SERBILIND

Sidqî Hirorî



rên Berhemên Kurmancî yên ta niha derkefi, navçeyî ye. Hem di şeweyê tewang û bilêvkirinê de û hem jî di di warê rastnivîsin û rêzimanî de mirov pêrgî cudahiye tê.

Çendî ku nivîser di serê pirtûkê de bûyeran ji devê yekî yan wek bîr û hizrên lehengên romanê dide jî lê gava pê ve diçe diyar dibe ku sereklehengê romanê ew bi xwe ye û bûyer jî yên ku bi serê wî ve hatine. Hirorî di nav van bîranî û serpehatiyên xwe de gellek agahdarî ji tevgera çekdarî ya başûr dide û hem bi şiroveyên xwe û hem jî bi bîr û hizrên rolgiran wan dewlemend dike.

Berhemên wî ên din ev in:

Dimenek ji Çiroka Jiyana min (1985, çirok),

Çend Hozaneka Ne Navkiri (1986, helbest),

Momikêka Ne Vemirî (1986, çirok),

Qereç û Dilber (1989, helbest).


The Modern History of the Kurds

David McDowall

I. B. Tauris & Co Ltd

Londra - Ingiltere

1996



ew li ser rewşa eşîr û rewşa etnikî ya komara Mahabadê û tevgera neteweyî ya perçeyê Îranê jî radiweste û tê heyanî ser komara Şî'îya Îslamî ya Îranê.

McDowall nivê paşî yê kitêba xwe ji bo tevgerên rizgarixwaz ên her sê perçeyên Kurdistanê veqetandiye û heryek ji wan di beşekê de bi awayekî berfireh bi cî kiriye. Ew, tekoşîna herbeşî li gor rewş û xuyên wan ên cihê bi peywendî û pirsgerêkên wan ên sereke ve tîne pêşberî çavên xwendevanan. Di dawiya herbeşekê de jî ew gellek jêrenot û çavkaniyên giranbiha dide. Berhemên David McDowall ev in:

1. The Lebanon: A Conflict of Minorities (1986)

2. Palestine and Israel: The Uprising and Beyond (1989)

3. The Kurds: A Nation Denied (1992)

4. Europa and the Arabs: Dicoord or Symbiosis (1992)

5. The Palestinians: The Road to Nationhood (1994)

Kurder

John King

Natur och Kultur

Stockholm

1993

Kurder



Sidqî Hirorî ev kitêb bi niyeta romanekê lê hê bêhtir di formê bîranînan de nivîsandiye. Kitêb bi xwe li ser tevgera azadixwazî çekdar a gelê Kurd li başûrê Kurdistanê ye û giraniya wê li ser kirêti û gemariya kirênin dijmin û dijrawestina pêşmergeyan li hember wan kirinên dagerkiran e. Di berhemê de gellek salox ji hestên neteweyî û gelêrî tîne dayîn û peywendiyên pêşmerge û şervanên Kurdan bi civaka wan re li ber çavên xwendevanan tîne raxistin. Bi vê re nivîskar hem hewlerihiya çekdaran diyar dike û hem jî digel baweriya wan bi aştî û azadiyê lê ji bo bidestxistina vê yekê jî çalakî û şervaniya Kurdan ku dijminiya neyaran ji holê radike, derdixe meydanê.

Herweha ew li ser zulm û zora leşker û polîsên dagerkiran yên pîr xeddar jî radiweste û dide nişandan bê ev yek çawa kî û xezebê dixê dilê gelê Kurd û dijminiya nav gelan kûr û dûr dike. Bi vê re ew talan û tajankirinên dagerkiran, kambaxî û malwêrankirinên wan ku di jiyana gelên bindest de ruxandin û bêşexsiyetyî peyda dikin, bi awayekî zelal radixe pêş çavên xwendevanan. Ew, rewşa keç û xortên neteweyekî bindest di wî halê malkambaxî û malwêraniyê de ramî dide û digel germî û berfirehiya hissên neteweyî wê rûxandina rûhî jî qenc bi rê û zê dike. Zimanê pirtûkê mîna pîr-

Ev berhema heja ku li ser tarîxa Kurdan bi berfirehî radiweste jî aliyê David McDowall ve bi Îngilîzî hatiye nivîsandin.

McDowall piştî pêşgotin û çend xeriteyên cuda li ser Kurd û Kurdistanê bi nasnameya Kurdan û agahdariyên li ser rewşa wan a civakî dest bi kitêba xwe dike. Di vir de ew bi kurtî li ser peywendiyên Kurd û Osmanîyan, yên Kurd û Sefewîyan û yên wan û Qeceriyan radiweste; ew hejmara gelê Kurd, welatê wan û deverên ku ew lê belabûne digel ziman, ol (dîn), civak û çanda wan giş bi xwendevanên xwe dide nasîn.

Beşa 3 û 4'an jî li ser rewşa Kurdan a 1800'î û vir ve di nav Împeratoriya Osmanî de, ye. Di dîv re ew tê ser peywendiyên Kurd û Qeceriyan Îranê û rewşa neteweyî û a serihildanên Kurdan ên di salên Cenga Cihanê ya Pêşî (1908-1918) de.

Beşa 7'an jî li ser perçekirina Împaratoriya Osmanî û parêvekirina Kurdistanê ye. Di vir de ew li ser lihevhatinên Sewr (Sèvres) û Lozanê (Lausanne) û doza Mûsilê radiweste û pê ve diçe heyanî ser gelşên navbera Kurd, Îngilîz û Ereban li Iraqê û serihildan û tevgerên başûrê Kurdistanê. Ji wir ew derbasî ser serihildan û tevgerên bakurê Kurdistanê dibe û li ser wê pêlê û rewşa Kurdên rojhilat agahdarî dide. Herweha

Ev kitêb di sala 1993'an de ji aliyê John King ve hatiye nivîsin û di eynî salê de Ulrika Jakobson ew wergerandiye zimanê Swêdî. Pirtûk hima di wê salê de jî ji aliyê weşanxaneya Natûr och Kultur ve li Stockholmê derketiye.

Çendî ku kitêb kurt e jî lê gellek agahdariyên heja digel resm û wêneyên spehî tîne de hene. Berhem bi hinek agahdariyên kin ên li ser dîrok û eslê Kurdan dest pê dike û bi xeriteya Kurdistanê digel wêneyek ji dimena qirkirina Helbçeyê û bûyerên piştî şerê Qiliçê (Kendavê) didomîne. Herweha ew li ser jiyana Kurdan, li ser hîwuş (edet) û çanda wan a herêmên cihê û ya wanên ku li metropolên dagerkir dimînin, radiweste.

Di beşa mêjû û siyasetê de ew jiyana Kurdan a bi leşkerê desthilatdaran re û êrişên wan tîne zimên. Herweha ew tê de listeyeke rojên tarîxî ku di jiyana Kurdan de girîng in jî dide û tekoşîna herçar perçeyên Kurdistanê digel rêza rêxistinên wan bi awayekî quutt (kurt) dide xwende-

vanên xwe.

Di vê berhemê de gellek teswîr û wêneyên heja û spehî ji tekoşîna gelê Kurd û ji şer, çalakî û lehengiyên pêşmergeyan hatine dayîn. Resmê keçeke Kurd tevî kelaşînkofekê, rûpelê pêşî yê vê kitêba piçûk î naverokxurt dixemilîne.

Nivîserê Berhemê John King ku rojnamevanekî bi tecrûbe ye berê li nav dewletên Ereban jî bo BBC'yê xebitiye lê niha ew wek nivîsevanekî serbixwe karê xwe dike û dinivîsîne.

Mirî bi rê ve diçe!

Tawana wî nayêt bexşandin û cizayê wî nayêt ji bîr kirin!

ARIF ZÊREVAN

Ehmedo ronî
heyran tu ne mîr î ne hakim î

Filmê Tim Robbinsî "Dead man walking" ji destpêkê ta dawiyê bi mûzîka kurdî, bi melodiya strana kurdî "Ehmedo ronî" hatiye kompone kirin. Birayê rejîsorî David Robbins û Nusrat Fateh Ali Khanî mûzîka filmî çêkirî ne. Ji ber çî wan ev mûzîk ji vî filmî re bijartine ez nizanim.

Di naveroka filmî û strana kurdî de jî hevpişkiyek berbiçav nîn e: yek li ser idamê ye ya di li ser evînê ye. Heger hevpişkiyek hebe jî di evîna Besnayê ya ji bo Ehmedî û dilovaniya Helenê ya ji bo kujdar Matthew Poncelêtî de ye. Besna sing û berê xwe ji Ehmedî re dike koşk û sera û Helen jî bi dilovaniya xwe lê dixebite ku giyanê kujdarekî aram bike.

Dergevanek diqêre: "Mirî bi rê ve diçe!" Mirî mirovek e ku bi tawana tecawûz- û kuştina kur û keçekê hatiye tawanbar kirin û rihê wî dê bi şerengiyên mirinê bêt standin.

Ev film minaqeşeyê li ser kuştina mirovan bi destê dewletê dike. Li gor statistîkên heyî ji sedê 70-80-yê amerîkiyan piştgirên idamê ne. Film bi awayekî pir aşkere mentalîteya tolê li cem civata emerîkî nîşan dide.

Di eslê xwe de hemî mirov bi awayekî tolperest in, lê belê idama bi destê dewletê kevartirîn û qirêjtirîn formê tolê ye. Heger dewlet bi xwe jiyana hemwelatîyên xwe bi zorê jê bistîne, hingê dê hemwelatî çawa bifikirin ku şidet şidetê diafirîne û xwe ji toleke holê hovane paşgav bikin.

Wekî hiqûqî qisas ji kevin de heye. Di qanûnên Hammurabiî de jî qisas heye û ew mîras derbasî cihûtî, xiristyanî û islamê bûye: yê ku çavê yekî derbiêxe divêt çavê wî bêt derêxistin, yê ku destê yekî jê bike divêt destê wî bêt jêkirin, yê ku yekî bikuje divêt bêt kuştin û herwiha.

Film li gor kitêba rahîbe Helen Prejeanê, ku bi eynî navî ye, hatiye çêkirin. Di kitêbê û filmî de Helen Prejean behsa rola xwe ya aramkirina giyanê du kesên ku dê bîn idam kirin dike. Aktor û rejîsorê emerîkî Tim Robbinsî di senaryoya xwe de bi hostatî jiyana wan herdu kesên û bûyerên ku li dor jiyana wan diqewimin di jiyana kesekî de stihane. Sean Penn (Matthew Poncelêtî) û Susan Sarandon (Helen) bi lehîstineke dahiyane rolên xwe dilehîzin û mirovî rûbirûyê sîc û cezayî, guneh û bexşanê û endîrek jî rûbirûyê civateke berbi rûxanê dikin.

Xweseriyêke filmî jî ew e ku film ne tenê li ser idamê wekî kiriyareke exlaqî radiweste. Film bi xwînsarî û kûrahî li ser şidetê radiweste: hem şideta bi destê kesên û hem jî ya bi destê dewletê. "Dead man walking" encamên şidetê ji bo qurbanî, mirovên qurbanî, karmendên zindanê, tawankarî û civatê - yanî me hemiyar - diyar dike.

Di filmî de Matthew Poncelêtî, yanî kujdar, ji canawariyê derdiqewîne û dibe mirovek, herçend mirovekî xwîntehl û nijadpe-

rest jî be. Ev guherîna di kesayetiya kujdarî de çêdibe di destpêka filmî de nayêt dîtin. Di destpêkê de kujdariya Matthew Poncelêtî jî di gumanê de ye, mirov bi xwe jî di şikê de ye ka wî ew tawan kiriye an no. Mirov dibêje qey hevalê wî kujdar e lê li dadgehê tawan li ser wî maye.

Bi arîkariya rahîbe Helenê hingî ku film ber bi pêş de diçe mirov pirtir fêhm dike ku Matthew Poncelêtî tawankar e. Rola Helenê roleke giran e, ji ber ev cara ewil e ku ew arîkariya kujdarekî dike ku dê piştî çend rojekê bêt idam kirin. Helen jî aliyekî ve lê dixebite ku giyanê Matthewî aram bike û ji aliyekî di ve lê dixebite ku Matthew li tawankariya xwe mikur bêt.

Piştî ku hemî daxwaznameyên bexşên red kirin, rahîbe bi hemî qeweta xwe lê dixebite ku kujdar dergehekî ji aramiya giyanê xwe re bibîne. Bi nêrîna keşeyên zindanan giyanê tawankarî aram dibe heger ew "Inçilê" qebûl bike. Lê belê rahîbe di bersivê de dibêje ku erka wê ne meseleya baweriyê ye. Karê wê karekî giran e di proseya idamkirina mirovekî de; proseya aramiya giyanî û lixwemikurhatinê.

"Dead man walking" çîrokek e ku temaşevan divêt bi ronakbîriya xwe tevli wê bibe. Tim Robbins dêubabên wan ciwanên ku Poncelêtî kuştine tîne û tevli proseya di filmî de dike. Rejîsor şîn û hîleta dêubaban û hişkiya wan li hemberî rahîbeyê nîşan dide. Dêubab naxwazin rola rahîbeyê qebûl bikin û rahîbe jî naxwaze hişkiya dêubaban qebûl bike.

"Dead man walking" ne tenê filmeke eksîstensiyel e ku ji realîteyên jiyana rojana ya civakê xwe vede. Ew, bédadiya civakê emerîkayî û newekheviya li hember qanûnê radixe ber çavan: divêt tu dewlemend bi ta ku qanûn piştgiriya te bikin. Piranî kesên feqîr û zencî bi cizayê idamê tawankar kirin. Herwiha kesên siyasî jî ji tirsê windakirina dangan piştgiriya van metodên hişk dikin û bi vî awayî dibin arîkarê afirandina dirûvên şîzofren li nik civata emerîkî. Ji xwe nîvsaeta dawiyê ya filmî li ser şideta bêperwa ya dewletê ye. Metoda idamkirina bi şerengiyên jehrê delîlê herî xurt yê hovîtiya mirovî ye.

Wekî temaşevan divêt mirov kar bike ku hemî aliyan fêhm bike. Gelo divêt mirov çiqasê ji kesên di hez bike? Gelo dêubabîne ku zarokeke xwe wîndakirîna dê çawa kujdarê bedena xwe bixêşînin? Gelo mafê civatê û dewletê jî heye ku tolvedaneke wiha li hember hemwelatîyên xwe bi kar bîne? Gelo em bi xwe dê çî bifikirin heger ku em tawaneke wiha bikin û rûbirûyê sizayeke wiha giran bibin?

Sehneyên dawiyê yên filmî bi idamkirinê û nîşandayîna tawankariya Matthew Poncelêtî xelas dibin. Rejîsorî nîşandayîna ka Poncelêtî û hevalê xwe çawa ew keç û kur kuştine hêlaye dawîya filmî û ew sekwen-sên filmî bi sekwen-sên idamkirinê re mîks kirine. Mirov geh li tawana tawankerî difikire û geh li idamkirina wî ya hovane difikire. Ji lewra ye ku di afîşa filmî de nivîsî ne: "Tawana wî nayêt bexşandin û cizayê wî nayêt ji bîr kirin!"

Ez silavek biçûk didim Ahmed Husênî

ZINARÊ XAMO

Ahmed, tu zanî, wê rojê piştî karagava ez çûm mal, min dît ku wate Armanc (Adar 96) hatiye. Ji xwe ev çendak bû min bihîstibû ku Armanc derketiye. Min rahişt wê û çend mek-tûbên din (ku giş ji neqam û dezgeyên Swêdî hatibûn) û çûm mutpaxê, min xwe berra ser kursiyê da. Herçî mek-tûbên Swêdî ne meriv ji zirfên wan tê derdixê ku ji ku hatine û di hundurê wan de kaxetên kîjan deynî hene. Lema jî gelek caran ez wan venakim, didim ser hev, dihêlim serê mehê; serê mehê gişan bi hev re vedikim. Wê rojê jî tu sebeb tunebû ku ez vê rutîna xwe xera bikim. Min yê swêdî dan alîkî...

Û ez ji birayê xwe re bibêjim, min Armanc ji zirfa wê ya spî derxist û bê-yî ku bi meraqa yekî ku demekê di karê rojnamevaniyê geriyabe bala xwe bidim rûpelan, ya jî di sernivîsan de li çewtiyên zimên bigerim, hema raste rast çûm rûpela yanzdan, yanî rûpela şîra te tê de. Wek min di destpêkê de jî got, min bihîstibû Armanc hatiye û şîreke te jî tê de ye; hevalekî ew xwendibû û ji min re qal kiribû. Lema jî berî ku ez wê bibînim, min dizanibû ku di vê hejmarê de şîreke te heye. Û vê yekê jî meraqa min zêde dikir. Ev bîrî û meraqa min ji bo şîrê bû: Gelo ewê şîreke çawa be? Gelo ewê ji şîrên wî yê berê baştir be ya jî xerabtir be?

Berî ku ez dest bi xwendina "Newroza te pîroz be!" bikim, nizanim çima û jibo çî, lê hema bi min re hisekî wiha hebû ku ezê şîreke xweşik û nazenîn bixwînim û ezê haz û lezeteke estetîk jê bigrim. Ewê di vê bîstîkê de dilê min şad û bîna min fireh bike, ewê westana heyst seet kar ji ser laşê minî ji taqet de ketî rake û zindiya xortekî hijde salî bide min. Ji bo carekê be jî ewê wek qedeheke şerbeta cemidî şîrînî û lezîziya Kurdî bide dilê minê tî û tîna wî bişkîne. Ezê bi çavên serê xwe bibînim ku meriv dikane ji şîreke Kurdî jî ta'm û lezeteke bigre û bixwaze careke din jî wê bixwîne.

Welhasil, bi hisekî wiha, bi kêfxweşiyêke wek ku meriv tiştêkî xwe yê pîr bi qîmet wenda kiribe û rojekê bêhemdî lê rast were, min dest bi xwendinê kir. Esas hisê meriv kêman caran meriv dixapîne. Hetta di texmîna xweşikî û nexweşikiya şîrekê de jî efendî munecîm e. Û ev rastî îcar jî testîq bû, hisên min rast his kiribûn. Newroza te pîroz be!, lezeteke ku min ji zû de bîriya wê kiribû da min. Min di yek bîne de ew xwend. Û ez cardin lê vegeyîyam. Û cardin lê vegeyîyam. Bê mubalaxa, di wê bîstîkê de min xwest ku ew hinekî din jî dirêj buya, wiha zû neqediya. Çimkî tiştê di dilê min de, tiştê di serê min de yanî tiştê ku ez difikirim û min dixwest bi gotinê jî dilê xwe, ji serê xwe derxista û rehet bikira, te bi hawakî li gor dilê min û ji min gelekî xweşiktir gotibû. Hinek dikanin vê tercuma hisên min wek pesindaneke basît qebûl bikin û bibêjin, hisên li ser dost û hevalan ne

meqbûl in. Ya din jî, li ba me Kurdan pîr ne normal e ku meriv rabe di saxiya hev de hev û du teqdîr bike û pesnê berhemên hev bide. Bi pîranî em vî karî dihêlin piştî mirina hev. Axir, kî çî navî lê dike bila lê ke, ez îro çî his dikim, dixwazim wan hisên xwe îro bînim zimên, ne piştî pêncî salên din. Ya din jî tu garantiya min tune ye ku ezê ji te bêtir bijîm.

Esas wek însan ez ne îsanekî hesûd û dilbijok im. Heta ez dikanim bibêjim ku di gelek warî de ez merivekî dilfire û comerd im. Lê aliyê min yê zeif, wek li hember her tiştê xweşik, li hember şîra xweşik, li hember gotina xweşik jî ez pîr dilbijok im. Gava ez peyv û şîreke xweş hatibe gotin dibînim, dibihîzim, li aliyekî jê kêf û zewqeke mezin digrim, ji eşqê gurûzî digre dilê min, lê li aliyê din jî hesûdiyeke mezin xwe berra hinavê min dide, ez dibêjim çima min ev gotin negotiye, ev şîr nenivîsandiye! Piştî ku min "Newroza te pîroz be!" xwend jî ev hesûdî bi min re çê bû. Min ji xwe re got, hema li ku zirav e bira di wir de biqete û min dest pê kir:

Ji ber ku êvara dehê Nîsanê/ te dilê minî xemgîn şa kir/ ji ber ku te hêz da min/ û şewqeke mezin bi min re peyda kir/ ji ber ku te Memê ji nuh ve evîndar kir/ ji ber ku te Zînê ji serqotiyê xelas kir/ Newroza te jî pîroz be!

Lê min bala xwe dayê, na, şîrnivî-
Lsandin wek çêkirina hêkerûnê ne hêsa ye. Û min biryara xwe da, dunya xera bibe jî ez nabim şair.

Sal baş nayê bîra min, lê cara pêşî min şîra te ya di Berbangê de ya jî di Kurdistan Pressê de çer xwend nexwend min jê hez kir. Ji ber ku kêman cara şîreke Kurdî hewqasî bala min kişandibû. Ez ne şair im û ne jî ji şîrê pîr fahm dikim. Lê wek xwendevaneke sade ew ji bo min şîreke nuh, stîleke nuh bû. Di cî de min nivîskarê wê meraq kir û xwest ku wî ji nêz ve nas bikim, destê xwe li dilê wî bipelînim, bibînim gelo ev dil çawa dikane hewqasî xweş bigrî, bikene û bistirê.

Çawa bû, bi riya kê bû nuha baş nayê bîra min, (dibe ku bê bîra te) lê axir mala Xwedê ava be me hevûdu nas kir û me li malên hev qahwa ta' jî îkramî hev kir. Yanî ez dixwazim bibêjim, min Ahmed Husênî ne wek rexnegir ya jî wek wergêrekî lê wek şairekî orjînal nas kir. Û min ji vî Ahmedê şair tim jî hez kir; ne ji yê rexnegir, wergêr ya jî rojnamevan. Û ez dixwazim Ahmed Husênîyê şair her şair bîmîne; ne be tiştêkî din. Ez viya tenê ji bo zewq û tatmîna xwe ya şexsî nabêjim, li gor baweriyaya min ji bo feyde, xizmet û tesîra edebî jî Ahmed Husênîyê şair ji yê rexnegir, rojnamevan û wergêr gelekî muhîmtir e. Ji ber ku îro hewcedariya civata me bi tiştê xweş, tiştê narîn, tiştê delal heye.

Heqê min tune ye ku ez rabim abûqatiya civatê bikim, lê ez hêvî dikim ku tu'yê min ji xwendina şîrên Ahmed Husênî mehrûm nekî.

Sedsala me, bêzartirîn û belengaztirîn sedsal e -2-

— Ka em piçekî vegerin Meksikaya salên cengê, dixwazim li ser peywendiya te û Pablo Neruda yê ku di sala 1940'î de li Meksikayê wêk konsolê Şiliyê hatibû destnîşan kirin. Pîrsekê bikim?

— Wek ku min berî niho jî gotibû, di salên sihî de, wextê ku min dest bi xwendina helbestên nûje kiribû, helbestên Nerodayî bo min çavkanîne peyamê bûn. Wexta min diwaneya xwe ya yekemîn çap kir, min hejmarek jê re hinart lê wî bersiva min neda. Lê Neroda bi xwe li paş wê vexwandinê bû; vexwandina min a jî bo kongreyeke wêjeyî li Spanyayê. Dema ku ez gihîştim Parîsê min ti kes nedasî; ku jî tirênê peya bûm mirovekî bejindirêj bi aliyê min de dibezîya û bang dikir: Oktavio Paz! Oktavio Paz! Ew mirov Neroda bû. Bi xêrhatineke germ pêşkêşî min kir, ez himbêz kirim û got: Tu pîr biçûk î. Berê min da xewxaneyekê û em bûn heval. Yekemîn kesê ku helbesta min xwendiyê û piştgiriya wê kiriye Pablo Neroda ye.

— Serdana te ya Emerîkayê?

— Min miletê Emerîkayê nas kir, bi vê naskirinê pîr surdar û matmayî bûbûm. Serdana min, wek henaseyê kûr û aza li beramberî valahiyeke berfireh û tirsonek bû. Hestekî payedariyê û bi xwebaweriyê bû. Min dikaribû siyasê deynim rexekî û di helbestê de binav bibim. Min helbesta emerîkî li cem Konrad Aykin di "Antolojya helbesta emerîkî ya nûjen" de nas kiribû. Min nû dest bi xwendina Eliotî kiribû. Lê min helbesta W. K. Williams û Pawand û Mor nedasî. Min hin jî helbestên Hart Krîn, yê ku salên xwe yên dawîn li Meksikayê jiyabû, xwendibûn. Ew bi xwe jî li derveyê helbestê jî bareyê efsanewî bû.


Piştî wê vejeriyam Parîsê, min peywendiyên xwe, bi hin hevalên kevin re yên wek Bincaman Bîrê, yê ku min bi Brîton re da nasîn, girêdan. Ez û Brîton dibin heval. Wê wextê surrealîzm ber bi jêr ve dadiket. Lê di jiyana wêjeyî ya Firansayê de diyardeyê tendûristane, jîndar û rapêrxwaz bû.

— Mebesta te çi ye?

— Surrealîstan tişta ku firansiyan jî bir kiribû bigewde kirin: Rexê di ji awez (Aqil) û evîne û azadiyê û helbestê. Firansî bi xwe pîr jî hişmendiyê hez dikin û hewl didin ku hertiştî bikin raman, û li ser wan ramanan pev biçin. Wexta gihîştim Parîsê J. P. Sartre mirovê desthilatdar bû.

— Lê jî bo te realîzm kumekî kevnare bû?

— Rast e. Li Madrîdê feylesofê spanî Ortîga. I. Gasî - û li Meksikayê û Arjantînê jî şagirtên wî - deqên bingehîn ên li ser fenomenolojiyayê û realîzmê jî Hosrel hetanî Haydgar, belav kiribûn. Wisa jî Sartre tevlihevîk jêhatî ne ku çekirineke nû bû. Herwiha bi wateya siyasî jî li dijî



Sartreyî bûm. Li Firansayê tenê Albert Camus nêzikî realîzmê bû. Hevaltiyêke gur û germ di navbera me de durist bû. Gerek bê gotin ku ez bi xwe pirtir nêzî helbestvanên surrealîzmê bûm.

— Kinga Octavio Paz ji dil li ser ramana Asyayê rawestiya ye?

— Ji sala 1952'an de, ji serdana min a pêşîn ber bi rojhilatê ve, dest pê dîke. Wexta du salan li Hindê û Japonyayê rûniştibûm, min dest bi vekolîna vemaî û kelepore felsefî û hunerî ya van herdu welatan kir. Herwiha min serdana gelek cî û waran kiribû. Min berhemên wan ên klasîkî bi hêrs dixwendin. Feylesofên çînê û japonî bandoreke taybetî li ser min hiştibûn. Cara diwemîn wexta ku di navbera salên 1852 û 1968'an de li Hindê bi cî bûm, min gelek deqên felsefî û olî yên balkêş xwendibûn. Bandora bûdîzmê jî di hinavên min de pîr kûr bûbû.

— Te dixwest ku tu bigihîjî bir û baweriyê?

— Na. Lê xwendina bûdîzmê werzişêke giyanî û hizrî bû, di warê lêpîrsîna li "ez" û li xewnên "ez-ê" alîkariyêke bê sînor bû. Perestiya "ez-ê" bi xwe li cem mirovê wê serdemê pûtperestiya herî giranbûha ye. Di baweriyê min de jî bûdîzm rex-

neya herî dijwar e bo pûtperestiya "ez-ê". Ev raman, di pîtûka min de ya bi navê "Peywendî û cihêbûn", mijarên sereke ne.

— Di navbera salên 1935 û 1957'an de te "azadî li hemberî sozê mîrê çê" nivîsandibû. Ango berî bîst salan?

— Min nivîsandibû û min gelek caran jî nivîsandina wê dîbarekirîye.

— Ma gelo kurtejiyan e?

— Erê û no, ezmûneyên min yên bedewiyane û kesane jî salên ciwanîyê hetanî têgihîştinê derdibire. Wexta min helbestên pêşîn nivîsandin temenê min bîstûyek bû, û yên dawîn jî yên çilsaliya min bûn. Lê di wan helbestan de qehremanê rastîn ne Octavio Paz e, mirovekî nîv-rast û nîv-efsane ye. Ango jî bilî helbestvanî ne ti kes e, digel ku ew helbestvan di temenê min de bû û bi zimanê min dipeyivî, û sedemên hebûna wî ligel min digunciyên jî, lê dişa ne ez bûm! Dimenek an jî wêneyek bû jî keleporek e tevlihev hatibû vegirtin. Ez dibînim ku her helbestvanek jî bi gewdekîrineke dem sînorîkirî ye jî bo dimenekê jî dimenên wê babetê.

— Ma di "Labîrenta tenhatiyê" de, rada kurtejiyanê peyda nabe?

— Ji nû ve erê û no. Min "Labîrinta tenhatiyê" li Parîsê nivîsandibû. Ramana nivîsandina wê li Emerîkayê hatibû bîra min, min dixwest helwestên wan meksîkiyên ku li Los Angelesê rûdinin analîz bikim.

Tu dikarî bibêjî ku jî bo min wek ney-nîkê bûn. Ev bi xwe jî wek ku tu dibîni rada kurtejiyanê ye. Lê jî aliyekî di ve, peywendiya di navbera Meksîka û Emerîkayê de heye. Eger di vê cihanê de em jî du welatên cihê bin jî, Meksîka û Emerîka, fermana ku em bi hev re bijîn, fermanek e bêguman e, lewra gerek em hevdû têbigihêjin û gerek em xwe jî têbigihêjin.

— Pirtûka te li ser ramanên nakokîyê, kîne, û xwerista mirovê meksîkî radiweste, lê nahingive jiyana helbestvanî?

— Rast e. Min hewl daye ku wê mijara tu li ser dipeyivî di gotareke kurt de bi navê "Helbesta tenhatiyê û helbesta civatê" ronî bikim. Bi wateyêke jî wateyan dikare li hemberî pirtûka "Labîrenta tenhatiyê" bibe cewiya wê ya helbestî, çînkî nêrîna min ya li ser mirovî ku nêrekeke pîr zelal e, şirove dîke. Li beramberî çî jiyaneke mirovî be du helwest hene: helwesta yekem bareya sêwîbûnê ye, ya ku bi derengî aliyê wê yê rengvedanê, eşkere dibe; helwesta diwem jî ew e ku em - bi sedema "ku hinekan em evêtine wê cihanê" wek ku Haydgar dibêje - heşt dikin ku gerek em "para dîtir" bibînin; wek ku Bûzî dibêjin. Ev bare bareya tûbûna civînan e. Bawerim ku felsefe û ol jî helwesta resen an jî astenga mîratgir hatine. Her welatek, her kesek, hewl dide ku astengan bi rêçine cihêreng çareser bikin. Helbest jî pîra di navbera tenhatî û civîne de ye. Civat jî ticarî nikare reha be; hetanî di çavê sofîyêkî pîrozmend yê wek Yohe-nayî de jî welê ye.

— Ji ber vê yekê zimanê sofîzmê zimane-kî îrosî ye?

— Erê, çînkî evîndar - jî xwe sofî jî evîndar in - wêneya herî payedar a civatê çêdikin, lê tenhatî hetanî di navbera evîndarekî û evîndarekî din de, jî kokê nayê rakirin. Li beramberî wê jî ticarî ne reha ye. Hergav em ligel hinekan in, hetanî ku ev hinek sîbera me be. Ticarî em ne "yek" in, her û her em "em" in. Ev kenarên jî hev dîr, jiyana mirovatiyê pêktînin.

Ehmed Huseynî ev hevpeyivîn jî Erebi wergerandiye.

Bi xeletî di beşa yekê ya wê hevpeyivînê de me navê Octavio Pazî wekî nivîskarê nivîsarê nivîsî bû. Hevpeyivîn bi Octavio Pazî re hatiye kirin, nivîs ne ya wî bi xwe ye. Xeletiya me bibexşînin.

MIHEMED ŞÊXO

Ji bo Mihemed Emîn Bozarslan

Li dûv xewneke şewitî

Bi hemî xemla periyê
xweşiyê xwe asê kir.

Şeva destvekirî
li noqa dil wê digerinim.

Di dorana avê de
tevneke efsaneyî
li dora bêjeyan dorpêç têt û
mestiya xwe dihona.

Êvarî baş
bi te re ne herdu laş!

Toza çavan
di maseya tariyê de
xwe diveşêre
ma kanî ew rû
û ew bizava te ya bişewat?

Cama şeveqan
di nav hêstiran şikest
me xwe ji bîr kir di nameyekê de
çû ser û nehat...
Ji xwe ditirsim
deveran bi zikreşî
vediqupînim.

Go ez dilê xwe
bi ser çiyayan de berdim
çî xurtagir im ey
[hewar.
Ji xwe ditirsim ku
koçkirinê nû vejînim
bi destekî bênav û
ser di ber de.

Di wê dehla bi hêviyan kutandî
pêrgî nebim
ezê di xewnê de xwe veşêrim.

Ewa sîng şevî
hişyar kirim
dema li ser mirina xwe amade bûm
ketime ser pêtê du awiran
yekê qurmîçokên min pişavtin
ya dî
têla jiyana min radikişîne.

Similek ji çavê şemalê weriya
germa ku di xwînê de gencîn bû
tev de dabû ber nikilan.

Dema ez winda bûm
ji dost û biran
li ber dergehê kut-kutekê
bûme mêvan
wê xwe ji bîr kir ku
bide min kilîda hingûr
min jî ne li deriyê da



û ne pêgehên nûvekirin.

Niho tu têrbûna dilî saz dikî
çûneke bitevzînok
agirekî ku destê min vedixwe
bi ser singeke dilmê de.

Te hiştiye ku lêv giriyê pişkokaan ji bîr ke
hêviyên me keçîn bûn
te dest danî ser gula zer.

Ku ez tîm perdeyên bihna te diqijilin
kengê ezê ji meya destê te vexwim.
Li deverê hişyarbûnê wê ba te nîşan bide
bazareke rût
gihandineke bi lav-lav.
Ma wê vabûn

ji perdê re
bibe vebûn û
tê xwe têxî nav hilçînina tiliyan.

Ey şemalê
dîtina te
laşê min daye ber bêleke dasiyan.

Go:
Heyran
peyaleyên caman lev xin
bibin ewrekî hêviyan
û li ser xaka dilî bifirfitin...

Ma ev çî xewn e
bi hemî xemla periyê
xweşiyê xwe asê kir.

YAN CILIK YAN LAWIK

SILÊMANÊ ELÎ

Bûbû mode ku xelk zaroyên xwe bişî-
Nin Rûsiyayê ji bo xwendinê. Mala
Remoyî di vî warî de ji xelkê mabûn, tu
zaroyên wan neçûbûn derve û textorî
nexwendibûn, loma jî ev malbat gelekî li
ber xwe diket. Wan li dora xwe dinêrin,
zaroyên xelkê hemî çûne Rûsiyayê tex-
toriyê dixwînin – jixwe kesekî tişteki din
nedixwend – û bi keser difikirin, ku çawa
deh salên din her maleke Qamişloyê,
wê textorê wê ji wê be. Çavên malbatê
hemiyar li Hesobûn, kengî bakaloriyayê
bistîne, û bi rastî jî gava netîce hatin He-
seno bi ser ketibû. Erê ne bi dereceyên
bilind lê li wê malê bû cejn. Wan camê-
ran karê xwe giş berdand û dest bi xebatê
kirin, da wî lawikî bişînin Rûsiyayê. Ho
çûn, ho hatin, dostekî ev re da ber wan:

— Herin cem komunîstan, belkî hûn
minhakê bi perê xwe, ji wan, bikin.

Şûiyan jî, wek me dizanî, kursiyên
xwendinê difirotin, heqê wan minhan
diket bêrika partiyê yan bêrikên mirovin
jê, em nizanin û jixwe ji me re ne lazim
bû em zanibin û loma jî em bi dû nedik-
ketin. Mala Remo rica ji kirîvekî xwe
kirin. Kirîv komunîst bû, ew birin û çû
cem havalê xwe, yê navdar, ew berpirsi-
yarekî Cizîrê, bi navê Bavê Rengo camê-
rê berpirsiyar, bi zimanxweşî û mer-
vanî peyivî û got:

— Inşala wê lawik here.

Hêviyeke biçûk bi mezinê mala Remo
re çêbû û ji bo ew camêr baş bawer bi-

be, ku Hesên wê sedî sed bibe textor, zi-
lam dawetî malê kirin:

— Bavê Rengo, ez rica dikim, hûn si-
be li mala me dawetî ne, firavîna we li
cem me ye.

Bavê Rengo ji tiştê wilo hez dikir û di-
lê xwediyên ezîmet û nanan tucarî nedîş-
kand, ezîmet ji dilûcan qebûl dikirin.
Roja paştir, li mala Remo nanekî bi hêla
mêl hate danin. Bavê Rengo, du-sê he-
valên wî jî pê re, dane ser û hestî di ser
serê xwe re avêtin.

Têr xwarin. Nan rabû, çay hat. Mêva-
nê ezîz, ku ew firavîn jê re hatibû çêki-
rin, çavê xwe berda xaliya giran ya li er-
da malê raxistî bû:

— Çî cilikek xweşik e, tu bi Xwedê kî
malê kû ye?

— Cilik? Cilika Turka ye, lê axir ya te
ye. Bavê lêwik, comerdîya xwe bir serî.

— Na wele, cilika we li we bimbar-
rek...

— Na bi Xwedê, cilik bû ya te. Bavê
lêwik gotina berpirsiyarê komunîstan bi-
rî.

Ew roj bi kêf û xweşî derbas bû, hemî
kêfxweş bûn. Gava mêvan rabûn, ma-
zûlvên bavê Rengo xewle kir û di ber re
avêt:

— Ji bo xwendina biraziyê te, çî barî
hûn bidin ser milê me, me qebûl e, hûn
çî kirasî bidrûn em dê li xwe kin.

— Baş e, baş e ne xem e. Ev bersiva
mêvanî bû, berî xatir bixwaze.

Roja dîn lawê mala Remo, textorê pê-
şerojê, cilik li paş xwe, li ser piskilêt kir

û tu li kû,
Q e d û r -
beg li kû?
Cilik bir,
li mala
berpirsi-
yarê şû-
iyan danî
û vege-
riya.

D e m
d e r b a s
bû, te-
bax hat,
bû we-
xta çê-
kirina pe-
lan, hazir-
k i r i n a
p a s p o r -
t a n .
Xwendin
nêzik li
dest pê bi-
ke û hêdî-
hêdî zaroyên
xel-
kê, bi dizî yeko-yeko diçûn Şamê û vene-
digeriyan. Îlon jî hat, tu deng û tu xeber
ji Bavê Rengo nehatin. Bavê lêwik ho
çû, ho hat, tişteki fêhm nekir. Çend caran
çû mala yê berpirsiyar, ew li mal zêft ne-
kir, geh digotin: — Çûye Şamê, geh: —
Çûye nizanîm ku. Mêrik fikirî: Bi min
keniyan, nanê xwe xwarin, wey bi jehr
be rebî, cilik jî birin, ew cilika delalî ...
wax. Û hema rabû bi kerb berê xwe da
kirivê xwe:

— Kirîvo ma mirov wilo li hev dike?

— Çî bûye kirîv? yê komunîst xwest
wî sar bike.



— Ma çî bûye, çî hal? We n... ca min,
heger hûn nikarin, we bigota: — Em ni-
karin. Emê biçûna cem cemaetên din,
we em ji dêrê jî mehrûn kirin, ji mizgeftê
jî. Kirivê şermezar li ber dilê wî geriya û
soz da here xeberek xêrê ji devê bavê
Rengo bigre. Dilê mêrikî bi vê gotinê re-
het nebû, loma jî gava rabû di devê derî
de, got:

— Kirîvo! Ji bira te neçe, ji bavê Ren-
go re bêje: — Ya cilik, ya lawik, erê kirîv,
ya cilik, ya lawik.

RAMAZAN AYDEMİR

Rindê Dinya

Ceyk bi ceyk çinêbi, wext verî d' yow merdim feqîr û cinîyê xu bî. Zaf fe jîr î, bon yinî z çinû. Yow sulî sil ser ke e ken. Epêyî, yow wext ra pey cinêk pîze nêweş vecêna, xelisiyena, de r' yow lac bon. Hella k' put (qic) yon dinya hîri heb cinîk yen ser. Herg cinîk semêd put yow destgîro ona.

Cinîka verên nome nona put ra, vona "Nomey in put wa Mehmed Emîn bo".

Cinîka bîn xincêr dona dayke yî, vona "we ki bi xişn wa bik mûndey xwi ver. Pey bon qasbalî û quwetlî. Gon yi ha ina xincêr d' o".

Cinîka hîrin vona "Lapatê xwi day komî r' se wa pey ca d' bîmur".

Hîri heme cinîk destgîron xwi don daykê yî, xatir tira wazen şûn.

Serr vêren put bon xişn, miyon puton d' kay kon. We û putik don pîyor, lapatê xu doy komî r' ca d' meron. Yow, di, hîri, put merên, xeber şuena paşayî r'. Von "yow put vecaw, lapatê xwi day komî r' se ca d' meron."

Paşa zaf meraq kon, çiyer heb leşkero erşawon von "Şîyr ay xort big biyar!"

Leşker kwîn rayer şuen xort big biyar. Yî û xort muneqeşe ken. Xort leşkero lapat kon, leşker meren. Xeber şûna paşayî r' von "leşker tue merd, pey lapaton Mehmed Emîn". Paşa duyey heb leşkero erşawon von "Şîyr ay xort bixapeyn big biyar."

Leşker şûen xort xapeyên gîn on paşay het. Paşa xu don Mehmed Emîn sinasnayîş.

Paşa von "xorto yow çend şart mi est, ek ti qebil hik se ez tue 'ef ken. Ti kebil nêkir se Tue ken pey bêr (qulix). Ez qeyul tue bik lac xu ti se von?"

Mehmed Emî von "şart mi z' est, ek ti şarton mi biyar ca se ez qebil ken."

Paşa von "şarton xu vac."

Mehmed Emî von "Daykey min û bawk mi ha yow axur de y, ti gerek mi ra nizdî der yow bo vîraz, yow gure bîder d' wa pey debarê xu bik."

Paşa qabil kon. Mehmed Emî tiya ra pey ben lac paşay.

Bon paşay zaf xişn o. Çores heb wadê yî est, pîyore ha kilîtkerdey. Mefton wado don Mehmed Emîn.

Paşa von "Ek hewey tue nêomey se ber in wado ak boyn zerre, hewey tue yena. Labire ber çoresin meak."

Mehmed Emî qebil kon, mefton wado gon. Epeyi ruec vêrên, hewey yî nîna.

Xu b' xu von "Ez hey in bero ak, deray çina ha tid' o." Pîyoreyi bero akon, çeray yow çî weşê yi ra nêşûn. Mehmed Emî xu b' xu fikirîyon "çina ra bawk mi (Paşa) von in ber meak. Ez gerek in ber ak, hey boyn çina ha ti d' o." Ber akon, sinê ownen zerre, çî boyn! Yow fotraf ha dêsî d' alqînay' ow. Fotraf yow keyna w. Ownen fotraf ra cad' xerqiyon. Paşa yerey yon keye, ownen, çî boyn! Mehmed Emî ha ver beri d' xerqiye yo. Mehmed Emî hîdî hîdî hêşar (haye) bon.

Paşa cigîyon ti ra, von "Mî tu ra nêva in ber meak. Tu çî in ber akerd?"

Mehmed Emî "Mî xelet kerd. Labire ina keyna kom a? Ha ça ya? Ti mi r' cay yey vac, ez , şîr big biyar."

Paşa von "Mî semêd ina keyna howt ser qoxe (şer) kerd ez nêşaw bigîr, ti ça ra şîyn bigîr." Mehmed Emî von "Aw gurey tue nî w. Ti mi r' cay yey vac. Ti cay yey nêvac se ez xu kişen."

Paşa der' cay keynek von. Mehmed Emî tedarek xu veynon, xu tê beston,



radon.

Paşa dim a veyn don "Teyna meşim, biray xu xu d' ber!" (Bê Mehmed Emîn yowna lac paşay est.) Mehmed Emî qebil nêkon. Paşa tide zaf lebiyon. Mehmed Emî biray xu gen piya kwin rayer şûn. Zaf şûn toyn şûn gore b' yow heftî rayer a şûn, zoday yin qedêna. Zaf bên veyşo, şow pi de yena. Owna ken yow ko ra adir ha veşon. Kwin rayer şûn adir het, çî boyn! Yow lê (lên) ha adir ser d' ow, howt heb qulp yi est, ti de heb ha powciyon. Mehmed Emî bon pi ra, adir sar ra ruenon. We û biray xu pîzey xu ken mird. Heyna lê gîn non adir ser ow ver adirî d' rakwîn. Ben dest nimac (sibay) dûw (dêw) yen keye, çî boyn! Di heb merdim ha ver adirî d' rakote y. Dûw von "Ma inîn bikiş bûr." Biney muneqeşe ken. Yow dûw çim yi kor. Dûw kor von "Ma inin ra çî vacir, ma neşey bikiş se, xu aqley ma pîyorin kişen. Hey boyn di merdim, in lê hawa naw, ti ra biney werd û heyna naw adir ser. Ow ma howt heme zor lê adir ser ra ronon. In merdim xirab niy, sow xirab bibîn se in heb ma pîyoreyi rişnayn ow tiya z' nêrakowtin."

Pîyoreyi dûw in vati qebil ken. Bon nimac, Mehmed Emî û biray xu warden, ownîn howt heb dûw ha yin het runîştey. Yî û Dûw xu don yamno sinasnayîş.

Dûw ti ra pers ken von "şima çî ome y tiya? Çî gurey şima est? Vacir, ek ma sey se ma şima r' alikarî ken."

Mehmed Emî şinay ser ome y se yin ra von.

Mehmed Emî von "Mî r' alikariyey şima lazim nîya. Ek şima qeyil ben se wa biray mi şima het mon. Hetta çores rucc

ek ez omew se omew, ek ez nêomow şima zon, se ken biray mi se bikîr. Şima û wîcdon xu, ez şima ra çî nêvon." Vengdeng Mehmed Emînî z' pîyoreyi dinya d' eşnawiyaw. Comerdiyê yi kowta her kes fek.

Dûw qebil ken. Mehmed Emî Duwyon ra xatir wazon, biray xu yin het verdon, kun rayer şûnn. Zaf şûn toyn şûn, şow rucc rayer a şûn, çî boyn! Ek yow lacek ha 'erdo bûy kon, silom don bide.

Mehmed Emî von "Umbaz ti ha se ken? Ti çî in 'erd bûy ken."

Bûykerdox von "Ez pey hesiyaw yow merdim veciyaw zaf quwetlî w. Nomê yi Mehmed Emîn. Ez veyn se ti de guleheş gen, deray ez yemon nû we." Heyna 'erd bûy kon, von "Ez ha bûyê yi zaf nizdî ra gen."

Mehmed Emî von "Bê ez û ti ma guleheş bigîr. Ek ti şey mi bidir 'erd se ti Mehmed Emînî z' don 'erd. Min û Mehmed Emîn tim ma guleheş girowtin. Timî z' ma tê ver şîyn."

Bûykerdox qebil kon. Mehmed Emî û 'erdbûykerdox guleheş gîn. Mehmed Emî yi don 'erd.

Mehmed Emî von "Merdimo k ti ha geyren bide ezû."

'Erd Bûykerdox von "Welo k' ti Mehmed Emîn gerika ez û ti ma bib biray cê."

Mehmed Emî qebil kon, piya kwin rayer şûn. Epeyi yow deme rayer a şûn, ona ken yow merdim ha koyo sencon. Silom don bide. We z' silom yin ragon.

Mehmed Emî von "Umbaz ti ha se ken? Ti çinay ser in koyo sencên?"

Setox von "Ez pey hesiyaw yow mer-

dim veciyaw zaf quwetlî w. Ez ha geyren bide, ek mi dî se ti de guleheş gen, deray ez cihat nû we. Nomê yi Mehmed Emîn û."

Mehmed Emî von "Bê ez û ti ma guleheş bigîr. Ek ti şey mi se ti şîyn Mehmed Emînî z'. Min û yi ma zaf guleheş girowta, ma timî z' tê ver şîy."

Setox qebil kon. Wûr dî piya guleheş gîn, Mehmed Emî yi don 'erd û von "Mehmed Emîno k von ez û." Setox wardon lew şûn pira û von "Ez qeyul bib biray tue."

Mehmed Emî qebil kon. Bê hîri biray kwin rayer. Zaf şûn toyn şûn rayşt yow merdim yen. Ek ha awkey behro pey yow mastiyêr kaş kon fêk xu. Silom don bide. Lacek silom yin ragen.

Mehmed Emî von "Umbaz ti ha se ken? Ti çinay ser awkey in behro kaş kên fêk xu?"

Awkaşkerdox von "Ez pey hesiyaw yow merdim veciyaw zaf quwetlî w. Ez ha geyren bide. Mi ser 'erdon a nêdi, mala ez yi bin behron d' veyn. Mi k' we di ez ti de guleheş gen, deray ez yemon nû we. Nomê yi Mehmed Emîn."

Mehmed Emî von "Bê ez û ti ma guleheş bigîr. Ek ti şey mi se ti şîyn Mehmed Emînî z'. Min û yi ma zaf guleheş girowta, ma çaray nêşey yamno bid 'erd."

Awkaşkerdox qebil kon. Wur dî piya guleheş gîn. Mehmed Emî yi don 'erd.

Mehmed Emî von "Aw merdimo k ti ha geyren bide ez û."

Awkaşkerdox von "Ez qeyul ez û ti ma bib biray cê."

Mehmed Emî qebil kon. Çiyer heme biray kûn tê rey şûn. Zaf şûn toyn şûn, rayşt yow dow yen, çî boyn! Şar dow piyoreyi kowt dow ra teber. Dowi d' Saray yow goni nêmend. Yow kuçe d' rayşt yow kerga gonî yen, ek yey z ning ha best, dar a alqînaya.

Yamnon a "Ina dowi d' yow çî est, ma nêzon çina w. Yow çend rucc ma tiya paw, deray in çina w ha tiya w. Ma şey se şar ina dowi z' in derd ra biqedîn."

Şow rakwin rucci z' şûn sêyd. Herg rucc yow tene dowi d' pawon. Yerey biray yi k' sêyd ra ome yinî r' wer kon hedire. Rucc vêrîn biraw kosetox keye d' pawon, birayon xu r' çî kon hedire. Ben het yerî ra, hown yi yen, biney rakwen. Xu hêşar benû k' dest ning yi ha pey yow müy bestey. Müy qarfinon, ownînû k' çaray yow hebey wer nêmend. Lez-lez çî ken hedire, sol xu vir a kon. Biray yi yerey yen keye. Ownîn biray yin zaf xînt. Yini r' çî on, çî bêsol. Biray yi ti ra von. "Se bû tue?" Von "Biney sarey mi decon."

Rucc bî biraw bûykerdox keye d' vindon, birayon xu r' çî kon hedire. Ben het yerî ra, hind owna kon yow merdim erdîşi ha yon. Yow mîtrû qomê yi ya, mîtrû nîm erdîşe yi ya. Sinî yon yi het, yow lapat don bûykerdoxî r', bûykerdox ca d' xerqiyon. Deston yi û ningon yi pey yow müyey erdîşe xu beston, çî wen û şûn. Bûykerdox xu hêşar benû k' waxt biray yi bîr. Lez çî kon hedire, bê sol û bê run. Biray yi yen der -i own. Biray yi si wên, çî bêsol û bêrûn. Biray yi yen, der çî on. Biray yi çî wên, çî bêsol û bêrûn.

Von "Qay in çî tue bêsol û bêrûn? Se bû tue, ti xînt biy?"

Bûykerdox von "çî nêbû mi, biney ez nêweş, mi sol û rûn xu vîra kerd."

Rucc hîrin biraw awkaşkerdox keye d' pawon. Birayon bîno ser d' çina omow se yon sarê yî z' ser d'.

Rucc çiyerin Mehmed Emî keye d' pa-

won. Birayon xu r' çî kon hedire. Hind owna kon yow merdim ha yon erdîşe yi yi ra derg a. Yen Mehmed Emîn het yi lapat kû, Mehmed Emî yi ra ver lapat don pirû, lacek ca d' meron. Mehmed Emî xu b' xu fikrîyon, von "Se kerd se inî kerd şar ina dow û birayon mi." Yow rowta derg gîn kuwn qinê yi ser, yow bon a rucenon. Yerey biray yi yen keye, hind owna ken ek aw lacek ha ser bon a serey yow ro'vt ra rucenay*ow. Ca d' lew şûn Mehmed Emîn ra. Von "in lacek tim omeyn dest ning ra bêstîn, çî ma werdîn şîyn, zey ser çî ma tim bêsol û bêrûni b'."

Şar dow ownenû merdim erdîşi ha seryow bon ra rucenay'ow, heyne peyser yen dow. Şûr çiyer birayo het, von "ina howliya k' şima ma r' kerda, çeray çow ma r' nekerda. Şima ma ra çina wazen se sarî çimon ma ser. Çina ma dest ra biyor ma xu pey ra nênon."

Mehmed Emî von "Ma çeray yow çiy iz şima ra nêwazen. Şima şîyn se in birayon mi bik dowuc xu. Yinir yow bo viraz wa ti de keye bik. Sobna ez şima ra çî nêwazen."

Şar dow von "Tiya ra ver in lacok erdîşi omeyn dowê ma, çina ma powtin wen şûn. Semed in lacek ma dow ra kowt teber. Inna howliyê şima ser, ma haway çimon xu ownin birayon tue. Wa çim tue tue ra pey nênon."

Mehmed Emî yow çend ruoc monon, dowi d' birayon xu ra von "Gerek ez hin şûr gurey mi est."

Biray yi von "Ma wazen tue d' bîr."

Mehmed Emî qebil nêkon, von "Şima qeyil mîr howlî bikir se, asmen a yow astare nawnon yîn, boyn, ek in astare bimaxmû, bizonî ez ha tengone d' o, bîr alikariyey mi."

Xatir birayon xu ra wazon, kuwn rayer şûn. Zaf şûn toyn şûn, rayşt yow inî yon. Ser inîyî d' non xu wen, awkê xu şimen inî ser d' rakwûn. Di heb cinî yen ser inî, owna ken vow xort ha ser inîyî d' rakowt'ow. Yow xincêr ha mûndê yi verkerda ya. Xincêr mûndê xort ra kaş ken şûn. Wur dî cinî xincêr ser pê nîn. Peynîyî d' xincêr bèn erzên behr (derya).

Mehmed Emî ser inîyî d' hown d' monon. Şow yow biray yi şûn teber, ownîyon astare bîyû maxmû. Peyser ageyron, şûn zerre, birayon xu weriznon, von "Hey bîr, Mehmed Emî ha tengone d' o, Astare bîyû maxmû. Ma şîr alikariyê yi."

Kwin rayer şûn. Rayer a herg bira fendon xu on ca: Awkaşkerdax awkey behro kaş kon fêk xu. Hind owna kon xincêrey Mehmed Emîn ha fêk yow masî d' a. Xincêr gîn. Kosetox koyo sencon von "ha in 'erdo ser d' o."

Erdbüykerdax 'erdo bûy kon. Herindê bûy gîn şin ser inî, Mehmed Emîn veynen. Xincêrey yi ken mûndê yi ver. Mehmed Emî xu aqliyon (hêşar ben). Owna kon hîrê heme biray yi ha yi ser d' viner-tey. Mehmed Emî cirgon yinra, von "Şima çî omey? Şima çî ez hown a weriznaw? Hima newe ez rakwotib."

Birayon yi, heton inkey se kerd, çina omew sarçeyi ser, piyorin ti ra von. Mehmed Emî yin heyne peyser erşawon keye. Yamnon a xatir wazên, kwin rayer şûn. Mehmed Emî çend ruoc a pey rayşt yow dow yon. Dowi d' veyve est. Biney miyon dowi d' geyron. Hawawo k' paşay (bawki yi) vat, dow aw cusa ya. Binêyna geyron, rayşt yow pîr yon.

Mehmed Emî von "Ti meymono gena?"

Pîr vona "Eza feqîra bêqom. Kom yen

key mi, cay mi zaf teng û. Ez nêşiyen meymono wedarn. Şim key paşay." Mehmed Emî yow çeng zêro don pîr. Pîr vona "Key mi key axon û begon o. Çiqase k' merdim pîl yen dowey ma, tim yen key mi." Pîr Mehmed Emîn gena bena key xu. Mehmed Emî pîr ra pers kon von "In veyvey kom o?" Pîr vona "Veyvey lac paşay û Rindê Dinya w". Mehmed Emî von "Ti şena mi bera Rindê Dinya het?" Pîr vona "Eza feqîra bêqom. Ez ça w Rindê Dinya hetsiyayiş ça w?" Mehmed Emî yow çeng zêro don pîr. Pîr vona "Xura kar-gurey mi in û." Pîr kincon cinîyo dona Mehmed Emîn ra. Wur dî piya kwin tê rey şûn key Rindê Dinya. Şar veyvî kom dest xu erzen qinney pîr, von "Keynay xu bid mi, keynay xu bid lac mi. Tue ça ra ina keyna arda? Tue ça nimita heton inkey keynay xu. Ti ha bena ça?"

Pîr vona "Ez keynay xu ben veyvek het. Wa ya û veyvek biney piya govend bikîr."

Şûn veyvek het. Mehmed Emîn û veyvek sinê yamno veynen, ca di zerrey Rindê Dinya kwena Mehmed Emîn. Biney yamno het vindên, ingîşterîyûn xu bedilnen. Mehmed Emî hewna peyser şûn key pîr. Veyvek bêr wadi qefilnena, çaray çowî d' qal nêkena. Hetona k' veyvek qal nêker veyve nêqediyon. Lac paşay nêşin şûr veyvek het. 'Edet yini z' in hawa w.

Paşa von "Kom veyvekey mi fin qal çina mi ra biwaz ez don bide".

Cinî xu tê besten şûn key veyvek, wazen veyvek fin qal. Se ken se veyvek çowî d' qal nêkena. Bêr wadi çowî r' nêakena. Cinî axon û bego von şûn nêşin veyveki d' qal bik. Xeber şûna pîr û Mehmed Emîn. Mehmed Emî heyne cilon cinîyon pira gên we û pîr kwin tê rey şûn key veyvek. Piyoreyi cinî pey pîr kay ken, von "Ihinday cinî axon begon şî nêşey veyvek fin qal, ti ça ra şena fina qal?"

Pîr vona "Şima r se? Ek nêşiyaw fin qal şima aw mehêl vac."

Pîr şûna bêr wadi ver, vona "Aya hesreta k ti ha pey nalena, qay aya hesret mi r' bêr wadi akir."

Veyvek cad bêr wadi akena. Pîr û Mehmed Emî şûn zerre. Mehmed Emî û veyvek cilon xu bedelnên. Pîr Rindê Dinya gena şûna keye. Mehmed Emî wadey veyveki d' monon. Paşa yow heqbey zêro don pîr. Lac paşay zaf ben hêrs xu b' xu vaciyon, von "Erey bî şow e zon se ken tue". Umşo lac paşay gerek şûr veyvek het. Paşa xeber don şar xu von "Wa çow umşo teber a nêgeyr! Kutikon xu û pisîngon xu bigîr zerre. Çaray yow veng ez nê eşnaw. Ek mi yow veng eşnawut se şima piyoreyîn tiya ra fetilnen."

Bena şow, lac paşay ber wadi akon şûn zerre. Veyvek ver ra nêwardena pay. Lac paşay nengo çinon bide, ben yow qamçî ra, bid veyveki r'. Mehmed Emî wardon pay, ben lac paşay ra, erzon 'erd. Deston ningon yi û fêk yi besten, finen zerrey cil, bêr wadi qefilnen şûn key pîr.

Mehmed Emî von "Gerek ma hin şîr, ti z' bê ma piya şîr. Nimac (siba) paşa yen tue kişon."

Pîr vona "Mi r' tiya teng, weyra veng û. Paşa nêşiyon çeray çî bik mi, şima xu f' boyn sarçeyi xu, xu biqadîn bes û."

Mehmed Emî xatir pîr ra wazen, veyvek giyon û kun rayer şûn het welat xu ra. Ben nimac (siba), cinî yen ver bêr lac paşay, çow de r' bêr nêakon. Ben teyştare onc bêr nêaben. Xeber don paşay, von "Hey bê, lac tue hima bêr nêakerd. Cey

çî omow sarê yin ser."

Paşa yen, bêr şiknon şûn zerre. Owna kon lac yi ha cil d' ow, dest ning yi û fêk yi ha beste y. Lac xu akon, leşkero finon dormaley welat xu, von "Şima konca te-pîşt se mi r' goni bigîr biyar."

Leşker geyren nêgeyren çî nêveynen, yen.

Mehmed Emî şûn hîrî heme birayon xu veynon. Xatir yin û dowicon a wazon. Sare erzon rayer ser û şûn het walat xu ra.

Çowres ruoc Mehmed Emîn qedîn.

Dûw von "Ma biray yi bikiş bûyr. Ben muneqesey yin. Dûw kor vecên ser bon, ona kon yow howr vecaw asmê, sey gulî ha yon. Ca d' şûn dûwon binon a von "Şima çî nêkîr biray yi, Mehmed Emî ha yon."

Dûw qarîş biray yi nêben. Çend ruoc a pey Mehmed Emî yon. Biray xu dûwon het ra gen. Xatir yin ra wazon, kuwn rayer şûn het welat xu ra.

Çend ruoc a pey reson walat xu. Yow veyve don pirû, howt ruoc howt şow.

Mehmed Emî ruoc şûn sêyd, yerey yen keye. Ruoc miyon d' paşa çim verdon cinîyey Mehmed Emîn, ti ra von "Semêd tue mi howt ser şer (qoxe) kerd, ez nêşaw tue bigîr. Mehmed Emî tena ome ti girowta. Ez gerek tue ti ra bigîr, yi z' bikûş. Xura ayey ser mi Mehmed Emî erşawitib tue bigîr biyar."

Yerey Mehmed Emî yen keye, cinîyey yi ti ra vona. Mehmed Emî paşay kişon, tiya ra pey ben paşay welat. Mehmed Emîn û Rindê Dinya mirad xu şay bèn.

Dûmarê Çewlîg ra çend deyrî

Inî deyrî mi dewûn dûmarê Çewlîg ra dayî arîye. Inî deyrî Çebaxçur û Pali di veyvûni di yêni vatîş. Hêna zaf deyr govend ê, xwert û keynê inî deyrûnn vûnî û pa govend gênî.

Arêkerdax: Seyidxan Kurij

Rinday mi ha rinday mi

Rinda mi ha çiyer d' yena, rinday mi ha rinday mi
Çiyer d' yena, dêst mi gena, şenya mala bavê mi
Di ling govend kay kena, rinday mi ha rinday mi
Lingê govend xelitnena, şenya mala bavê mi

Ma şinî Derê Dizdûni, rinday mi ha rinday mi
Çiyer di yenû qeflê keynûni, şenya mala bavê mi
Ho dêst destê gulûni, rinday mi ha rinday mi
Yi xwi sê gul bîyê dîni, şenya mala bavê mi
Rinday mi ha rinday mi, şenya mala bavê mi.

Mîro yeşî

Dayê mîro yeşî, dayê bego yeşî
Dayê gilê darûn, dayê bext mi rî bi yeşî
Dayê ez û begê xwi ma şivûn î
Dayê ma şivûnî gawûn û guelikûn î
Dayê diwar nîmruej, dayê yenû helo
Dayê taştê min û daye mîr mi di nûnî
Dayê ma çî bûrî çî cirûnûni

Dayê miyûn tol est, dayê calmergûn di
Dayê nîmruej yenû, dayê waxtê berîwûnûn o
Dayê berîwûn kotî, dayê kaymê gawûnî
Dayê wîrdi wîrdi, dayê xwi ri vaciyenî
Dayê berz perrenî, dayê nîmzi di kuwenî
Dayê mîro yeşî, dayê bego yeşî
Dayê gilê darûn, dayê bext mi rî bi yeşî

Cîranê

Cîranê cîranê cîrana min hevalê hogirê bermala min
Na cîrana mi bermena cîranê cîranê cîrana min
Na cîrana mi bermena hevalê hogirê bermala min
Qûm şîrin o terk nikena cîranê cîranê cîrana min
Qûm şîrin o terk nikena hevalê hogirê bermala min

Terkê dayka xwi nikena cîranê cîranê cîrana min
Terkê dayka xwi nikena hevalê hogirê bermala min
Îşlig zûmay neqîşnena cîranê cîranê cîrana min
Îşlig zûmay neqîşnena hevalê hogirê bermala min
Cîranê cîranê cîrana min hevalê hogirê bermala min

Na cîrana mi cor di yena cîranê cîranê cîrana min
Na cîrana mi cor di yena hevalê hogirê bermala min
Cor di yena dest mi gena cîranê cîranê cîrana min
Dest mi gena govend gena hevalê hogirê bermala min
Cîranê cîranê cîrana min hevalê hogirê bermala min

PYSK û siyasetî yê zon...

Zon o ki qal kinî; sey Kurmûncî, Zazakî, Soranî, Goranî, heryew yew lehçê Kurdî yo. Yanî heme lçher ehçê zî Kurdî yê. Hetî siyasetî ra inî ra vîşeyri çiki nûmo vatîşi. Merdim eşkenû vacû ki in vatîş zî heya eyro miyonî Kurdûn di vatîşoki resmî bîyo.

Na mesela di eyro çîyo 'acil çina wo? Gerek verniyê her çî di kî eyê tesbit bikirî. Verniyê her çî di siyaset û partî Kurdûn gey warî yew politikaki raşt bî. Mesela ser eyro û siba fikrî yîn çinê wo, gey vacî. Heya eyro siyasetî yew tesbîtko esasî nivrazîyo. Şertî Kurdistanî çinê y? Warî zonî di, warî nîfûsî di, warî sosyoloji di, warî cografya di şert û şûrtî welatî ma Kurdistanî rî sinî yew siyasetî program lazim o? Partî Kurdûn gey programûnî xwi di zî meselûnî ûnayenû rî çarewo siyasetî biyarî. Êy faktorê ki yew demko derg di statuyî Kurdistanî virazî û qederî milletê Kurdî tayîn bikirî, miyon yîn di yew faktorko temelî zî ina wo ki: Eyro ra ma warî çî siyasetî yê û ma gi siba Kurdistan di sinî yew idare ronî. Şertî zerî û teberî, siyaseto ki ma taqîb kenî û ma gi siba taqîb bikî eşkenî Kurdûn bikirî yew millet zî û Kurdûn bikirî çend parçey zî, zonî Kurdûn bikirî yew zon zî û bikirî çend zonî zî. Milete ki bî parçê û pê ra kewtî durî hey ma çimûn ver di. Sebeb çinê wo zî ma zaf ra tûnî zanî.

Segi mi sere di va, in wari di partiya newê, PYSK çîyo newe vûna. Na, siyasetî Kurdûn di gûmka averşiyayê ya. PYSK, programî xwi di ûna wûna: "Cumhuriyetî Demokratikî Kurdistanî di zono yewin gi Kurdî bû. Semedo ki heme lehçê Kurdî (Kurmançî, Zazakî, Soranî û Goranî) serbest aver şîrî, îm-kûn gi biyero dayîş. Yew mintiqa di kûm lehçey Kurdî hetî zafê (zafê merdiman) ra yeno qalkerdiş, eya mintiqa di dereca virên di ew lehçê gi biviyo, ci rî heqî wendişî û vilakerdişî (neşkerdişî) biyero dayîş." In tesbîti, miyonî siya-

set û partiyûnî Kurdûn di yew gûmaki newê ya.

Tûnî partî Kurdûn û şexsiyetê ki xwi zonzanaye, yan zî edebiyatçî vênîni, vûnî "lazim o ma çer lehçûnî Kurdî ra yew zono milî virazî". La sinî gi virazî nivûnî. Yîn gore Kurdistano azad di in zono "virêste" go bibo zono resmî. Zon, pê zor ya nivrazîyeno û zono "resmî" çî ko qanûnî yo, te de zordarê-ya siyasetî esta. Hetta, tûnî "nivîskarî" zî vûnî gi "ma yew lehçê bikirî "zon o resmî", "zonî niştîş û edebiyatî" û lehçey bîn zî hema wa bîrî qalkirdîşi bes o". Heti bîn ra zaf însûnî siyasetî zî wûnî "wextî in meselûnî ewnayenû niyo, çî wext Kurdistan xelas bi, ew wexti ma gi in meselûnî xwe rehat rehat hel bikirî".

PYSK in pûnc siyaset û partiyûn ra virazîyaya: KAWA, KUK/RNK, TS, TSK û YEKBÛN), kongrey xwi yê yew-biyayîşî di mesela ser o xêlek vinderta û sewbîna qerarî zî girofî, yan zî tewsiye kerdî. Miyonî parti di û teber ra Zazakî gi teşwîq bibo û biyero destekkerdiş. Endamê partî ê ki Kurmûncî yan zî Zazakî niyozanî, gi heya kongrê diyîni zor bidî xwi, qet nebû gi bişkî yew lehçê qal bikirî û ê ki yew lehçê zanî cehd bikirî ki lehçewo bîn zî bimusi. Parti gi xwi miyon di Kurmûncî û Zazakî sey cê bigêrû, niştê resmî (sey program, destûr, belavokî (bildîrî) û te'limatî (genelgê) û çî bînî him Kurmûncî û him zî Zazakî vicî û vila bibî.

Ez wazena ki bali bûncî ser vatey na partiya newê ser û ez vûna ki wa na parti in çerçewê xwi binena zî zilal bikiro. Eger parti eyro ra, in vate û qerarûnî xwi teqîb bikirû û gûm bi gûm biyarî ca, gi yew çiko zaf hol bû. Qadroyê na parti, tecrûbê yê û yewîya (bileşim) yê eşkenî ki in siyaset û qerarûnî partî biyarî ca.

Cewka zî ez bi xwi hîvîdar a û na parti rê zî xebata serkotê wazena.

FERHENGEKÊ KIRDKÎ-PEHLEWKÎ-KURMANCKÎ - XV

MALMÎSANIJ

| Kirdkî (Zazakî) | Pehlevkî (1) | Kurmanckî |
|------------------------------|----------------------------|-----------------------------|
| ro | rot, rotbar | robar, rûbar |
| roj, roc, roz | xor | roj |
| roj, roc, roze | roç | roj |
| roje, roce, roze | roçek | rojî |
| roşn, roşna; roste, roşt | roşn, roşnak, roşnek | ronî, ronak |
| roşnayî, roşney; roştîye, | roşnih, roşniha | ronahî |
| [ebi] roşnayî, [ebi] roşney | roşnik, roşniha | bi ronahî |
| roşn kerdene, roştî kerdene | roşnenîten, roçênîten | ronî kirin |
| roşnkerdox | roşnkar | yê ku ronî dike |
| rotene, rotîş | froxten | firotin |
| Ruha | Orya | Ruha |
| rusnayêne, riştîş, şawitîş, | fristaten, fristîten | şandin |
| rut | rûtek, lute | rût |
| rutîş, gezi kerdene | ropûten | gêzî kirin, maliştin |
| ruwayîş | rosten, rusten | ristin, hêşin bûn |
| ruwen, rûn, ron | roxn, rven, rovn | rûn |
| ruwenê werdeni/werdişî, | roxn xvertik | rûnê xwarinê |
| rûçiknayîş | rûten | rûçikandin |
| sara, saray | seray, sray | sera, seray |
| sawitîş | sayîten, sûten | sûtin, sûyin |
| se | set | sed |
| seyîn, senîn, çitur | çêgon, çigon | çawan, çawa |
| senî, senê, seno, se, sey | san, çêgon, çêgonî, çêih | çawan, wekî |
| ser | ser | ser |
| serd, sard | sert | sar |
| serdar, serek, reis | serdar, salar | serdar, serek, reis |
| serd, serdey | sermak, sertih | serma |
| serê banî | ban | banî |
| setîş | sencîten | kişandin, kêşan, wezinandin |
| sexte | saxtek | sexte |
| sey | sayek, esaya, esayek | sih, sî, saye |
| sêm | sêm, sîm, esêm, asîm | zîv |
| sêmîn, sêmên | sîmên, sêmên, asîmên | zîvîn |
| sêne | sênek | sîng |
| sifre, sufre | stefr | sifre |
| silo, sil | sergîn, sergînek, sergun | sergîn, sergo, sero |
| sim | sumb | sim |
| sinc | sencît | sinc |
| sipe, sipî | spêt, spêtek | sipî |
| sipêdar | spêt dar | sipîndar |
| sipîyey, sipênî | spêtîh | sipîti |
| siskî | sik, serkav | sihik, sêk, sîrke |
| sist | sust | sist |
| sistî, sistey | sustîh | sistî |
| sivik | sepuk, spuk | sivik |
| sivikêy reyra, sivikey reydi | sepûkiha, şepak, zûtîh | zûyî, zûtî |
| sivikî, sivikey | spukîh | sivikî, sivikahî |
| sîr | sîr | sîr |
| siya | siya, siyah, siyav, siyak | reş |
| siyayî | siyaîh | reşî |
| sole, | şorek | xwê (2) |
| -stan | -stan | -stan |
| sucirnayîş | soçênîten | sotin, şewitandin |
| suciriyayîş | soçîhesten, suxten, soxten | sotin, şewitîn |
| suwend/sond werdene | sokend xverten | sond xwarin |
| sûr, sur | suxr, sûr | sor |

(1) Kelîmeyê Pehlewkiyê ki tiya di nusiyayê, mi nê kitabî ra vîjney: Dr. Behram Frewşî, Ferhengê Pehlevî

(2) Kurmanckî di "şor" yeno me'na "solin".



Kurdistanê Başûrî di Parlamento kom bi

Parlamentoyê Kurdistanê Başûrî (19'ê Gulana 1992 di amebi teşkilkerdene) ki semedê lejê miyanê PDK û YNK'î karê ci tatil bibi û otorîteyê ci nêmendbi rojê 3'yê Hezîrane di mintiqa wertedê quwetandê PDK û YNK di, binê xeymê di kom bi û muddetê parlamentoy hîrê mengîna derg kerd.

Zek yeno zanayîş, ganî ereyêrî Hezîrana 1995 di vîjneyîş (seçim) newe bibiyê

û parlamentoyo newe teşkil bibiyayê. Labelê semedê lejê Kurdan xwi bi xwi, vîjneyîş nêbi cora jî par Hezîrane di muddetê parlamentoy serrê amebi dergkerdene. Wext vêrt labelê înan nêşa pê bikerê û vîjneyîşî bikerê, cora fina didine muddet ame dergkerdene.

Hîrê mengan dima do se bibo nîno zanayene.

Armanci

biwane û bide wendene

PYSK û siyasetî yê zon û kulturî ser

SELIM MURAT

Ez wazena ki in niştey xwi di ser PYSK (Partiya Yewbiyayena Sosyaliştî a Kurdistanî) û vatişî yê ser meseley zonî (ziwanî) Kurdî ser vindirî. Ez l'awer kena ki PYSK, in ware di yew gûma newê û mûhîm îştâ. Beno ki ina gûmi yew gûma qicik bû, la pê inê ya, siyasetî Kurdî di zilal-kerdişî teynî meselûn rî rar abeno.

Ma çi eleqey siyaset û zonî pê ra est o? Belê, eleqe est o, hem zî nîzdî ra est o. Siyaset, zon edebiyat, kultur pê ra eleqedar ê û zaf yan zî teyn yewbîn ser tesîr kenî. Siyaset eşkeno vernîyê zonî bigiyerû û bibû sebab ki ew zonî aver nişyerû û zengîn nebû. Yan zî tersî yî bibû.

Mîsala ma ra nîzdî û çimûnî ma ver di, Tirkî û siyasetî yîn o. Wexto ki merdim ewniyenû siyasetî devleta Tirk ra, ina heqîqet rind veyneno. Tirkû, nîzdey sed serr o ki zonî ma qedexa (yesax) kerdo. Heya in serrûnî peyênûn zî Tirkûn gewre, Kurdî çinî bî û zonî yîn zî "zonî Tirkûnî koyûn" bî. Devletê Tirkû bi her imkûn û wesita ya weşt ki Kurdê esil xwi vîn bikirî; xwi nîsînasnî û asimîle bibî; apey mûnî yan zî zon, kultur, tarix û edebiyatî xwi aver nibirî.

Kurdûn, in siyaset ra zaf zirar di, Tirkî zaf ra tûnî siyasetî xwi di ser zî kotî. Sey mîlet, eger eyro Kurdî in warûn di peymendey se, yew sebebî yî zî ina devleta zordar a û siyasetî yê yo korfehm û xidar o. Zon, beynatey insanûn di yew wasita wo ki insûnî pê yewbînûn di qal bikî, yewbînûn ra fehm bikî û yewbînûn di bidî û bigirî. La eşkera wo ki in te'rîf tînya rolî zonî îfade nîkeno. Zon, yew faktor esasî yo ki yew cemaetî virazenû, temelî yew mîleti rûnenû. Yew mîleta ki 'erdî xwi ser o, welatî xwi di, pê zonî xwi mektebûn di niwûnû, gazeteyûn nivêcû û niwûnû, pê zonî xwi ya ticaret nikero, edebiyatî xwi pê zonî xwi ya te'm nikero, felsefê û tarix fehm nikero û hetta ilm û teknik pê zonî xwi ya nîsînasno, gê sinî bieşko sey mîletûnî medenîyûn xwi ifade bikirî? Zon, senî ki tek tek insûnûn rî mûhîm o, otir zî mîletûn rî mûhîm o. Mîlet pê zon û kultur xwi ya xwi sinasna û dîna sinasnayîş. Yew çîyo ki xusûsiyetûnî mîletûnî dînya ûno çimû ver û yîn pê ra abirreno zî zon, kultur, tarix, 'edet, qereker û şeklî ciwiyayîşî (jîyayîşî) yîn o. Ey ra Tirkî, roboiro niwazinî gi Kurdî zon û kultur xwi rî war vicî. Tarix di zaf tewnî devletî sey devletê Tirkûn estîye ki zonî yew mîlet qedexa (yesax) kerdo.

Hereketî Dêrsimî ra pey Kurdistan di yew demko derg Kurdî bêveng mîndî. Na bêvengey sinî ki hetî siyasetî ya bîya otir hetî xebatê serî zon û kulturî ya zî bîya. Bedîrxanûn a pey xebata ser zon û kulturî sist bîya. Qet nebû zerrê parçê Kurdistanî ma di ûna bi. 1980 ya pey teber di, xassten Awrupa di, xebat in warûn di hîdî dîdî vêşî bî. Zonî Kurdî ser, kultur, folklor, edebiyat, tarix ser, xeylek xebat ûmey kerdiş. Yew mîleta bindest sey mîletê Kurdî rî zon û kulturî yê çend muhim o? Zanayûnî Kurdî, siyasetmedarûnî Kurdî, newe ra geyrey ci ki cewabî ina persî bidî. Çimkî mîlet pê zon û kulturî xwi ya bena mîlet. Mînaqêşe, cigeyrayîş, fehmkerdîş ho dewûm keno. Ew samed a teyn insûnî in geyrayîş ra vûnî "ronesansî Kurdî", yanî "ayabiyayîşî Kurdî".

Helbet xeylek xeletî zî hê binî. La ma zanî ki "ayabiyayîş", sere di xwi ra tûnî çîyûnî xeletûn zî onû. Eya mûhîm, wexto ki merdimî xeta û xeletey xwi di, bieşko na xeta û xeletey xwi ra ageyro û xwi raşt kiro.

In xeletûn ra yew zî meselê Zazakî û namekerdişî (kimlikdayîşî) Zazûn o. In war di tûnî iddîayî ciddî estî. Yew qîsim merdimî, yan zî teyn çevrê newê, wûnî ki: "Zazê Kurdî nî û Zazakî û Kurdî zî yew zon nî. Zazê yew mîleta xwi ser a û Zazakî yew zono xwi ser o." In merdimûn dest pê kerdû hê xwi organize kenî, kovarûn (dergiyûn), kitabûn vecinî, dormarey xwi hera kenî. Wertey serrûnî 1980 ra pêy, bilhessa serrûnî 1990 di, in vatiş ho verra veng vecenû.

Eyro ra yew vaziyeto ciddî ûmo werte. Merdim nişkeno ki mesele nivê-nû yan zî serî hedîşî bigerû. Tûnî insûnî ina mesela bestinî Tirkûn a û Tirkûn ra zanî. In fikro ûnayene 'esil xwi di mesele ra remayîş û raro rehat girotiş û. Belkî tesîr yîn te de est o, la merdim nişkeno vacû ki na mesela Tirkûn veta werte û her çî ho pê yîn a benû. Ma mecbûr ê na mesela ser o vindirî û ci rî yew çerçewa siyasî rûnî. ûna nebû se, gi Tirkî zî na mesela tîyo di. Ew wext zî bîna benû erêy.

Herkes ho xwi ser o yew çî vanû û xwi gore tira netîce vecenû. Sinî ki hetî siyasî ra û senî ki hetî zon û niştîş ra. Na mesela di nê siyasetî Kurdî û nê zî eyî ki zon û tarix ser nîsînasnî warî vatişêki zilalî yê. û eyî ki zanî, miyonî yîn di tûnî merdim zî cesaret nîkenî mesela ser o tewê vacî. Mesela bi xwi ciddî yew mesela ya û ma erey mindî.

Heya eyri zî vatişî tarîxzan, zonzan û siyasetmedarûnî Kurdî ina bîya: "Kurmançî, Soranî, Zazê, Goranî pê parçê yew mîlet ê ki tira vûnî Kurd.

Dewamê ci r. 23

Kongreya HADEP viraziyay

Kongreya didin a Partiya Şarî ya Demokrasi (HADEP) 23'yê Hezîrane di bi beşdareya 578 delegeyan Anqere di kom bî. Murat Bozlak fina bi serekê partî û çen kesan zey Ahmet Türk, Sırrı Sakık, Sedat Yurttaş û Ferîdûn Yazarî cayê xwi heyetê îdarî yê newî di girot.

Labelê HADEP samedê ronayîşê alaya (bayraqa) Tirkîya ra kewtî rojevê Tirkîya. Tayn kesan alaya Tirkîya ronê û cadê ci di resmê serekê PKK'î A. Öcalanî leqna (alaqna). Samedê nê karî ra kongre qediyê tepeya 39 kesî amey tepeştene ki înan miyan di Murat Bozlak û xeylê endamê heyetê îdarî jî estê. Na mesela ra dima bi emrê wezîrî ya alay mekteban di leqna yê xeylê cayandê Tirkîya di vera Kurdan mîtingî amey viraştene. Fina xeylê cayan di polîsan eşt şubeyanê HADEP ser û xeylê kesî tepeştî. İzmir di bînaya partî di bombeyê teqê.

Delegeyê Elbîstanî wexto ki bi 'erebaya xwi ya ageyrayê kê xwi, rayda Kayseri-Pinarbaşı di amey vindarnayîş û înan ra



Mustafa Öztürk, Mehmet Kaya, Hulusi Kul amey kiştene û Mehmet Kisa jî birîndar bî.

Siyasetmedaran gore prestîjê HADEP bi karê wînasîn a kemî beno û raştêyê xebata ci teng beno.

Hukmato newe viraziya

Erbakan bi serekwezîr

Lejê beyntarê Çiller û Mesut Yılmazî bi sebeb ki hukmatê Anayolî hîrê mangan ra tepeya îstîfa bikero û serekê Partiya Refahi Necmettin Erbakan heyatê xwi di fina yewni bibo serekwezîr. Çillerî verê ANAP şî bi Erbakanî ya ortaxey kerdi û hukmatê Refah-

yolî teşkil kerd, bi xwi jî bî ardîmciyê Erbakanî.

Tirkîye di hukmatî yenê hukmatê şinê labelê qandê Kurdan çîyo ki biviriyo çiniyo. Cora jî protololdê hukmatê Refahyolî di jî behsê çareyê mesela Kurdî çiniya.

Hepsî xwi ver ro danê

Senî ki Mehmet Ağar hukmatê Anayolî di bî wezîrê 'edaletî, ey heme çî ra ver hepsxanan ra dest pa kerd û xeylê heqê ki hepsîyan bi xwiverrodaişê serran xwi dest vîstîbî înan ra girotiş û dest bi ta'da kerd. Labelê hepsîyan cewabê Mehmet Ağarî bi xwiverrodaiş da û nîka xeylê hepsxananê Tirkîye û Kurdistanî di nezdîyê 1500 hepsî grewê veyşaney (rojeyê mergî) dir ê. Fina sifî 25'e

mengda Nîsane di tayn hepsîyan hepsîxaneyê Diyarbekir di dest bi grewî kerd û ewro 33 hepsîxaneyan di hepsî qandê başbiyayena şertanê hepsîxaneyan xwi ver ro danê.

Hukmatê Refahyolî viraziya tepeya wezîrê 'Edaletî Şevket Kazanî ê genelgeyê ki Mehmet Ağarî vetîbî îptal kerdi labelê hepsîyan hewna fek xwiverrodavis ra nêverda wo.



MED TV ame girotene

Gorey malûmatê ki Med-TV'î roja 1'e Temmûze di xeberandê xwi di day, şirketa satelitî ya ki bi Med-TV ya pê kerdbi, pêkerdiş kiştî xwi ra herimna-wo co ra jî Med-TV do nêşo weşanê xwi bidomno. Zekî mesûlê Med-TV'î vanê, destê dewleta Tirkîye na mesela di esto. Zek yeno zanayîş dewleta Tirkîye no serrê o ki xebitîyayê ki weşanê Med-TV'î bido vindarnayîş. Winî aseno ki dewleti na xebata xwi di ser kewta.



Ciniyênda Kurdî întixar kerd

Ciniyênda Kurdî bi namedê Zeyneb Kinaci (Zilan) ya ki bi xwi Meletî ra bî, 30'ê Hezîrane di meydanê şarîstanê (sûka) Dêrsimî (Tunceli) di bombaya ki xwi ya girêdaybî teqne, a bi xwi û hewt eskerê Tirkan merdê û hîris eskerî jî birîndar bîy.

Hewawo ki yeno zanayîş Kurdan miyan di na fina verên a ki karêdo wina yeno kerdene.